T.C.

Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Reşit Rojdar YILDIZ

# DI EDEBIYATA ZAROKAN DE ÇÎROK

Yüksek Lisans Tezi

Van – 2017

T.C.

Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Reşit Rojdar YILDIZ

# ÇOCUK EDEBİYATINDA MASAL

Yüksek Lisans Tezi

Tez Danışmanı

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Van – 2017

K. T.

Zanîngeha Yuzuncu Yilê

Enstîtûya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Reşit Rojdar YILDIZ

# DI EDEBIYATA ZAROKAN DE ÇÎROK

Teza Lîsansa Bilind

Şêwirmendê Tezê

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Wan – 2017

# KABUL VE ONAY

## YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Reşit Rojdar YILDIZ tarafından hazırlanan bu çalışma …………........tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : İmza: ………..………….

Jüri Üyesi : İmza: ………..…………..

Jüri Üyesi : İmza: …………..………..

Yukarıdaki imzalar adı geçen öğretim üyelerine aittir.

..…. /….…/…….

Enstitü Müdürü

# BİLDİRİM

## YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Eğitim- Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Di Edebiyata Zarokan De Çîrok" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

 Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

 Tezim sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

 Tezimin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

…./……/……

Reşit Rojdar YILDIZ

# KURTE


## TEZA LÎSANSA BILIND

## DI EDEBIYATA ZAROKAN DE ÇÎROK

**Reşit Rojdar YILDIZ**

**Şêwirmend: Alk. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**2017, 115rûpel**

Di jiyana mirovan de zaroktî serdemeke kurt jî be, di tevahiya jiyana takekesan de roleke girîng digire. Serdema zaroktî, her çiqas di nav serdemên edebiyatê yên ewil de girîng nehatibe dîtin jî di salên dawî de bûye hêmaneke sereke ya edebiyatê. Lewre vê cureyê li derdora edebiyata Kurdî jî hêdî hêdî bi awayeke girîng cih girtiye.

Bêgûman di nav berhemên edebiyata zarokan de ji yên herî kevin û bi bandor, çîrok e. Lewre çîrok, kevneşopî û nirxên civakan bi awayeke zelal nîşan dide. Ji ber ku çîrok, rêberiyê ji jiyana mirovan re dike û ji bo kesayetiya mirovan alîkar e, di qada geşedan û perwerdehiya zarokan de jî girîngiya wê zêde dibe. Di vê xalê de girîngiya çîrokê ya di nav jiyana civakê de çerçoveyekê ji armanca xebata me re jî pêk tîne. Armanca vê xebatê; peywir û sûda çîrokan ya di edebiyata zarokan de ye. Her wiha çîrok di nav edebiyata zarokan de bi çi rengî cih digirin û di geşedanên zarokan de bandoreke çawa li wan dikin di nav armanca xebatê de cih digirin.

Me di xebata xwe de cih da têgehên wekî edebiyat, edebiyata zarokan, ziman, çîrok, nirxên civakî, zarok û perwerdehiyê. Me têkiliyên di navbera van têgehan de derxistin holê. Dema me ev têkilî derxistin holê, me çerçoveya edebiyata zarokan ya di nav edebiyatê de jî diyar kir. Me cih da girîngiya perwerdehiya nirxên civakî û zimên. Her wiha mehêmanên çîrokê, girîngiya çîrokê ya di edebiyata zarokan de û bandora erênî ya çîrokê ya li ser zarokan da naskirin.


**Peyvên Sereke:** Edebiyat, Edebiyata Zarokan, Çîrok, Cureyên Çîrokan, Zarok, Nirx, Têgeh.

# ÖZET


**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**ÇOCUK EDEBİYATINDA MASAL**

**Reşit Rojdar YILDIZ**

**Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**2017, 115 sayfa**

Çocukluk, insanoğlunun hayatında kısa bir dönem olsa da bireylerin bütün yaşamında önemli bir rol oynar. Çocukluk, her ne kadar önceki dönemlerde önemli görülmemişse de son yıllarda edebiyatın öncelikli unsurlarından olmuştur. Nîtekim çocuk edebiyatı, Kürt edebiyatı çevresinde de yavaş yavaş önemli bir yer tutmaktadır.

Şüphesiz, çocuk edebiyatı ürünleri içerisinde en eski ve etkili tür masaldır. Masal, toplumların geleneklerini ve değerlerini açık bir şekilde yansıtmaktadırlar. Masalın, insan yaşamına yol göstermede, bireyin kişilik gelişimine katkı sağlamada ve çocukların gelişimindeki rolü, masalı günümüzde daha da önemli kılmaktadır. Dolayısıyla masalın toplumsal yaşamdaki önemi çalışmamızın amacını da belirlemektedir. Bu çalışmanın amacı; masalın çocuk edebiyatındaki rolü, faydaları ve masalın çocuk edebiyatında nasıl bir yer tuttuğudur. Bu temel sayıltılar ışığında, masalların çocuk edebiyatı çerçevesinde çocukların gelişim alanlarına nasıl bir etki yaptığı bu çalışmanın amaçları arasında yer almaktadır.

Bu çalışmamızda edebiyat, çocuk edebiyatı, dil, masal, çocuk, toplumsal değerler ve eğitim gibi kavramlara yer verip bu kavramlar arasındaki ilişkileri ortaya çıkarmaya çalıştık. Bu kavramlar arasındaki ilişkileri irdelerken çocuk edebiyatınınedebiyat içerisindeki sınırlarını belirledik. Masalların dil ve toplumsal değerlerin aktarılmasındaki önemine yer verdik; masalınunsurları, çocuklar üzerindeki olumlu etkileri ve çocuk edebiyatındaki rolünü anlatmaya çalıştık.


**Anahtar Kelimeler:** Edebiyat, Çocuk Edebiyatı, Masal, Masal Türleri, Çocuk, Değer, Kavram.

# ABSTRACT

**MASTER'S THESIS**

**FAIRY TALES IN CHILDREN'S LITERATURE**

**Reşit Rojdar YILDIZ**

**Supervisor: Asst. Prof. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**2017, 115 pages**

Childhood is a short period in the life, but plays an important role in the whole life of individuals. Although childhood has not been considered important in previous periods, recently it has been one of the primary elements of literature. Thus, children's literature also has started to play an important role in Kurdish literature.

Undoubtedly, fairy tales is the oldest and the most effective type in children's literature. Fairy tales clearly reflect the traditions and values of societies. The role of fairy tales to guide in the life of human being, to contribute to individual's personality development and their role in children's development make fairy tales even more important today. Indeed, the importance of fairy talesin social life also determines the purpose of the present study which is to determine and explain the role of fairy tales in children's literature, its benefits and how fairy tales have their place in children's literature. The influence of fairy tales on the children's development within the framework of the children's literature is one of the objectives of this study.

Concepts such as children's literature, language, fairy tale and education are included in this study, and the relationship between these concepts are explored. While the relationship between these concepts are studied, the boundaries of children's literature have been defined with a reference to children's literature. The significance of fairy tales on language education and education of the social values hasbeen included in the study while discussing the progress of the role of fairy tales in children's literature.

**Keywords:**Literature, Children's Literature, Fairy Tales, Types of Fairy Tales, Child, Value, Concep.

# NAVEROK

**KABUL VE ONAY** ........ **İ**

**BİLDİRİM** ........ **İİ**

**KURTE** ........ **İİİ**

**ÖZET** ........ **İV**

**ABSTRACT** ........ **V**

**KURTEBÊJE** ........ **İX**

**PÊŞGOTIN** ........ **X**

**1. DESTPÊK** ........ **1**

**1.1 EDEBIYATA ZAROKAN** ........ **3**

**1.2 Edebiyat û Edebiyata Zarokan** ........ **3**

**1.3 Di Perwedehiya Zarokan de Edebiyata Zarokan** ........ **6**

**1.4 Taybetmendiyên Pêwîst yên di Berhemên Edebiyata Zarokan de** ........ **8**

1.4.1 Di Edebiyata Zarokan de Îzafiyeta Zarokan ........ 10

1.4.2 Taybetmendiyên Naverokê ........ 11

**2 ÇÎROK** ........ **24**

**2.1 Pênaseya Çîrokê** ........ **24**

**2.2 Bi Gelemperî Taybetmendiyên Çîrokan** ........ **25**

2.2.1 Çîvanoka Çîrokê ........ 27

2.2.2 Gewdeya Çîrokê ........ 27

2.2.3 Encama Çîrokê ........ 27

**2.3 Çavkaniyên Çîrokan** ........ **28**

2.3.1 Teoriya Mîtolojîk ........ 28

2.3.2 Teoriya Hindî ........ 28

2.3.3 Teoriya Etnografîk ........ 29

2.3.4 Teoriya Derûnî ........ 29

**2.4 Cureyên Çîrokan ... 30**

**2.5 Çîroka Kurdî ... 33**

**2.6 Hin Têgehên Çîrokan ... 37**
2.6.1 Formelên Çîrokan ... 37
2.6.2 Kesayet ... 40
2.6.3 Motîf ... 41
2.6.4 Tîp ... 43

**3 ÇÎROKÊN ZAROKAN Û NIRXÊNDI ÇÎROKÊN ZAROKAN DE ... 44**

**3.1 ZAROK ... 44**

**3.2 Nêrîna Çîrokên Zarokan ... 45**

**3.3 Têgeha Nirxê ... 49**

**3.4 Di Çîrokên Zarokan De Nirxên Civakî ... 52**
3.4.1 Hez ... 53
3.4.2 Hevaltî ... 60
3.4.3 Aşitî ... 61
3.4.4 Dadwerî û Wekhevî ... 61
3.4.5 Bêrîkirin ... 62
3.4.6 Berpirsiyarî ... 62
3.4.7 Alîkarî ... 63
3.4.8 Rastî û Dûristî ... 63
3.4.9 Hestyarî / Empatî ... 64
3.4.10 Dilovanî ... 65
3.4.11 Xweşbînî ... 65
3.4.12 Piştevanî ... 65
3.4.13 Mêvanperwerî ... 66
3.4.14 Xîret û Biryardarî ... 66
3.4.15 Meraqa Zanyarî ... 67
3.4.16 Lixwebawerî ... 67
3.4.17 Sebir / Xweragirî ... 67
3.4.18 Cesaret ... 68
3.4.19 Siyanet ... 69
3.4.20 Pîroz Kirin ... 69
3.4.21 Paqijî û Tendûrîstî ... 69
3.4.22 Nirxên Neteweyî ... 70

**3.5 Hin Mijarên Din ... 70**
3.5.1 Dîrok ... 70
3.5.2 Bawerî ... 71

3.5.3 Keftelefta Jiyanê ........ 71
3.5.4 Hêza Xeyalkirinê ........ 72
3.5.5 Hînbûnî ........ 72
3.5.6 Hişmendiya Zimên ........ 73
3.5.7 Wêje /Edebiyat ........ 74
3.5.8 Naskirina Kesayetan ........ 74
3.5.9 Naskirina Cih û Waran ........ 75
3.5.10 Lîstik ........ 76

**ENCAM ........ 77**

**ÇAVKANÎ ........ 80**

**PÊVEK-1 ........ 86**

**JÎNENÎGARÎ ........ 114**

## KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| **Amd.** | : amadekar |
| **Bnr.** | : binêrin |
| **c.** | : cild |
| **Ç.** | :Çap |
| **Çev.** | : Çeviren |
| **g.** | : gotar |
| **h.** | : hejmar |
| **h.b** | : heman berhem |
| **hwd**. | : her wekî din |
| **j.** | : jimare |
| **K.T.** | : Komara Tirkiyeyê |
| **r.** | : rûpel |
| **s.** | : sayı |
| **Wer.** | : werger |
| **Weş.** | : Weşan |
| **Ed.** | : edîtor |

# PÊŞGOTIN

Têkiliya zarokan û berhemên edebî di temenên biçûk de dest pê dike. Zarok bi lorînên ji dayîka xwe guhdar dike mezin dibe. Zarok ji aliyê hişmendî, derûnî, hestyarî û bedenî ve hêdî hêdî geşedana xwe bi pêş ve dibe û dûvre di pêvajoya geşedanê de bi alîkariya çîrokan jiyanê nas dike. Di dawiyê de jî di dorhêlên dibistanê de têkiliyeke her û her bi edebiyatê re pêk tîne. Di vê rewşê de ji bo hînkirina nirxên berçavî û manewî bijartina berhemên ku nirxên civakî didine hînkirin, bêhtir girîng dibe. Nexasim pêwîstiya edebiyata zarokan û berhemên edebiyata zarokan girîngtir dibe.

Bikaranîna rast û bi bandor ya zimanê zikmakî, armanca bingehîn ya hînkirina zimanî ye. Ji ber vê yekê geşedana jêhatîbûnên mîna guhdarkirin, xwendin, û nivîsandinê pir girîng in. Di geşedana van jêhatîbûnan de rola çîrokan pir girîng e. Lewre, çîrok ji zarokan re mînakên herî sûdwar pêşkêş dike û ji bo geşedana hêza xeyalê û çêja zewqa edebiyatê, mînakên herî ewilîn dide.

Çîrok ji berhemên herî kevin yên ji paşerojê û heta îro didome ye. Îro jî çîrok, di nav edebiyata zarokan de bi hebûn û bandora xwe cihekî pir girîng digire. Ji ber ku edebiyata zarokan bi cureyên wekî çîrok, zûgotinok, efsana, mamik, serpêhatî û hwd. re têkildar e, dibe mijara lêkolînên folklorê jî. Her çiqas di çîrokên kurdî de li gor herêman cûdahiyên wekî varyant û rêzimanî hebin jî di dawiyê de li gor kevneşopiya folklor û edebiyatê peve têne girêdan. Mijara vê xebata jî; cih girtina çîrokê ya ku çavkaniya xwe ji gel ango çanda devkî standî û di edebiyata nûjen de di nav cûreya edebiyata zarokan de ye.

Berhemên ji kevneşopiyê tên, her dem dibine mijara lêkolîna zanistên mina civaknasî, zimanasî, zanista perwerdehiyê û hwd. Lê belê her zanist li gor rê û rêbazên xwe lêkolînê li ser van berhemên gelêrî dike. Hevpariya van lêkolînên ku zanist li ser berhemên gelêrî dikin çand û nirxên neteweyî ne. Lewre berhemên gelêrî ji aliyê gelek hêmanan ve gelek taybetmendiyên xweser didine lêkolîneran. Ji bo vê jî deryaya çanda devkî her dem ji zanistan re bûye çavkaniyeke bêdawî.

Çîrok jî cureyeke çanda devkî ye û xwedî taybetmendiyên xweser e. Her çiqas çîrok cureyeke çanda devkî be jî ji bo wenda nebin gelek ji wan derbasî nivîsê bûne û bûne berhemên çanda nivîskî. Xebata me jî bi tevahî li ser çîrokên kurdî yên nivîskî û devkî ne. Em dixwazin ku pêwendiya çîrokên kurdî û rola wan ya di edebiyata zarokan de bi avayeke hûrgilî derxin holê. Em ji xebata xwe fam dikin ku bi alîkariya çîrokan,

zarok dibin xwediyê ceribandinên cûrbicûr û xwe ji bo jiyaneke rastîn û dinyaya mezinan amade dikin. Her wiha zarok bi rêya çîrokan nirxên civakî fam dikin û ji helwest û tevgerên baş an jî nebaş agahdar dibin.

Xebata me; ji destpêk, sê beş, encam û çavkaniyê pêk tê.

Di beşa destpêkê de; çerçoveya xebatê bi awayeke gelemperî hatiye diyar kirin û armanca xebata hatiye dayîn.

Di beşa yekem de; li ser edebiyat û girîngiya edebiyata zarokan hatiye rawestan. Her wiha taybetmendiyên ku divê di edebiyata zarokan de hebin hatina nîşandan.

Di beşa duwem de; li ser cureya çîroke hatiye rawestan. Çîrok ji hemû aliyan ve hatiye nirxandin û taybetmendiyên çîroka kurdî hatine dayîn.

Di beşa sêyem de; têkiliya di navbera zarokan û çîrokan de bi awayeke giştî hatiye diyarkirin û nirxên civakî yên bi rêya çîrokan tên hînkirin hatine diyarkirin.

Di encamê de jî; li gor bidestxistinên xebatê nirxandineke gelemperî hatiye kirin.

Di çavkaniyê de; çavkaniyên ku me ji wan sûd wergirtine û pirtûkên me lêkolîn li ser wan kirine cih digirin.

Di pêvajoya amadekirina xebata xwe de ji ber ku ev xebat di nav lêkolênên edebiyata kurdî de ji yên ewilîn e û di vê mijarê de çavkaniyên kurdî yên zanistî kêm in, bêgûman em rastî gelek zor û zehmetiyan hatin. Di bidestxistina xebatên neteweyî û çavkaniyên berfireh de hin zor û zehmetî me kişandibin jî em gelek bextewarin ku me xebateke wiha ji edebiyata kurdî re amade kiriye. Di vê rêyê de ji bo alîkariya şêwirmendê teza min ji mamosteyê hêja Alk. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ re gelek spas dikim.

Her wiha ji bo ku di nav kar û barên xwe yên zêde de ji min re dem veqetandin û teza min xwendin, ez spasiyên xwe pêşkêşî ji mamosteyên delal Peywirdarê LêkolînêYaşar KAPLAN û İlyas SUVAĞCİre dikim.

Di dawiyê de ez dixwazim spasiyan ji hevjîn û malbata xwe re jî dikim ku di vê pêvajoyê de pêwendî û alîkariya xwe ji min neparastine. Heke ev xebat di warê edebiyata kurdî û kurdnasiyê de ji bo lêkolîner, wêjevan, nivîskar û xwendevanan mîna serê derziyekê jî kêr bibe ez dê gelek şad û bextewar bibim.

**Wan - 2017** **Reşit Rojdar YILDIZ**

# 1. DESTPÊK

Hemû netewên ku bawerî dane girîngiya perwerdehiya zarokan û pêşeroja perwerdehiya xwe, li ser perwerdekirina zarokên xwe sekinîne. Di van salên paş de û heta niha di nav gelê me de jî ev bawerî hinek din bi pêş de çûye û xebatên berbiçav li ser edebiyata zarokan hatine kirin. Ev lêkolîn û xebat nîşa me didin ku li ser geşedana kesayeta zarokan bandora zimên, edebiyat, berhemên edebiyata zarokan cihekî gelek girîng digire û bi vê awayê di ramana perwerdehiya îroyîn de zarok girîng tê pejirandin.

Hemû cureyên edebiyata zarokan û bi taybetî cureya ku em li ser lêkolînê dikin çîrok, dikare zêdebariyekê li ser hest û ramanên zarokan bikin. Ji ber vê yekê jî edebiyata zarokan her dem zindîbûna xwe diparêze. Her wiha edebiyata zarokan ji berî hemû tiştî "edebiyat" e û tişteke bi zimanî ye.

Heta niha gelek çîrokên kurdî yên gelêrî hatine berhevkirin û nivîsandin. Çanda Kurdî ji aliyê berhemên devkî, bi taybetî jî ji aliyê çîrokan ve gelekî dewlemend e. Me dilêkolîn, xwendin û tesbîtkirina varyantên çîrokan de ev rastî careke din jî dît. Me di teza xwe de xwest ku çîrokên kurdî yên devkî û nivîskî li gor edebiyata zarokan û armanca wan ya di edebiyata zarokan de vekolin. Ji bo vê jî me cih da agahiyên derbarê edebiyata zarokan, zarok, çîrok û naveroka çîrokê û bi vî awayî teza me ji destpêk, encam û sê beşan pêk hat.

Di gelek qadên edebiyata kurdî de niqaş tên kirin. Ji van qadan yek jî edebiyata zarokan e. Niqaşên di vê qadê de bi piranî li ser peyvsazî û dirûvê ne. Di vê demê de "edebiyata zarokan" bi hin pênaseyên ji hev cûda derdikevin pêşiya me. Lê belê ev pênase her çiqas ji hev cûda jî bin li derekî di bin hin xalên hevpar de digihêjin hev. Ji van xalên hevpar ya bûye ronahiya xebata me jî ev e ku; baweriya, ku çîrok di perwerdehî, afirandin, hêza xeyalê û hînbûna zimanekî rêkûpêk de parake gelek mezin digire ye. Me jî ev hevparî ji xwe re kire jêdera rêya xebata xwe; Me berhemên devkî û nivîskî yên ku deng didine dinyaya xeyalên zarokan, xwedî nirx û bedewkar, ji aliyê xizîneya peyvan ve dewlemend, perwerdehiya derûnî û civakî ve alîkar, xwedî taybetmendiya hişmendiya zimanê zikmakî, xwedî nirxên navneteweyî di nav edebiyata zarokan de nirxand. Di vê nirxandinê de em bi piranî li ser berhemên devkî bi yekserî li ser çîrokan sekinîn.

Em di vê xebata xwe de li ser zimên û têkiliya edebiyat, çîrok û zarokan rawestan. Dema ku me ev têkilî derêxist holê, me behsa edebiyata zarokan kir û me

tixûbên edebiyata zarokan ji aliyê çîrok û zarokan ve diyar kir. Me agahiyên di derbarê ziman, edebiyat û çîrokan de bi aweyeke berfireh dan pêş çavan. Me bal kişand girîngî û peywira çîrokan ya di edebiyata zarokan de. Her wiha me danasina çîrokan kir û me lêkolîneke bandora çîrokan ya li ser zarokan kir.

Me xebata xwe li gor rêbaza lêkolîna dokûmanan kir. Di nav daneyên me yên bingehîn de çîrokên ji herêmên Kurdan cih digirin. Me di lêkolînê de li ser nêzî pênc sed çîrokên nivîskî û devkî lêkolîn kir. Her wiha me ji aliyê edebiyata zarokan ve jî gelek berhem berawird kirin.

Di beşa yekem de xebat ji çerçoveya edebiyat, edebiyat û zarok, perwerdehiya zarokan û wesfên berhemên edebiyata zarokan pêk tê. Ji ber ku lêkolîna me bêhtir li ser mijara çîrokan e, di vê beşê de me ev mijarên sereke bi awayeke gelemperî nirxandin. Her wiha me berhemên edebiyata zarokan ji aliyê naverok û peyaman ve nirxandin.

Di beşa duyem de jî em li ser çîrokan sekinîn û me çîrok ji aliyê pênase, cure, çavkanî, têgeh û taybetmendiyên wan ve nirxandin. Di nirxandina çîrokan ya ji aliyê hêmanên bingehîn ve em li ser honandin, leheng, peyam, ziman û bikaranîna zimên sekinîn.

Di beşa sêyem de jî mijarên beşa me zarok, di perwerdeyiya zarokan de bandora çîrokan e. Em di vê beşê de bêhtir li ser tevgerên zarokan yên derûnî, kesayetî û civakî sekinîn. Me ev tevger ji aliyê edebiyat, perwerdehî û çîrokan ve nirxandin. Her wiha bi vê lêkolînê me têkiliya van tevger û mijaran bi awayeke zelal diyar kirin.

Di dawiya lêkolînê de jî encama xebata me pêk tê. Li gor her sê beşên lêkolînê bi ramaneke hevpar me encama xebata xwe pêk anî û me xebata xwe bi agahiyên çavkaniyan dawî anî.

## 1.1 EDEBIYATA ZAROKAN

### 1.2 Edebiyat û Edebiyata Zarokan

Edebiyat, şaxeke hunerê ye û keresteya wê jî ziman e. Wekî em dizan in ku her hosteyek ji bo ku hunera xwe pêk bîne pêdiviya wî bi keresteyekê heye, lewra keresteya wêjewan jî ziman e. Berhem bi alîkariya zimên derdikevin holê û ev berhem dibine çanda netewan ya devkî û nivîskî.

Mirov, dema ku zimanê xwe yê zikmakî hin dibe û bi wî zimanî diramîne û baweriyên xwe bi kar tîne, ji nû ve çanda xwe hîn dibe. Mirov ji aliyê zimên ve çiqas bi hêz be, rayên çanda mirov jî wisa bi hêz dibe û li xwe zêde dibe (Uygur, 2006: 27). Ji ber vê yekê hînkirina edebiyatê çi bi tevdîr çi jî bêtevdîr were kirin her dîsa mirov bi aliyê zimên ve çanda xwe hîn dibe.

Edebiyat deryaya xeyalan e. Ji bo zarok, xort an jî hezkirên çîrokan re, di şevên zivistanê yên dirêj de li ber tifikê bi qasî pêtên agir dilgerm e, ji bo zarokên li ser textê razanê razayî, dinyayeke rengîn û jîndar e. Edebiyat balkêş û dembor e. Nenasê dem û cihan e. Destebirakê salmezinan e (Roşan, 2010).

Edebiyat ji peyva “edebê” zêde bûye. Peyva “edeb” peyveke erebî ye û tê wateya, baş, hînkirin, nazik, biaqil û gotinxweş (Devellioğlu, 2000: 203). Lêkolîner û zimanzan KAPLAN jî, edebiyatê bi zimên ve têkildar dike û li gor wî bandora edebiyatê ya li ser mirovan ji ber zimên e; “Di helbest, çîrok, roman û şanoyekê de tişta ku kelecanê dide dilên me, di serê me de ji xeyalan dinyayeke din çêdike û hemû bandora dîmenên xeyalî bi rêya zimên çêdibin” (Kaplan, 1998: 159).

Edebiyat; “Bûyer, raman, hest û xeyalên bi rêya zimên fesalandine hunerî ye, devkî an jî nivîskî ye (TDK, 2012: 600). Peyva edebiyatê ji aliyê bingeha xwe ve erebî jî be di nav Kurd, Faris û Tirkan de bi orjînaliya xwe tê bikaranîn. Di zimanê Kurdî de edebiyat bi wateya “Wêje” tê bikaranîn (Farqînî, 2012: 729). Ji berhemên nivîskî û devkî yên mîna helbest, çîrok, roman, destan, zargotin, zêmar, stran, şano û hwd. yên ku mebesta çêjeke gewzîn bide guhdar û xwendevanan û cîhana wî/ê ya nîgaşî bixemilîne, hatibe nivîsandin re “wêje” tê gotin (Jiyan, 2005: 159). Lê belê di nav nivîskaran û gel de bi piranî peyva edebiyatê bêhtir tê bikaranîn.

Rewşenbîrê Kurd Kamuran Elî BEDİRXAN, ji edebiyatê re penaseyeke wiha dike: “Edebiyata welatî, ew edebiyata ku ji jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên, ji stran û lajeyên wî hiltêt e.” (Bedirxan, 2014: 6).

Edebiyat pêkhatin û gotina hiş û fikrê mirovan e, bi çêjeke ciwan û xweş û xwerû li ser mirovan tesîr dike. Carinan mirovan xemgîn û dilteng dike carinan jî mirovan dilfereh, dilxweş û kêfdar dike (Sorî, 1932: 1).

Di edebiyata cîhanê de heta demeke dirêj edebiyat ji bo mezinan dihat pejirandin ji ber vê yekê jî zarok gelek salan ji huner û edebiyatê dûr man. Xebatkarê edebiyata zarokan Mustafa Ruhi ŞİRİN, di derbara van ramanan de sê xalan tespît dike:

1. Hin mezin, di hizreke wiha de ne; divê pirtûka zarokan ji mijarên ku ji bo mezinan in, hinek din hatî xwerûkirin çêbibe. Ev raman ji dêla ku dinyaya zarokan serbixwe bipejirênin, zarokan biçûkên mezin dihesibînin.

2. Di hizreke din de; Serdema zaroktiyê di temenê mirovan de demeke kurt digirê û ji bo vê yekê jî divê tevgerên zarokan girîng neyê dîtin û pêwîste ku zû derbas bibe.

3. Hizra sêyê jî; Edebiyata zarokan ji edebiyata mezinan cûda ye, gerek mirov ji aliyê ehlaq û perwerdehiyê lê binêre, ji aliyê edebî ve nenêre" (Şirin, 2002: 42).

Di salên 1980yê de ev kêmasiya ku ŞİRİN di xala sêyê de tespît kiriye ji aliyên pedagogan û lêkolîneran ve hatiye dîtin û em îro dibînin ku edebiyat ji bo zarokan jî gelek girîng e. Edebiyat bi tenê bandorê li ser mezinan nake. Edebiyata her temen, hiş û rihekî heye. Lewra edebiyateke ku deng dide zarokan jî heye. Hêza edebiyatê ji hêza zimanê ku zarok di jiyana xwe ya rojane de an jî di kolana de diaxive qet bi qet hêztir e. Zarok bi rêya edebiyatê afirîn û xeyalên xwe bi awayeke bedew bi pêş ve dibin. Ji ber vê yekê edebiyata zarokan wekî mijareke serbixwe di hunera edebiyatê de cih digire.

Edebiyata zarokan yekem car di nav netewên rojavayê de derketiye û li dinyayê belav bûye. Her çiqas berhemên edebiyata zarokan di netewên rojhilatê de jî hatibe afirandin, edebiyata zarokan wekî beşeke serbixwe ya hunerê li nav dewletên rojavayê de çêbûye. Edebiyata zarokan dema ku zarok wekî têgehekî hatiye dîtin hingî wekî şaxeke serbixwe di edebiyatê de dest pê kiriye. Îro jî ku qala edebiyata zarokan tê kirin edebiyateke serbixwe tê bîra mirovan (Dilidüzgün, 2007: 95).

Di derbarê pêwîstiya edebiyata zaroken de helwest û baweriyên cûda cûda hebin jî hemû kes di ramaneke hevpar de ne. Ev ramana hevpar, hem ji aliyê têgehê hem jî ji aliyê mijarê ve edebiyata zarokan pêwîstiyeke girîng e. Edebiyata zarokan, li berê di nav edebiyata mezinan de wekî mijareke bi navê "zarok" dihate pejirandin û girîngiyeke serbixwe nedidane. Lê belê ew berhemên bi ramaneke qlasîk hatîn çêkirin li ser hizr û

baweriyên zarokan e. Ew berhem ji aliyê mijarê ve tevahî ji mezinan re ne, bi tenê ji aliyê rêziman û nivîsê ve dibe ku hinek din zelal û xwerû be, ji ber vê yekê jî ev berhem nabin edebiyata zarokan, ev şaşîtiyek e (Oğuzkan, 2010: 4).

Li gor vê pênaseyê em binêrin edebiyata kurdî, em dê gelek minakan bibînin. Nûbar - ev pirtûk yekem ferhenga menzûm a duzimanî ku em pê dizanin Nûbehara Biçûkan a Ehmedê Xanî ye ku di sala 1683yê de hatiye nivîsîn. Ev ferhenga menzûm a Kurdî-Erebî her wiha wek ferhenga kurdî ya pêşî jî tê qebûlkirin (Yıldırım, 2008: r.10). Her wiha em dikarin pirtûka Îsmaîlê Bazidî ya bi navê "Gulzar" (1655-1710), pirtûka Amed Tîgrîs û Roman Motkî "Ken û Girîn" (1989), pirtûka Mihemed Kerbelayê Axtepî ya bi nivê "Mîrsad-ûl Etfal" (1912) wekî berhemên Ehmedê Xanî bidin. Ji ber ku ev her sê berhem jî bi awaya ferhengê hatine amadekirin. Ev berhem ji bo zarokan hatibin nivîsandin jî lê di dema xwe de wekî edebiyata zarokan nehatine dîtin, lewra di nav edebiyatê de cih girtine. Niha jî ji aliyê berhemên nivîskî ve em dikarin di edebiyata kurdî ya zarokan de bi nav bînin.  Ji bilî pirtûkan, em dikarin kovara "Kovara Kepîr" ya ku 2007an de ji bo zarokan derketiyeû ya ji aliyê Qazî Mihemedî ve li Mihabadê di sala 1946ê de bi tenê 3 hejmar derketiye "Gir û Galî Mindalanî Kurd"ê, minak bidin. Di dîroka edebiyata Kurdan de ev kovar yekem car ji bo zarokan hatiye çapkirin. Ji bilî van kovaran di kovarên ji aliyê rewşenbîr û wêjevanên Kurd ve derketîne de mînakên ku em wan wekî mijarên di edebiyata zarokan de bihesibînin hene. Her wiha, di hin hejmarên kovarên mîna Hawar, Nûdem, Roja Nû, Hêvî û hwd. de du-sê rûpel ji bo çîrok an jî pêkenokan hatine veqetandin. Nexasim di hin hejmarên "Kovara Roja Nû" de beşeke bi navê "Quncika Zarokan" hatiye amadekirin û di vê beşê de ji bo zarokan çîrok, metelok, serpêhatî, pêkenok û hin hînbûnên din cih digirin.

Dibe ku kêmasiya berhemên zarokan, di salên borî de ji aliyê kêmasiya teknolojî û nivîsandinê ve be. Lê niha ev kêmasî ji holê rabûne û gelek berhemên curbicur tên çapkirin. Hilmî AKYOL "Mîrza Mihemed û Çapîk Ehmed", Sidîq GORÎCAN "Lorîname", Zinarê XAMO "Hebû Tûnebû...", Ömer DİLSÖZ "Kundê Dadger", M. Xalid SADÎNÎ "Çîrokên Gelêrî", Mehmet ÖNCÜ "Çîrokên Kurdan", Rıza ÇOLPAN "Çîrokên Gel", Kemal TURAN "Çîrokên Gulbêhn", Huso û Nazê "Ji Zargotina Kurdî Çîrokên Gelêrî", Bêrî BİHAR "Sara" û "Şemar û Solên Rengîn", Mîran JANBAR "Azad", Yaqob TİLERMENÎ "Kermêşa Gerok" û "Kulîlkên Apê Mûsa", Îsmaîl DÎNDAR "Palûte" û "Siwarên Êşê", "Konê Reş", Yûnis BAHRAMYA "Stranên

Zarokan", Mûrad Dildar "Qesra Spî" û "Dara Sêvê", Berfîn Ayşe ÖĞÜT "Kewên Gozel" û "Xezal û Qertel", Mem BAWER "Mîro û Hevalên Wî", "Hirç û Rovî" û "Masîkê", Îbrahîm SEDİYANÎ "Guldexwîn", Ferîdûn BÎRGUL "Moristan" , Ruken ÇALIŞTIRAN "Welatê Moriyan", Enstîtûya Kurdî ya Amedê "Pîrê û Dîk", "Pîrê û Rovî", "Rovî û Şêr", "Gayê Çot", " Herdem Ciwane", "Çîrokên Mala Zalê" û gelek pirtûkên din em dikarin mînak bidin.

Ji bilî pirtûkan di nivîskariya Kurdî de kovarên ku ji bo zarokan hatîn çapkirin Şemamok, Agirê Tûtê, Heval, Sivore, Hêvî, Kulîlk, Hêlîn, Kepir, dergûşa Perperok, Zarokên Rojê, Teşî û Bûka Baranê ne. Her wiha niha jî li Amedê bi rêvebiriya nivîskar Ruken ÇALIŞTIRAN weşanxaneya bi navê "HÎVA" bi tenê berhemên ji bo zarokan çap dike.

## 1.3 Di Perwedehiya Zarokan de Edebiyata Zarokan

Di perwerdehiya zarokan de armanca edebiyatê, zarok çand û zimên bizanê ye. Ji ber vê yekê têkiliya edebiyata zarokan û zimên gelek xurt e. Lewra edebiyat bi zimên ava dibe. Edebiyata zarokan di hînkirina zimên û çandê de roleke sereke digire. Zarok bi saya edebiyatê hem çanda xwe hîn dibin hem jî bikaranîna zimanê xwe bi pêş de dibin. Her wiha çand û ziman ji keresteyên devkî û nivîskî pêk tên."Ku hûn bixwazin di derbarê zimanê rastîn de fikrekî bi dest bixin li ferhenga nenêrin, pêwîste hûn li keresteyên devkî û nivîskî binêrin" (Kaplan, 1998: 35).

"Heçî bixwaze, zarok bifikirin û hizreke afirîner bihilberînin divê xebatên zimên û polîtikayên berê wan li perwerdehiya zimên bihilberînin. Raman wateya xwe di zimên de dibînin ji ber vê jî di navbera ziman û çandê de pêwendiyeke xurt heye. Divê di perwedehiya zarok û perwerdehiya zimên de fonksiyonên zimên her dem li ber çavan bin. Lêkolînên zimên, divê rênîşandanekî li dinyaya fikrên zarokan bikin û bikaranîna zimanê zarokan gav bi gav bi pêş de bibin" (Cemiloğlu, 2003: 17).

Di pişt hizra xwendina nivîsarên edebî yên zarokan de baweriya nivîsarên xweş, bi kelecan û têr bûyerî heye. Ev nivîsarên xwerû, deriyê afirandinê ji bo zarokan vedikin. Ji bilî vê tişta bingeh jî nivîsarên edebî yên zarokan raman, hestyarî û perwedehiya wan jî berfireh dikin. Ji vê yekê nivîsarên edebî yên zarokan armanca çand û perwerdehiyê di nav xwe de dihemînin. Ji aliyekî din ve nivîsarên edebî yên zarokan di hizirkirinê de hînbûneke bi pergal dide zarokan û dike ku hestyariyeke edebiyatê bi

wan re çêbibe. Bi wan sûdan bi zarokan re daneheveke çandê çêdibe. Di vê çerçoveyê de armanca berhemên edebî yên zarokan di navbera serdemeke temenî de ye û rêbaza wê jî ji hindariyên hêsan bi heta yên dijwar in. Bi vê rêbazê armanc ev e ku zarok bibine xwendevanên hêja yê edebiyatê. Ango zarok di serdema temenekî de hem dixwîne hem jî ji xwendinê çêjê werdigire. Her wiha ku zarok mezin bibin jî edebiyata zarokan ji wan re wekî serdemeke derbasbûnê ye.

Edebiyata zarokan, geşedanê li dinyaya xeyalên zarokan dike û wan ji rewşa negûherbar rizgar dike, dibe dinyayeke deriyê wê vekirî. Ji berî hemû tiştan zarok ji bûyerên derdora xwe diqewime hayîdar dibe. Zarok bi rêya berhemên edebî wan bûyer û hestên ku ne jiyaye bi dest dixe. Her wiha ji ber ku hemû zarok ne di yek kesayetekî de ne, dibe ku ji berhemên edebî hest û tevgerên cûda cûda hîn bibe.

Perwerdehî ji kî re be jî armanca keresteyên edebiyata zarokan bi gelemperî, qalibên tevgerên rastiyê, rêbazên civakê û nirxên mîna qencî, rastî, alîkarî bide hînkirin e. Bi kurtasî, armanca edebiyatê amadekirina zarokan ya jiyanê ye (Arseven, 2005: 42).

Di pêvajoya perwerdehiya zarokan de, dibe ku perwerdehî formal û înformal pêk be. Di vê xalê de edebiyat qada herî girîng ya ku zarok ji aliyê erênî ve guhertina tevgeran bikê ye.  Di pêvejoya geşedana zarokan de li ber pêwîstiyên zarokan yên xwezayî, pêwîstiyên wan yên derûnî bi edebiyatê temam dibin. Zarok dema ku xwendinê hîn dibin û berdawamî bi pêş de diçin, hingî daxwaza sûd wergiritina ji berhemên edebiyatê dikin (Oğuzkan, 2001: 5).

Armanceke perwerdehiyê ya din jî piştgiriya çêkirina hindariyên serbixwe ye. Edebiyata zarokan ya ku piralî diramîne, girîngiya takekesan derdixe holê û zêdetir ji bo geşedana wan ya serbixwe çerçoveyeke çandî ya hevpar pêk tîne.

Wekî me li jor jî bi minakên cûda nirxandiye di perwerdehiyê de gelek armancên girîng yên edebiyatazarokan hene. Ev armanc hemû jî xwedî erk in. Erkên ku edebiyata zarokan girtiye li ser xwe bê şîk ji bo temam kirina kesayeta takekesan e. Takekes di jiyanê de bi saya edebiyatê, xwe ji aliyê zimên, çand, civak û kesayetiyê ve bi hişmendiyeke azad pêş ve dibe. KIBRIS, di derbarê vê xalê de armanc û erkên edebiyata zarokan wiha amaje dike:

1. Ji rêgeza “Hevalê/a herî baş pirtûk e.” bi rê derdikeve, edebiyat; pêhesandina pirtûk ji demborandinê re amrazeke baş e û çavkaniya agahiyan e, dide zarokan.

2. Edebiyat; hesta baweriyê, serkeftin, di nav komekî de pejirandin, hez kirin, hînbûn, lîstik û hesta bedew hwd. mîna pêwîstiyên derûnî bi zarokan re çêdike.

3. Zêdebariyê li geşedana zimanê zarokan dike û hunerweriya wan ya zimên bi pêş de dibe.

4. Geşedana hunerweriya têgihiştin, hizirkirin û dengkirinê dike.

5. Pêwîstiya wan ya xwendinê bi cih tîne.

6. Bi zarokan re hestyariya edebiyatê çêdike û zarok hestên ecibandî, bedewî û bijartî bi dest dixin.

7. Bi awayên cûda senaryoyên jiyanê ji zarokan re pêşkêş dike û ceribandinên jiyanê yên zarokan dewlemend dibin.

8. Tixubê hêza wan ya xeyalan berfireh dike û beraliyê ji hizra afirîner re dike.

9. Geşedanê li hunerweriya guhdar kirin, vegotin û nivîsandina wan dike.

10. Zarokan bi pirtûkên mijarên wan curbicur re dide nasîn. Bi vê awayê "Ez"a ku di hundirê wan de razayî hişyar dike û asoya wan ya hişmendiyê berfireh dike (Kıbrıs, 2000: 18).

Edebiyata zarokan, naskirina nirxên cîhanî û netewî dide zarokan, wan nirxên bi van dide hez kirin. Zarok bi edebiyatê dibe takekesekî bi xwe re lihevhatî, bi malbat û derdora xwe re têkilî baş û ji pirsgirêkên civakê re hestyar û çareserker.

## 1.4 Taybetmendiyên Pêwîst yên di Berhemên Edebiyata Zarokan de

Çerçoveya edebiyata zarokan bi hêmana "li gor zarokan" zelal bûye. Nivîskarê ku berhemeke edebiyata zarokan diafirîne ji bilî hunerê, pêwîstiya wî bi zanîna taybetmendiyên zarokan jî heye. Gelo, zarok di kîjan demê de ji çi hez dikin, pêwendî û pêwîstiyên wan çi ne? Divê nivîskar di çerçoveya van pirsan de ji bo geşedana zarokan berheman binivîse. İbrahim KIBRIS, taybetmendiyên pêwîst yên berhemên Edebiyata Zarokan wekî "Avasaziya naverokî" û "Avasaziya liderî" dibîne û li gor wî pêwîst e ku vegotina berhemên edebiyata zarokan ji şêwazaMaupassant biguhere şêwaza Çehov. Di vê cûdatiyê de ji şêwaza hêsan ya bûyerê, çûyîneke şêwaza tevlihevtir ya rewşê heye. Ev cûdakirin jî bi temen û geşedana zarokan ve têkildar e, ji bo vê diyariyeke girîng di nav xwe de dihemîne.

Bi ronahiya armanca edebiyata zarokan em dikarin taybetmendiyên pêwîst yên di berhemên li gor zarokan de wiha rêz bikin:

1. Divê berhemên edebiyata zarokan ji aliyê zimên ve li gor zarokan bin û zêdebariyekê li geşedana zimên bikin.

2. Berhemên edebiyata zarokan ji aliyê vebêjê ve divê; xwerû, xwezayî, ji dil û zindî be.

3. Divê avakirina hevokan li gor rê û rêbazên rêzimanî bin û çû çewtiyên vegotinênebin.

4. Divê zarokên pêşdibistanê û yên di serdema bingehîn de ji berhemên edebiyatê bi kêf hîn bîbin.

5. Berhemên edebiyata zarokan ji aliyê civak û ehlaqê ve divê ji geşedana kesayeta zarokan re alîkar be.

6. Divê ji naskirina kesayetî, jêhatîbûn û nirxên zarokan re zêdebariyekê bike û van tevgeran bi wan bide hiskirin.

7. Divê karibe berê zarokan bide berhemên binirx û li cem vê jî divê çanda xwendinê bidedestxistin. Her wiha divê têkiliya zarokan ya zarok-edebiyat-hunerê pêk bîne. (Bozdağ, 2000: 366)

Wekî em dizanin ku edebiyata zarokan îro rêkûpêktir e û pergala wê çêtir rûniştiye. Zarok di kîjan temenî de kîjan taybetmendiyan nîşan didin, ji pirtûkên çawa hez dikin, geşedana wan ya derûnî, civakî û zimanî ji aliyê pedagog, lêkolîner û pisporan ve hatiye derêxistin.

Bi saya zanîna dinyaya zarokan, îro edebiyata zarokan hinek din bi pêş ve çûye û em edebiyata zarokan wekî “weşana zarokan” bi nav bikin dibe ku rastir be. Lewra berhemên ji bo zarokan bi rêya amûrên curbicur ji zarokan re tên daberandin. Ji bilî berhemên nivîskî; weşanên televizyonan, malperên zarokan yên înternetê û lîstikên kompiterê hwd. gelek bijarteyên zarokan hene. Bêgûman di nav van bijarteyan de nivîsarên ku zarok bixwînin di guherbariyekî de ne. Dinyaya zarokan cûda cûda ye û divê mezin jî li gor vê rastiyê bijiyîn. Ji aliyekî din ve jî divê ji bo dewlemendbûna dinyaya zarokan di nav kedekê de bin. Di vê xalê de edebiyata zarokan ji bo dinyaya zarokan ya dewlemend û xwedî nirx karîgeriyeke sereke ye. Ji ber vê yekê jî nîşandana nirxên edebiyata zarokan girîngiyeke xebata me ye.

### 1.4.1 Di Edebiyata Zarokan de Îzafiyeta Zarokan

Edebiyata zarokan ji navê xwe jî diyar e ku ji bo zarokan wekî beşeke edebiyatê ya serbixwe tê pejirandin. Ev beş jî serbixwetiya xwe bêhtir ji hêmana îzafiyeta zarokan distîne. Hêmana îzafiyeta zarokan, di hemû hîndariyên ku tên çêkirin de zarok di navendê de ye. Îzafiyeta zarokan, dîtina rastiya zarokan û avakirina dinyayeke li gor zarokan e (Dilidüzgün, 1996: 27). Bi vê awayê em dikarin bibêjin bingeha perwerdehiya edebiyata zarokan li gor vê hêmanê ava dibe.

Edebiyata ku deng dide jêhatîbûna û têgihiştina zarokan û dinyaya wan ya hest û ramanan, li ser hêmana bingehîn ya îzafiyeta zarokan ava dibe (Şimşek, 2002: 30). Dema berhemeka edebî ya zarokan tê nivîsandin di wê berhemê de helwest û pêwîstiyên zarokan roleke girîng digirin. Ji ber ku zarok bi xwendinê re danasînekê bi edebiyatê re dikin ev pêwîstî di berhemên ji bo xwendinê de bêhtir xwe nîşan dide. Divê jiîzafiyeta zarokan, pêwendî, pêwîstî û geşedana zimanê zarokan li ber çavan were girtin, her wiha divê berhemên xwendinê û berhemên edebî yên din jî li gor vê hêmanê werin tevdîrkirin (Sever, 2003: 9).

Di armanca nivîsandina ji bo zarokan de divê; daxwaza kêfanînê, afirandinê, geşkirina hêza xeyalê û ramandinê hebe. Fikra sereke ya edebiyata zarokan bi helwesta nivîskar ya ku di navbera dinyaya zarokan û dinyaya rasteqîn de têkildar pêk tê ye (Şirin, 2007).Ji ber vê yekê divê di nivîsandina nivîsarên edebiyata zarokan de taybetmendiyên geşedan û temenê zarokan her dem li ber çavan be.

Berhemeke li gor îzafiyeta zarokan hatî amadekirin divê ji aliyê mijarê ve bi bawerî be û têgihên berhemê jî li gor geşedana zarokan be. Divê nivîsarên di berhemê de xwedî nirxeke balkêş bin. Ji bilî van jî mijarênnivîsarên di berhemê de divê xwedî taybetmendiyeke ku zarok bi xwe û derdora xwe re têkiliyeke erênî bike, bin. Pirtûka li gor îzafiyeta zarokan hatî honandin dinyaya zarokan berfireh dike û ji aliyê jiyana rastîn ve hin delîlan pêşkêşî wan dike. Her wiha ev çavnêrîn bidestxistina hînbûneke xwezayî ji zarokan re diafirîne.

GULERYUZ, taybetmendiyên di çîrokên li gor îzafiyeta zarokan hatî amadekirin de wiha rêz kirine:

- Divê çîrok li gor temen, pêwîstî, pêwendiyên zarokan be.
- Divê naveroka mijarê bi hev re têkildar be.
- Divê peyam ne şîretkar be û zarok rastiyê bi xwe bibîne.

- Divê berhem ji aliyê zimên ve li gor geşedana zarokan hatibe honandin.
- Divê berhem xwezaya peyvên zarokan berfirehtir bike.
- Divê helwest, rastiya zarokatiyê û hestyariya zarokan li ber çavan bigire.
- Divê bi zarokan re hişmendiya bedewkariyê çêbike.
- Divê xwestina xwendinê di bin hişmendiya wan de biafirîne. (Guleryuz 2003: 261).

Îzafiyeta zarokan, ji bo berhemên zarokan gelek girîng e. Nivîsareke li gor rêgeza îzafiyeta zarokan nehatibe nivîsandin, nirxandina wê ya di nava edebiyata zarokan de jî zehmet e.

Ji nav hêlên rêgeza îzafiyeta zarokan, hêmanên rojane û veguhestina perwerdehiyê ya jiyanê du hêmanên herî girîng in. Ji bo balkêşandina rêgeza îzafiyeta zarokan çar deqên girîng hene:

**1.** Divê ji bo ceribandinên ku zarokan di jiyanê de bi dest xistine xemsarî newe kirin.

**2.** Divê qadên pêwendiyê yên zarokan li ber çavan bin.

**3.** Divê jêhatîbûna hişmendî ya zarokan li ber çavan be.

**4.** Divê di sebira zarokan ya di xebatan de li ber çavan be.

Bi kurtasî, em dikarin bibêjin îzafiyeta zarokan di diyarkirina pêwîstî, pêwendî, derûnî, besbûniya zimanî, têgihiştina bûyer û jiyanê ya zarokan de roleke sereke dilîze (Küçük, 2005: 52-53). Di vê xalê de ji ber zarok ji berhemekê sûda hişmendî, hestyarî û derûnî wegire; di jiyana xwe ya pêş de pirtûka bi kêf bixwîne divê ew berhemên dixwîne li gor îzafiyeta zarokan bin.

### 1.4.2 Taybetmendiyên Naverokê

Em dizanin ku pirtûkên zarokan ji aliyê geşedana hişmendî, helwestî û tevgerî amûrên pir girîng in. Di vê pêvejoyê de, hêvî ji van pirtûkan hene ku ji erkên dibistanê re jî bibine rêber.

Ji bo pirtûkên zarokan van peywiran pêk bînin divê taybetmendiyên wan yên naverok û dûrivî bi awayeke zanistî werin amadekirin. Lewra pirtûkên zarokan bi van taybetmendiyan, hêmanên perwerdehiyê pêk tînin û karîgeriya herî girîng ya nirxên pirtûkan wekheviya hêmanan e.

Berhemên edebî ji kîjan temenî re hatibine amadekirin jî divê demxweşiyekê bide xwendevanê xwe û coşiyeke edebî bi wan re çêbike. Her çiqas berhem ji aliyê dîtbariyê ve têr û tîjî jî be ku di naveroka wê de kêmasî hebin ew berhem wekî “berhema edebî” nayê dîtin. Bi taybetî ev rewş di berhemên ji zarokan re tên nivîsandin de girîngiyeke mezintir e. Ji ber ku her çiqas armanc hînkirineke dîdaktîk jî be divê ev hînkirin bi zarokan re kêfxweşiyekî biafirîne. Her wiha ev kêfxweşî rê li ber hînbûneke “şîretbar” digire. Di berhemên edebî de li gor îzafiyeta zarokan hêmanên naverokê ev in:

1. Mijar
2. Kesayet
3. Honandin/Plan
4. Ziman û Vegotin
5. Peyam

#### 1.4.2.1 Mijar

Mijar; tişta ku li ser tê axaftin û nivîsandin e; raman û bûyera an jî rewşa li ser berhemek tê avakirin e. Di berhemên edebî de mijar hêmaneke gelek girîng e. Ji ber ku zarok, pirtûkên ji mijara wê hez dike dixwîne. Heke zarok ji raman, bûyer û helwesta pirtûkê biyanî bin pêwendiya wan jî dê kêm bibe û ew dê ji pirtûkê dûr bikevin. Ji ber ku zarok jî wekî mezinan, divin di pirtûkê de hin tiştên ji jiyana wan jî hebin. Ew jî di nav pirtûkan de rastiya jiyana xwe digerin.

Di pirtûkên zarokan de divê têkiliya mijar û temayê bi hêz be. Bes, hûrgiliyên mijaran piştî temayên tên hizirkirin... Berhemên têkiliya wan ya tema û mijarê zehîf be, zarok ne ji aliyê hunerê ne jî ji aliyê perwerdehiyê ve tu sûdê wernagirin. (Oğuzkan, 2000: 101).

Divê mijarên di pirtûkên zarokan de hesta ewlehiyê zêde bike û baweriyên derbasdar bi zarokan re çêbike; Divê bi zarokan re tevger û helwestên demokratîk yên neteweyî û cîhanî bide destxistin. Her wiha divê mijar ji geşedana helwesta zarokan ya kenînê re bibe alîkar û mijarên di pirtûkên zarokan de divê li gor temen û geşedana wan hatibin rêz kirin. Divê di pirtûkên zarokan de cih bide malbat, welat, netew, hezkirina xweza û jiyanê; girîngiya alîkariyê; di têkiliya navbera mirovan de xwîngermî û

rûbiwariyê; nirxa rastî û lehengiyê; hesta peywir, berpirsiyarî û zîrektiyê (Kıbrıs, 2010: 41).

Di berhemên edebî de mijar çi jî be rê û rêbazên ku divê nivîskar bînin li ber çavan wiha ne:

**a.** Divê pêwendî û ecibandinên zarokan werin diyarkirin û mijar li ser vê çerçoveyê were vekolandin. Ji ber vê yekê di pirtûkên zarokan de divê têkiliya di navbera têma û mijarê de xurt be.

**b**. Divê mijarên pirtûkên zarokan cih bidine; ewlehî, pêşeroj, hezkirina mirov û xwezayê.

**c**. Girîngiya nirxên netewî divê di pirtûkên zarokan de cih bigirin û zarok li gor vê helwesta demokratîk bi cih bînin. Têmayên bijartî divê kêfxweşiyê bi zarokan re çêbikin(Yalçın û Aytaş, 2005).

### 1.4.2.2 Kesayet

Wekî tê zanîn nivîseke honandî ji çar hêmanên -dem, cih, bûyer û kes- bingehîn pêk tê. Hêza dînamîk ya di navbera hêmanên bingehîn yên honandinê de têkiliyeke xwezayî pêk tîne jî kes e.

Di berhemên edebî de kes wekî kesayet/karakter derdikeve pêş me. Kesayet, bi wateya xwe ya herî hêsan, cûdahiya kesekî ya ji kesekî din e û ev cûdahî bi helwesteke xweser e. Cihê kesayetan ya di nav herika bûyerê de gelek diyar e, kesayetê ku nebêbandor gelek caran bûyeran beralî dikin û pirsgirêkan çareser dikin. Her wiha taybetmendiyeke kesayetan yan din jî; ji kesên taybatmendiyên wan wek hev bi awayeke hêsan cûda dibin.

Dibe ku lehengên çîrokan di nav civakê de ji asta herî nizm û herî bilind pêk bên. Ev kes ne ew kesên ku di nav civakê di demekê de jiyane. Ev kes ji kesên mîna; padîşah, wezîr, bazirgan, qadî, qazî, mele, şivan, gavan, rênçber û hwd. dibe ku di hemû dewlet û civakan de hebin pêk tên. Ango ev kes sembol in. Ev kes ji aliyê derveyî ve gelekî nayên nîqaşkirin, bi tenê li ser taybetmendiyeke wan ya diyar tê rawestan. Ev taybetmendiyên wan jî di nav bûyerê de tê hiskirin (Güleç 1988: 75).

Kesayetên di edebiyata zarokan de dibine çar cure; kesayetên girtî, kesayetên vekirî, kesayetên livok û kesayetên bêbandor. Kesayetên vekirî; ew kesayetên ku nivîskar di derbarê wan de agahiyên berfireh dayîn e. Kesayetên bingeh yên nivîsê ji

kesayetên vekirî pêk tên. Ji ber ku nivîskar peyamê xwe yên rasterast bi awayeke berpirsiyarî li kesayetên bingeh dike û vê peyamê dide xwendavanan. Kesayetên girtî; ji aliyê girîngiyê ve hêmanên duwemîn in. Kesayetên di nav bûyerê de guherbariyekî dikin kesayetên livok in, kesayetên ku di nav bûyerê de guherbariyekî nekin jî kesayetên bêbandor in ango statîk in. (Sever, 2010: 104-105).

Di berhemên zarokan de û berhemên berê xwe didin dinyaya xeyalên zarokan de bi piranî mijar li derdora bûyerekî tê honandin. Zarok, geşedanên li dûv hev bi awayeke baldar dişopîne û ji bo karibe meraqa xwe, sebir dike û dikeve kelecanê de. Li vir jî hemana herî girîng ya dike ku berhem were xwendin, "kesayet" e. Ji ber vê yekê jî diyarkirina kesayetan ya bi awayeke fîtozî, bi zarokan re rewşeke erênî çêdike û zarok wan kesayetên erênî ji xwe re mînak digirin.

Hemû çîrok ji armanc an jî pirsgirêkeke kesayetê bingehîn derdikeve holê. Pirsgirêkên kesayetê bingehîn mijara çîrokê ava dike. Di çîrokên zarokan de kesayet piranî mirovên mezin, zarok, ajal, ajalên kesandî û heyberên bêcan in. Zarok wekî çîrokan dixwînin bi kesayetên wan re dikevine di yek hestê de û têkiliyeke nêzîk bi wan re ava dikin. Hêmanên din yên çîrokê pêk tînin li derdora bûyerê kom dibin û bi vê awayê yekîtiyeke honandinê çêdibe (Cemiloğlu, 2003: 51).

Zarok, bi rêya lehengên di berheman de bûyerên bi serê kesan re derbas dibin nas dikin. Di pêşberê pirsgirêkan û pêşandana tevgeran de delîlan peyda dikin û hişmendiya nirxên civakê, rêbazên jiyana civakê hîn dibin. Hevalên ku bi wan re ji dem borandinê kêf distînin, nas dikin. Zarok çiqas kesayetan nas bikin ewqas mirovan nas dikin û dibe ku texmînan ji encamên tevgerên van mirovan derbixin. Bi kurtasî jiyanê nas dikin.Zarok, ji serpêhatiyên xwe û yên kesên din kêfê distînin. Ji guhdarkirin û xwendina serpêhatiyan hez dikin. Ji ber vê yekê jî berhemên lehengên wan zarok bin, dema nirxên din jî di nav xwe de bihemanin dê gelek bê ecibandin. (Oğuzkan, 2010: 377).

Di kesayetên edebiyata zarokan de pirsgirêkeke girîng jî îdealîzekirina kesayetan e. Kesayetê îdealîze di nav tevgera bûyerê de wekî tiştеke jirêzê ye û ne bibandor e. Lewra di berhemê de bûyer çawa be jî xwendevan dê zanibe kesayetê her dem tiştеke baş an jî tiştеke nebaş bike. Ji ber ku kesayetê îdealîze yê bûyerê an baş e an jî nebaş e. Bi vê awayê kelacana zarok ya di têkiliya bûyeran de kêm dibe û zarok êdî kêfê ji lehengê sereke nastîne û dê berê xwe bide hin kesayetên din û wan ji xwe re mînak

bigire. Ji ber ku li gor lehengê bûyerê ev kesayetên din çêtir bikêf in. Xwendevan di hêviya ku kesayetên bûyerê wekî wan bin, dixwazin kêmasî û xeletîyên wan jî hebin. Kesayetên ji aliyê rastiyê ve ji wan dûr bin ew jî ji aliyê hiskirinê ve ji wan dûr dikevin. Her wiha ev rewş di navbera berhemê û jiyanê de jî dijîtîyekê çêdike. Ji ber ku armanca beremên edebî ya bingeh rêberiya jiyana rastîn e.

Di pirtûkên zarokan de divê kesayet ne dûredest û bêkêmasî bin. Divê ew jî wekî mirovên rastîn xwedî kêmasiyên gelemperî bin. Zarok bêhtir ji kesayetên xwedî kêmasî û nejêhatî dike. Bi wan re hêsanî têkiliyekê ava dike. Zarok bi rêyan wan kesayetan li rastî pirsgirêkên cûda tê û dizane ku ji bilî pirgirêkên wî di jiyanê de gelek pirsgirêkên din jî hene û çareseriyên wan jî hene. Bi vê awayê ji aliyê derûnî û civakî ve aram dibe û baweriya wî ya bi wî/ê zêde dibe. Her wiha tevgerên kesayetên di çîrokan de nirxên civakî û ehlaqî didin zarokan (Ural, 2013: 47-48).

Dibe ku mirov di dinyayeke teng de kesayetê îdealîze bide zarokan lê belê di jiyana îroyîn ya ji aliyê teknolojî, medya û ragihandinê ve pêşketî de ev tişt gelekî zehmet e. Dibe ku bi heta temenekî kesayetê îdealîze bibe rêberê zarokan, lê di temenên pêş de dema zarok bikeve di nav jiyana civakî de ev kesayetê îdealîze dê bixeyîbin û zarokê xwe di nav xeletiyan de bibîne. Li dijî vê zarok di hêviya zanîn û pejirandina rastiya kesayetiya xwe de ye. Li gor vê ji dêla kesayetê îdealîze, kesayetên serbixwe yên xwedî raman bên afirandin ji zarokan re dê çêtir alîkar bibe (Neydim, 2000: 93).

Jiyana mirov demeke bisînor e. Di jiyana mirovan de rewşên biceribînê jî bisînor in. Di vê çerçoveyê de mirov wekî xwendevanekî di berhemên edebî de li rastî gelek bûyeran tê, bi alîkariya lehengan dikeve di nav van bûyeran de û gelek rewşan diceribîne. Lê belê di bûyerên kesayetê wan îdealîze de derfeta ceribandinê nîn e, ji ber ku hemû tişt di bin kontrola nivîskar de ye û hemû tişt di serê bûyerê de diyar e. Ev tişt jî orjînaliya çareseriya pirsgirêkan ji holê radike û dibe sedema jidûrketina xwendawan ya ji kesayetan. Di jiyana îroyîn ya di bin bandora teknolojiyê de kesayetên xwedî şîk, kêmasî û xeletiyan bi wan re xwedî nirxên rastiyê ji aliyê rêberiya jiyana zarokan dê baştir bibe.

### 1.4.2.3 Honandin/Plan

Di pirtûkên zarokan de his, raman û bûyer divê bi awayeke lihevkirî werin rêzkirin; divê di navbera mijar û his ya bi zarokan re çêdibe di yekîtiyekê de be. Divê

bûyer her dem bala zarokan zindî bigire û têkiliyên di mijarê de jî lihevkirî bin. Lewra ev tevgera lihevkirî jî bi planeke baş pêk tê.

Plan, mijar, leheng û temaya ku bi awayeke rêkûpêk di nav pirtûkên zarokan de cih digire ye (Yalçın, Aytaş, 2003: 47).Dibe ku ev cih girtin li gor cureyên edebî werê guhertin. Lê belê divê plan, her dem lihevkirî be û têkiliya mijar û temayê biparêze.

Plan, amûra avasaziya berhemê û pergala wê ya hindûr ya hêj ji berî nivîsandinê ye û amûreke ku karê nivîsê dike rêzkariyekê de ye (Oğuzkan, 2010: 363).

Ji dêla berhemên şîretan didin, zarok rastî berhemê ji wan encaman derdixewere, hingî xwendinê ji zarokan bi kêftir bibe. Ku zarok agahiyan ji nivîsarê derbixe û li ser wan agahiyan biramîne geşedana wî ya hişmendiyê jî dê bi pêş de biçe. Ku nivîsarên edebiyata zarokan li gor geşedana zarokan ya hişmendî û hestyarî werin honandin û çareseriya pirsgirêkên di nivîsarê de bi hêviya zarokan ve were hêliştin, xwendin û têgihiştina nivîsarê dê hêsantir bibe. Fikreke sereke ya bi rêya planeke baldar bi awayeke hêsanî tê fam kirin û bûyer û leheng jî di nav hûrgiliyan de winda nabin. Beşên destpêk, çîwanok/civirînû encamê bi awayeke xwezayî hevdu dişopînin. Bi kurtasî planeke baş; di navbera bûyer, rewş, raman û hisan de geşedaneke erênî pêk tîne; bandora berhemê ya li ser xwendevanan zêde dike (Oğuzkan, 2010: 377).

Li gor wan agahiyên; divê hûrgilî û dîmenên nepêwîst xweşikbûna planê xirab nekin. Divê di amadekirina planê de;  temen, zayend û asta polê ya zarokan li ber çavan be. Her wiha divê nivîskar zanibe, bi saya planeke rêkûpêk mijar, tema û fikra sereke hêsantir tên fam kirin.

### 1.4.2.4 Gotin û Ziman

Hin wesfên berheman hene ku wan dikin berhemên edebî. Ji van wesfan yên herî girîng honandin, mijar, kesayet û ji bilî van jî hêza nivîskar ya bikaranîna zimanî ye. Hemû nivîskar mijara di berhema xwe de li gor şêwaza xwe pêk tîne. Şêwaz, hêmana herî girîng ya bandorê li xwendin û baldariya berhemê dike ye (Karatay, 2011).

Şêwaz di berhemên edebiyata zarokan de hinek din girîngtir e. Ji ber ku şêwaza li gor zarokan serkeftina nivîskar nîşan dide. Her wiha baweriya berhemê jî bêhtir bi vê ve girêdayiye. Dema berhemên zarokan tên çêkirin divê îzafiyeta zarokan jî newe jibîrkirin. Divê nivîskar hem ji îzafiyeta zarokan hem jî ji nêrîna zaroktî hayîdar be û honandina xwe li gor van taybetmendiyan pêk bîne. Ji bo zarok dewlemendiya zimanê

xwe yê zikmakî hîn bibe divê ewil van dewlemendiyan bibîne. Lewra ev tişt jî herî baş di şêwaza nivîsaran de derdikeve holê. Nivîskar di nivîsarên xwe de çiqas dîmenên ramanî û hunerên gotinê bi kar bîne zarok dê jî ewqas serdestî hêza zimanê xwe yê zikmakî bibe.

ŞİRİN, di derbarê şêwazê de ramanên xwe wiha tîne zimên: "Hêmana bingehîn ya edebiyata zarokan dike edebiyata zarokan "Zimanê zarokan" e. Bernîşana herî diyar ya têkiliya di nav nivîskar û zarokan de pêk tîne û rêyekê nîşa vegotinê dike, zimanê zarokan e. Bernîşana zimanê zarokan jî nêrîna zaroktî û îzafiyeta zarokan e. Nêrîna zaroktî, bi daneheva zanista zaroktî û felsefî geş dibe, îzafiyeta zarokan jî li gor hestyarî û hişmendiya hunermend rêya xwe dibîne. Lewra nivîskariya edebiyata zarokan ji vî aliyî ve nivîskariyeke cûda ye. Di nivîskariya edebiyata zarokan de pêkanînên honandinên ontolojîk yên edebiyata mezinan kêm dimînin. Li cem hemû honandinên ontolojîk yên edebiyatê pêk tînin ku berhem li gor pergala zimanê zarokan jî hate amadekirin hingî ew pirtûk wekî berhemeke bi nirx ya edebiyata zarokan heq distîne." (Şirin, 2006: 181).

Di şêwaza çîrokiya çîrokan de taybetmendiyeke girîng heye; çîrok tu caran bi hûrgilî nayên honandin. Çil sal heta hezar sal carinan bi du gotinan tên gotin. Ji ber ku ji taybetmendiyên sereke yên çîrokê yek jî lezbûn e. Çîrokbêj, hemû serdemên jiyana lehengan nadin, bi tenê li ser bûyerên gelek girîng dirawestin. Çîrokbêj gelek caran di derbarê derasayîya çîrokê de hişyariyê li guhdaran dike. Tişta ku çîrokê ji çîrokên gelêrî û destanan cûda dike jî, ketina dinyaya xeyalan ya di çîrokê de ye (Güleç 1988: 79-80).

Zarok mînakên herî xweşik yên zimanê xwe yê zikmakî divê berhemên zarokan de bibîne. Ji bo parastin û dewlemendkirina zimên, berpirsiyariya herî girîng ya nivîskarê nivîsarên edebiyata zarokan şêwazeke rast û li gor zarokan e. Ji ber vê yekê dema nivîskar pirtûka xwe dinivîse divê armanca wî bikaranîna zimanê zikmakî yê rast, xweşik û xwerû be.

Di derbarê têkiliya pirtûkên zarokan û zimên de Firdevs GÜNEŞ wiha dibêje: "Pirtûk, amûreke peyv û têgehên nû hînê zarokan dike ye; ji ber vê yekê jî divê nivîskar di pirtûkê zarokan de cih bide peyvên nû."(Güneş, 2000).

Alemdar YALÇIN û Gıyasettin AYTAŞ, taybetmendiyên pêwîst yên di berhemên zarokan de wiha tînin zimên: "Taybetmendiya herî mezin ya edebiyata zarokan û edebiyata mezinan ji hev cûda dike vegotineke ku armanca wê diyar e. Di

vegotina pirtûkên zarokan de divê vegotin xwerû be û gotinên nepêwîst cih negirin. Hêmanên wekî zelalî, herikbarî û xwerûtî divê her dem li ber çavan bin. Ev hêman di pirtûkên zarokan de dikin ku leheng, mijar, cih û bûyer çêtir werin têgihiştin. Ji ber vê yekê jî divê di pirtûkên zarokan de nivîskar xwe ji vegotineke barkirî û tîr bide paş. Peyvên zarok di jiyana xwe ya rojane de bi kar neyine divê nivîskar cih nede wan."(Yalçın ve Aytaş, 2011: 47).

Şêwaza çîrokan ji cureyên nivîsarên din cûda ye. Zûgotinokên çîrokan yên di destpêk û encamê de teybetmendiyeke helbestkî dide çîrokan. Vegotina çîrokan ya helbestkî, pêkenokî, bikêşe û bûyerên derasayî bala zarokan dikişîne. Di veguhestina taybetmendiyên zimanî yên ji bo zarokan de rola herî girîng ya çîrokbêjan e. Dema çîrokbêj çîrokê dibêjin divê ji aliyê vegotinê ve hayîdar bin. Divê cih nedin bendên dirêj û tevlihev. Her wiha divê cih nedin dûrivandin û sêwirandinên nepêwîst (Karakuş, 2006: 42). Lewra zarok ji xwendina çîrokan bêhtir ji guhdarkirina wan hez dikin. Ji ber vê yekê jî li cem nivîsandina berhemên zarokan vegotina wan jî hêmaneke girîng e. Çîrokbêj dema çîrokê dibêje divê serdestî mijarê be û wekî ew jî di çîrokê de dije çîrokê bibêje ku guhdaran bikişîne di nav çîrokê de.

#### 1.4.2.5 Peyam

Armanca pirtûkên taybetmendiyên wan hevpar in, hînbûna bi peyam û mijareke pêwend e. Bi saya vê rêyê haya zarokan ji bûyerên ku di jiyana rojane de haya wan jê nebûye dibe û zarok xwedî zanîneneke zanistî dibin. Lewra di nav berhaman de veguhestineke wekî ya mirovan heye. Berhem; ku honandin, mijar û vegotin di nirxeke li gor îzafiyeta zarokan be, veguhestin bi tendûristî ye û berhem gihiştiye armanca xwe. Heke berhem li dijî wê be, hingî berhem tişteke bê armanc dibe û ji taybetmendiyên xwe yên bi nirxên zarokan dûr dikeve. Her wiha di bingeha veguhestineke baş de peyam an jî peyamên baş cih digirin.

Her nivîsarek di naveroka xwe de peyamekî dihewîne. Ev ji aliyekî ve wateya ku nivîskar li mijarê kiriye ye. Her wiha peyam an jî hesta sereke, ew tişta ku bigihe xwendevan e. Her nivîsar, peyameke li gor rê û rêbazên xwe hatî afirandiye. Helbest, roman an jî çîrokeke bê peyam naye hizirkirin. Ji ber ku armanca nivîskar gihandina peyaman ya bi rêya hin serpêhatiyan e. Lê belê her çiqas armanc ev jî be nivîskar bi taybetmendiyeke veşartî peyam an jî peyaman dihonêne.

Nivîskar ji bo veguhestina peyama xwe mijarê mîna amûrekî bi kar tîne. Armanca sereke veguhestina peyamê ye. Ji peyamê re ramana sereke jî tê gotin. Divê peyam jî ramana sereke be, ev sedem nivîsandina nivîskar ya bingehîn e. Di vê xalê de em dikarin bibêjin; “peyam hêmana bingehîn ya hêlê dide nivîsê ye.”(Özdemir, 2002: 71).

Her çîrok li gor hişmendiyeke xweser ava dibe. Di çîrokan de tişteke negengaz nîne; dibe ku her tişt çêbibe. Dibe ku lehengê sereke yê çîrokê bikeve di bin heftastên erdê de; dibe ku ajal û jîndarên din biaxivin, dirûvê xwe biguherin û bibine mirov. Bûyer û lehengên çîrokan her çiqas guherbar û cûda cûda bin jî bi gelemperî mijara çîrokan keftûlefta qencî û negenciyê ye(Oğuz, 2010: 149).

Peyama pirtûkekê armanca nivîskar ya çîrokê binivîse derdixe holê **(**Karatay, 2011: 97). SEVEN jî ji pênaseya peyamê re fikra sereke jî bi kar tîne û peyamê wekî veguhestina hest û ramanan, pênase dike (Seven, 2011). Peyamên di berhemê de cih digirin, bingeha nivîsandina berhemê ye. Nivîskar di tevahiya berhema xwe de vegotin, veguhestin û hîndariyên xwe distirhîne û peyamên xwe li tevahiya berhemê belav dike. Peyam an jî peyamên berheman di tevahiya berhemê de divê bi yek awayî beş û beş bi cih bigirin. “Di pirtûkên zarokan de divê armanca peyamê geşedana zarokan be û peyam vekirî û zelal be.” (Sever, 1995: 15). Divê peyam ji nirxên cîhanî şaş nebe; her wiha divê nirxên civaka xwe jî di nav xwe de bihewîne.

Di pirtûkeke xwedî taybetmendî de taybetmendiya herî girîng peyama ji dîdaktîktîzmê şûştiye ango divê peyam ne bi dagerî be. Ku nivîskar hevokên xwe bi xema veguhestinê bide, xwendekar jî dê xwe kêm bibîne û hesta wî ya afirandinê dê kor bibe.

Di nav pirtûkên zarokan de dibe ku ji aliyê peyamê ve cureya herî girîng çîrok be. Çîrok dema zarokan dike kesekê di nav civakê de di heman demê de dibe amûra veguhestinê ya peyamên civakî jî. Çareseriyên li hember pirsgirêkan yên ku mirovên di paşerojê de bi dest xistine bi rêya çîrokan digihînin roja me. Ji ber vê yekê jî peyamên çîrokan bi awayeke zû tên hînkirin.

Di çîrokan de yek an jî ji yekî zêdetir peyam hene. Honandina çîrokan ya derasayî û serpêhatiyên lehengên têkneçûyî veguhestina peyaman hêsantir dike. Di çîrokan de peyam carinan bi awayeke zelal carinan jî bi bi awayeke girtî tên

pêşkêşkirin. Her wiha li gor bijartina peyvan, dem, cih û temenê guhdaran; nivîskar an jî çîrokbêjê çîrokê rêza girîngiyê ya peyaman diguhere.

### 1.4.2.6 Fikra Sereke

Fikra sereke, peyam û mijar her dem bi hev re tên tevlihev kirin. Rast an jî çewt têgehên ji dêla hev tên bikaranînin. Mijar; raman, pirsgirêk, rewş an jî bûyera li ser tê axaftin an jî li ser nivîs tê nivîsandine. Mijar şênber e. Hemû heyber, bûyer, raman, hizr, mesele û bi kurtasî hemû tişt dibine mijara axaftin, nivîs û berhemeke hunerî. Lê peyam, fikra ji mijarê rê dikeve ye; raman û hestyarî ye. Mijar peyama bi goşt û hestî ye. Peyam hêmaneke gelemperî ye mijar jî binbêşeke peyamê ye. Fikra sereke, peyama ku hunermend divê bide ye. Em di çerçoveya qada edebiyatê de binêrin hemû tişt dibe mijara nivîsê; fikra sereke rûxsariya mijarê ye, nêrina hunermend e, şêwaza şîroveyê ye. Nivîskar bi rêya peyam an jî peyaman xwe digihîne xwendevanan.

Peyam bi gelemperî yek an jî du peyvan; mijar bi komeke peyvan; fikra sereke jî bi hevokekê tê derbirîn.

Fikra sereke, ramana ku nivîskar divê ragihîne xwendevan û guhdaran, tevgera ku divê xwendevan û guhdar bi dest bixin e; Fikra sereke, çêkirina atmosfera hestyariyê ye. Di berhemê de fikra sereke pir girîng e. Ji ber ku sedema hebûna berhemê ye. Lewra di tevahiya berhemê de derbasdar e. Ji ber vê yekê di berhemê de her peyva nivîskar ji fikra sereke peywirek girtiye li ser xwe. Derbirînên tevahiya berhemê dorpêç dikin nabin fikra sereke (Yalçın ve Aytaş, 2011: 45). Fikra sereke ramana bingehîn e. Nivîskar fikra sereke rêyên curbicur di berhema xwe de dihonêne. Ev rê serbixwetiya nivîskar nîşan didin.

Di berheman de fikra sereke carinan bi awayeke zelal û vekirî carinan jî girtî çêdibe. Di berhemên zarokan de tişta ji nivîskar tê xwestin, diyarbûna fikra sereke ye. Lê belê peyama berhemê çi jî be ku berhem ne kêfxweş be zarok pirtûkê naxwîne, peyam nagihe zarokan û bidestxistin pêk naye. Di nivîsaran de divê fikra sereke ne wekî pêşniyar an jî encameke mîsoger be. Fikra sereke di nav nivîsaran de girtî ye û têkiliyeke di navbera niskar û xwendekar de ye. Armanc ronakirin an jî çareserkirina pirsgirêkekê ye (Özdemir, 2002: 115).Weki di pirtûkên mezinan de divê di pirtûkên zarokan de jî fikra sereke zelal be û berê zarokan nede ramanên çewt. Ji ber ku fikra

sereke ya nediyar dê serê zarokan tevlihev bike û di ramanên wan de aloziyan pêk bîne. Her wiha divê nivîskar hest û ramanên zarokan zanibe.

### 1.4.2.7 Fikrên Alîkar

Fikrên alîkar, peyamên di navbera rêzên nivîsê de derbas dibin in. Fikrên alîkar bandoreke neyekser li xwendevanan dikin. Hin tîrûskên erênî diragihînin hişê xwendevan û guhdaran. Di berhemekê de peyamên ji bilî fikra sereke, fikrên alîkar in. Fikrên alîkar carinan bi awayeke weşartî di nav nivîsarê de ne û gelek caran xwendekar û guhdar bi wan nahesin. Ku berhem bi hûrgili were lêkolîn hingî derdikevin holê.

Fikra alîkar; ew fikra ji çend bendan pêk tê û alîkariyê dide fikra sereke ye. Nivîskarê jêhatî fikrên alîkar bi hostayî bi kar tîne û dike ku fikr hêsanî were hînkirin. Xwendevanê jêhatî jî fikrên alîkar yên di nivîsarê de zû dibîne; zincîra hişmendiya nivîskar dişopîne û hêj zû fikra sereke têdigihe (Yalçın ve Aytaş: 2011: 45). Bingeha peyamên di edebiyata zarokan de divê ne gotina tiştinan be li dijî vê divê geşedana raman û hestyariya zarokan be.

### 1.4.2.8 Taybetmendiyên Rûxsarî

Ji bilî taybetmendiyên naverokê yên berhemên edebî, taybetmendiyên rûxsar jî girîng in. Ji ber ku pirtûkeke ji aliyê zarokan ve were xwendin bi baldarî û pêwendiya bi zarokan re çêdike ve girêdayîye. Lewra zarok hêj bawerî bi sûda xwendinê neaniye û çêja xwendinê nestandiye. Ji ber vê yekê jî pirtûka ku em dikine di destê zarokan de divê wekî pêleyîstokekî bala wan bikişîne. Zarok tu caran pirtûkeke ji aliyê zanistê ve tijî lê ji aliyê taybetmendiyên rûxsarî ve ne baldar wekî mezinan sirf ji hînbûnê re naxwîne. Ji ber vê yekê jî divê nivîskar ji pêşdevik û heta paşdevika pirtûkê bersiva pirsa “ez dê çawa bala zarakan bikişînim” bigere (Kıbrıs, 2010: 39). Ku nivîskar dûv li bersiva vê pirsê bigere divê bala xwe bide van taybetmendiyên rûxsarî yên li jêr;

**a) Firehîya Pirtûkê;**

Zarok bi gelemperî hez ji pirtûkên curbicur dikin û kêfa wan ji tevlihevkirina pirtûkên wesa re tê. Lê belê li gor rêgeza perwerdehiya zarokan divê pirtûkên zarokan ji aliyê firehî û giraniyê ve li gorî temenên zarokan be.

**b) Qexez;**

Qexeza di pirtûkên zarokan de tê bikaranîn divê hinekî tarî, qewîn û ji hevîrê yekemîn an jî duwemîn be. Heke ku qexeza pirtûkên zarokan ne wisa bin zarok nivîsan baş nabînin, bala zarokan dê kêm bibe û dê dev ji xwendinê berdin.

**c) Rûpel;**

Di pirtûkên zarokan de divê rûpel ji risteyên asayî pêk bên; divê li teniştên rûpelan valahiyên fireh hebin. Bi taybetî divê rûpel, yek stûn be. Divê di rûpelan de ahenga nivîs û wêneyan hebe.

**ç) Tîp;**

Ji aliyê mezinahiyê ve divê tîp li gor temenê zarokan bin. Zarokên di asta hindekariya seretayî de bin, divê puntoya tîpan ji 12ê mezintir be. Lê belê ku zarok li ser asta dibistana seratayî bin, hingî puntoya tîpan di navbera 10-12ê de jî dibe. Di bijartina puntoyê de divê edîtorên weşanê navbira xwendinê ya di nav pirtûkê û çavan de û temenê zarokan li ber çavan bigirin. Ji bo zarokên hêj nû hînê xwendinê dibin di nivîsa pirtûkê de puntoyên mezin divê werin bijartin (Sürmeli, 2007: 555).

Li gor pivana Serokatiya Lijneyê ya Wezareta Perwerdehiyê (Millî Eğitim Bakanlığı Talim ve Terbiye Kurulu) ji bo weşanên zarokan diyar kirî divê di pola yekemîn de puntoya tîpan ji 20-24, di pola duwemîn û sêyemîn de jî 18-20 puntoya kêmtir nebe. Lê belê di pola çaremîn û pêncemîn de divê ji bo nivîsan 12 punto were bikaranîn. Ji bo polên pêştir jî divê puntoya nivîsê 12 punto be lê divê herî kêm ne bin 10 puntoyê re be. (Kıbrıs, 2010: 40).

**d) Rêziman;**

Divê pirtûkên zarokan ji aliyê rêzimanî ve bi awayeke baş hatibin venêrîn. Di nivîsan de xalbendiya nivîsaran divê li gor rê û rêbazan hatibin bi cih kirin.

**e) Wêne;**

Di pirtûkên zarokan de wêne bi qasî vegotin û zimanî girîng e. Wekî me beriya niha gotibû zarok bi nêrîna wênayan bi dest xwendinê dikin. Lewra ku ev wêne baldar bin zarok dê jî çêtir ji xwendinê hez bikin û pêwendiya wan ya bi pirtûkan û hunerên

bedew re dê zêdetir bibe. Dema zarok bi wêneyê re bi tenê ma û zewqa hunerî ji wê wêneyê stand hingî dê xwendinê xwe baştir fam bike (Özünel, 2000: 174-175).

Divê wêneyên di pirtûkên zarokan de bi mijarê re guncawbin. Divê wêne li gor mijara xwe; raveker, şîroveker, kêfxweşker, heneker û xwînşîrîn bin. Li carinan dema xwendevan kenand divê biponijîne jî. Ji bilî van taybetmendiyên wêneyan ya herî bingeh "nirxa bedewkarî" ye. Divê wêne geşedana nirxa bedewkarî ya zarokan pêk bîne.

"Divê wêneyên di pirtûkên zarokan de li gor asta ecibandina zarokan be û divê dewlemendiyeke dîtbar bixe di nav peyama nivîsarê de; divê bi nirxên xwe yên bedewkarî têgihiştina zarokan ya dîtbarî geş bike."(Sever, 2003: 191).

**f) Devgirtek (Cilt);**

Weneyên devgirtekên di pirtûkên zarokan de ji bilî nirxa xwe ya bedewkarî; divê banga xwendinê li zarokan bike. Ji aliyê din ve jî divê qexeza devgirtekê qewîn û bi qelîte be. Giranî û mezinahiya devgirteka pirtûkê divê li gor temenê zarokan be. Ji bo kîjan temenan re bin jî divê pêşdevgirtek û paşdevgirtek bi mijara pirtûkê ve guncaw bin û baldariyê bikişînin li ser naveroka pirtûkê."Di pirtûkekê de tişta ewilîn bal dikişîne pêşdevgirtek e. Ji ber vê yekê jî divê devgirtek ji aliyê dîtbariyê ve bi reng û baldar be; lewra zarok ku pirtûkê bi dest dixin divin bi wê bilehîzin. Ji bo vê jî divê devgirtekên pirtûkan qewîn û temendirêj bin (Kıbrıs, 2010: 40).

Divê nivîskar û weşanxana dema pirtûkan çap dikin haş ji van taybetmendiyan hebin. Ji ber ku berhemek ji aliyê naverok û rûxsarî ve di tevahiyekê de ye. Têgihiştina zarokan ji her du hêmanan re vekiriye.

# 2 ÇÎROK

## 2.1 Pênaseya Çîrokê

Em dikarin bibêjin çîrok, ji hebûna mirovan heta îro rastî û hêviyên civakan bi hev re tîne zimanî ye. Her wiha çîrok, vegotinên ji kelepora çanda devkî bi rêya serpêhatiyan tîne roja me.

Her çiqas çîrok wekî nivîsarekê were li pêş me jî hêza pêwendiya çîrokê û kelepor ango folklorê nayê pîvandin. Çîrok cureyeke girîng ya folklorê ye ku, ji sedsala XIXan û vir ve, bi hin hevbeşiyên xwe, bala gelek zanyar û lêkolînerên folklorê kişandiye. Di sedsala XXan de bi taybetî lêkolînerên mîna *Anti AARNE, Vlademir PROPP*û *Stith THOMPSON* hem li ser tesnîfa çîrokan, hem li ser motîfên ku di çîrokan de derdikevin pêş me û hem jî li ser avasaziya çîrokan, xebatên gelek girîng kirine (Albayrak, 2004: 365).

Di kurdiya kurmancî de ji bo vê cureya vegotinê, navên wekî çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, xemîşok, mesel, meselok, metelok, serborî, serpêhatî, serhatî, hîkaye û hwd. têne bikaranîn(Pertev, 2009: 87).

Dema em li ser kevneşopiya folklorê biçin; çîrok ji peyva “çîr” an jî “cir”ê tê. Ev peyv, li Herêma Botanê wekî peyva “cir”ê, li Herêma Hekariyê jî wekî peyva “çîr” tê bikaranîn. Ev her du peyv jî ji ber taybetmendiyên devokî veguherîne. Lewre bingeha vê peyvê “çîr” e û tê wateya “axaftina dirêj”. Lewre em niha jî hevokên mîna: “Çîra/Cira vî zelamî çiqas nexweş e. Ew mirovekî gelek çîr/cir nexweş e.” Bi kar tînin. Di van hevokan de wateya gotin dirêjbûnê heye. Ango ew kes hingî axaftinê dirêj dike ew yekê/a çîr/cir nexweş e. Di bin vê xalê de em dikarin bibêjin; bingeha peyva çîrokê ji peyva “çîr”ê tê.

Hîkmettîn ATTÎ, di teza xwe ya bi navê “Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zînê” de; “Çîrok ji wan berhemên pexşanî re tê gotin ku; bûyer di cîhaneke xeyalîde diqewimin, lehengên wan carinan mirov, carinan heywan û carinan jî hin heyinên derasayî, bi armanca kêfanîn an jî perwerdekirina guhdaran tên gotin û rastiyan bi hin remzû sembolên derasayî û bi rêya hin qaliban tînin ziman.” Dibêje (Atti, 2013 ).

Di ferhenga Tirkî de jî li pêşberê peyva çîrokê: “Bûyera bêhempa ya ku ji leheng û serpêhatiyên wan pêk tên; bûyerên bi gotinan tên ragihandin û bi piranî ji zarokan re tên gotin.” (Doğan, 2008, r. 1098). Bi van wateyan hatiye dayîn.

Nakî TEZEL, di pirtûka xwe ya bi navê “Çîrokên Tirkan” de çîrokê wiha pênase dike: “Çîrok bûyereke ku cih û dema wê nediyar e û di nav çîrokê de lehengên cin, perî, dêw, ejderha, pîrhefok û hwd. kesayetên derasayî hene.”(Tezel, 1985: 6).

Pertew Naîlî BORATAV: “Çîrok, vegotineke pexşan û kurt ya bê angaşta baweriyê ye. Her wiha çîrok ji bawerî û merasîmên keleporê serbixwe ye bi tevahî ji xeyal û tiştên derasayî pêk tê.” (Boratav, 1988: 75).

Saîm SAKAOGLU jî, çîrokê wiha pênase dike: “Çîrok, ew vegotin e ku lehengên wê hin ajal û heyînên derasayî ne, bûyerên wê di nav welatê çîrokê de diqewime û her çiqas xeyalî jî be dîsa mirov jê bawer dike.” (Sakaoğlu, 2002: 4).

Li gor pênaseyên li jor em binêrin di hemû pênaseyan de taybetmendiyên çîrokê yên mijarê an jî rûxsariyê hatine nîşandan. Dibe ku çîrok xeyalî, derasayî û dûrî rastiyê be lê belê ji aliyê perwerdehiyê ve gelek girîng e. Lewra di herika bûyera çîrokê de çiqas ken û kêfxweşî hebe ewqas ramandin jî heye. Şukru ELÇÎN, di pirtûka xwe ya bi navê “Halk Edebiyatina Giriş (Destpêka Edebiyata Gelêrî)” de ji bo çîrokêPênaseyeke wiha kiriye: “ Çîrok ew tişta ku hem dikenîne hem jî diramînê û rayê wê bi keleporê ve girêdayî ye. Her wiha bi awayeke serbixwe tê nivîsandin.” (Elçin, 1986: 369).

Li gor BÎLKAN, “Çîrok, vegotina bi rastiyê re bê pêwendî ye, bi tevahî ji bûyerên xeyalî pêk tê û bê angaşta bawerkirinê ye.” (Bilkan, 2009: 15).

## 2.2 Bi Gelemperî Taybetmendiyên Çîrokan

Di çîrokên civakên de keftelefta lehengan ya di bin minakên têgehî yên wekî baş-nebaş, rast-çewt, biheq-neheq, dad-zordarî, dilnizmî-qurebûn hwd. heye. Taybetmendiyên wekî armancên dûrîdest, vîna armancê, ceribandina hêz û hişmendiyê, bidestxistina şarezatiyê tên bikaranîn. Ev taybetmendî carinan bi motîf û hêmanên herêmî tên xemilandin. Bi vê awayê taybetmendî û karakterîstîkên nirxên netewî dikevine di nav dinyaya çîrokê de (Şimşek, 2007: 58).

Çîrok berhema herî girîng ya çanda gotinî ye. Taybetmendiyeke wê ya karakterîstîk heye û heger em bi vê awayê lê binêrin, têgehên wê yên xwerû û vegotineke wê ya xwerû heye. Bûyerên asayî û derasayî bi rengekî perwerdekar tên vegotin. Berhemeke pexşanî ya çanda gotinî ye ku karaktereke kevneşopî û kolektîf di hundirê xwe de dihewîne.

“Taybetmendiya sereke ya çîrokê ew e; ew xwedî pergaleke vegotinê ya pir kurt û herikbar e. Di çîrokê de xaleke pir girîng jî ev e; her dem tê aşkerakirin ku bûyer di demeke borî de derbas bûne. Ji bilî van, taybetmendiyeke girîng ya çîrokan ku ew ji destanan vediqetîne jî ev e; çîrokbêj (û guhdar jî) dizane û dixwaze bibêje van hemû tiştên ku tên gotin bi rastiyê re li hev nakin yanî derveyî rastiyê ne. Di çîrokê de hêmanên derasayî gelekî zêde ne û di cureyên din de bi vê mêjerê nayên dîtin. Her wiha ji aliyê rûxsarî ve jî çîrok xwedî vegotineke taybet e. Dîsa di destan û çîroka gelêrî de evîn mijareke bingehîn e. Lê evîn wekî mijareke sereke nayê nirxandin.”(Boratav, 2014: 64-65).

Hîkmetîn ATTî, (2013) di derbarê taybetmendiyên çîrokê de wiha dibêje: “Di çîrokan de têgiha dem û deverê nîn e. Bûyer di dem û devereke tesadûf de derbas dibin. Berevajî dinyaya rastîn ku em tê de dijîn, her dem başî û baş bi ser dikevin û xerabî û xerab têk diçin. Avahiyên çîrokan ên mijarî (carina bi vegotineke sembolîk be jî), bi piranî li ser toreya gel û baweriyên civakî yên gel rûdinin. Çîrok ne berhemên dem û devereke diyar in, lê ew her dem û li her derê tên afirandin. Her wiha ji erdnîgariya ku jê derketine dertên û dûre li her derê belav dibin.” Û bi ser van gotinên xwe re jî gotinên Şukru ELÇÎN mînak dide:

“Di nava berhemên anonîm ên wêjeya gel de, yên herî berbelav çîrok in. Di zimanên erebî û aramî de “*masal, mesel”*hatiye gotin jê re. Li gorî wesfiyetên serdest yên çîrokan, em dikarin wiha pênase pê bikin: Ew, hîkayeyên bûyerên aydê heyinan jî kesî ne nayên zanîn in ku, di dewrên ne diyar de derbas dibin. Sedema ku dewrên wan ne mueyen in jî ev e ku, bi piranî çîrok bi qaliba, “*hebû û nebû*”, yan jî, “*wextekî, di dewrên berê de, di zemanê berê de*” dest pê dikin. Wekî ku em ji van qaliban jî têdigihin, dema çîrokan demeke ne diyar e. Her wiha sedema ku, heyinan jî mirovên nayê zanîn, tê gotin, ev e ku; di vê mijarê de vegotina çîrokî wiha ye: *mirovek, keçikek, jinek, parsekek, padîşahek, derwêşek, darek, dêwek* û hwd. Wekî ku tê dîtin, kî bû nawî/wê kesê an jî wî/wê heyinê ne girîng e lê nasnava ku ew teşhîs dike girînge. Çunkî çîrok, bi mebesta diyarkirina hin tiştan nayên gotin lê ew bi mebesta perwerdehiyê û li dûv armancekê tên gotin. Ji ber vê yekê ye ku, kurt in, li ser hûrgiliyan nayê sekinîn û gelekî bi fonksiyon in.

Çîrok di zargotinê de cureyeke pir taybet e. Eger em zargotinê wekî deryayekê bibînin, çîrok ew çem in ku vê deryayê xwedî dikin. Girîngiyeke dî ya çîrokan heye ku,

gelekî cureyên zargotinî, mirov dikare bi dewrekê bi sînor bike lê ji bo çîrokê ev ne pêkan e. Çunkî çîrok di her dewrê de tên gotin û her wiha tên afirandin. Armanca herî sereke ya çîrokan ew e ku, ew bi mebesta perwerdekirinê di nava civakê de hatine gotin."(Atti, 2013: 14-15).

Çîrok ji aliyê vegotinê ve xwediyê hin taybetmendiyên xweser in. Ji bo mînak, "hebû tunebû" an "yek hebû yek tunebû"ya destpêka çîrokê; "çîroka me çû diyaran rehmet li dê û bavê guhdaran" an "ew bi miradê xwe şabûn, hûn jî bi miradê xwe şabin" a dawiya çîrokan. Ev taybetmendiyên xweser bi aweyekî beşên çîrokan jî diyar dikin. Çîrok di sê beşan de tên dabeşkirin. Çîvanok, gewde/civirîn û encam;

### 2.2.1 Çîvanoka Çîrokê

İbrahîm TARDUŞ, di teza xwe bi navê "Bikaranîna Çîrokên Kurdî Di Perwerdeya Zarokan De" Kate Bernheimer (2013) mînak dide. Di vê beşê de guhdarvan ji bo çîrokê tên amadekirin. Dikare bê gotin ku bi vê beşê çîrok pêkanbûna her tiştî û her bûyerê diyar dike. Ku yek hebe û yek tinebe, carek ji caran be û cî û war ne destnîşankirî be her tîşt pêkan e. Guhdarvan divê ji bo her tiştî amade be û fehm bike ku ew jî di nav forma çîrokê de ye.

### 2.2.2 Gewdeya Çîrokê

Bûyerên di çîrokê de diqewimin bi hostatî tên vegotin. Pêşî bûyer ji hev belav dibin, leheng dikevin gengeşiyan, berpirsiyariyek li wan tê barkirin, tiştên derasayî bi ser leheng ve tên, aksiyon zêde dibe, guhdar bi meraq bala xwe dide çîrokê û li benda encamê dimîne. Kes li pey ka ew çima wisa bû, çawa wisa bûyê nakeve, çawa Propp jî destnîşan kiriye di folklorê de çalakî ne hewceyê sedeman e (Propp, Folklor, r. 43).

### 2.2.3 Encama Çîrokê

Bûyerên ku di gewdeyê de li hev hatibûn badan ji hev tên veqetandin û çîrok xilas dibe. Di encama çîrokan de tiştekê misoger ew e ku çîrok bi serfiraziya qencî, edalet, nefsbiçûkî û rastiyê xilas dibe. Leheng digehêjin mirad û meqseda xwe û şa dibin, piştî çîrokbêj lehengên xwe yên qenc serfiraz û şa dike bi hêviyên xweşî û şadiya guhdaran çîroka xwe xilas dike. Bo nimûne "çîroka me çû deviyan rehmet li dê û bavê me hemûyan."(Ergun, 2013: 22).

## 2.3 Çavkaniyên Çîrokan

Her çiqas çîrok ji bûyerên derasayî pêk hatibin jî di bingeha xwe de jiyana civakê dihemîne û tevahiya taybetmendiyên civakê vediguhezê takekesan. Çîrok bi alîkariya hêza gotinê û dewlemendiya çanda devkî rewşa xwe ya îro temam kiriye. Ev berhemên edebiyata devkî di nav demê de derbasî nivîsê bûye. Her wiha di derbarê çavkaniyên çîrokên ji van salên dirêj û derbasbûyî bi alîkariya vegotinê hatîn îro de gelek ramanên cûda hene. Çavkaniyên çîrokan çiqas ji hev cûda bin jî ya rast ev e ku; li hin deverên cîhanê yên ji hev dûr hin çîrok bi yek awayê hatina gotin. Lewra bi saya vê, malbata van çîrokan hatiye tespît kirin.

Di destpêka edebiyatê û heta niha çîrokê bi taybetmendiyên xwe yên edebî xwestiye bibe berhemeke edebî ya nivîskî. Dema çîrok hatin nivîsandin jî di derbarê çavkaniyên wê de pêre pêre hin nîqaş jî derketine holê. Di encama van nîkaşan de gelek teorî hatin pêşwazî kirin. Me jî di bin ronahiya van teoriyan de yên bêhtir tên pejirandin li jêr nirxandine:

### 2.3.1 Teoriya Mîtolojîk

Hin lêkolînerên wekî Birayên GRÎMM, Max MÜLLER û G. V. COX vê ramanê diparêzin. Di vê teoriyê de baweriya ku çîrok ji mîtolojiyê derketine heye. Li gorji Birayên GRÎMM, Wilhelm GRÎMM, çavkaniya çîrokan Hînt-Ewrûpa ye. Li gor vê ramanê mîtolojiyên netewên ketîn di nav netewên Hînt-Ewrûpa de di nav demê de hatine guhertin û çîrokên îro çêbûne.

### 2.3.2 Teoriya Hindî

Di vê teoriyê de çavkaniya çîrokan Hindîstan tê nîşandan. Li gor wan ji sedsala 10an û pê de çîrok ji Hindîstanê belavbûne tevahiya cîhanê. Yên vê teoriyê diparêzin, Ş. KUNOŞ, Theodor BENFEY û Emanuel COSQUİN in. Li gor teorîsyenê vê nêrînê Theodor BENFEY, çavkaniya hemû çîrokên cîhanê “*Pançatantra*” ye. Ev çîrokên hîndiyan bi rêya misilman û bûdîstan li rojava û rojhelatê cîhanê belav bûne.

### 2.3.3 Teoriya Etnografîk

Damezrînerên vê teoriyê Edward TAYLOR û Andrew LANG in. Li gor vê teoriya ku Franz BOAZ û Paul SAİNTYNESS jî pejirandiye; çîrok şûnwareke ji ber jiyana kevnare mayî ye.

### 2.3.4 Teoriya Derûnî

Damezrînerê vê teoriyê civaknasê Alman Von Der LEYEN e. Li gor LEYEN, çavkaniya hin bûyerên di çîrokan de xewinên me yên kevinin (Gurel û yên din, 2007: 48-49).

Li gor civaknasan, cih an jî sedemên derketina çîrokan yên curbicur hebin jî gerek xwendekar û guhdar çêja ku ji çîrokan distînê bi hin netew an jî herêman ve girênede. Ji ber ku pêwendiya mirovan ya li gel çîrokan manewî ye. Di çîrokên netewan de çiqas guherbariyên ji aliyê çand, formel û lehengan hebin jî di tevahiya çêjên çîrokan de hevparî hene.

“Divê mirov tû herêm, ol û çandê wekî bingeha çavkaniya çîrokan nebîne. Dema çîrok ne bi tevahî yek û yek werin lêkolîn dibe ku taybetmendiyên herêmekî an jî şopên çand û olekî nîşan bidin. Di minakên çîrokan de guherbarî çiqas mezin jî be dîsa şûnwareke ji bingeha wê dê bi wê re bimîne.”(Sakaoglu, 1999: 9).Li gor SAKAOGLU, guherbarî û cûdabûna çîrokan bi sê cureyan pêk tê:

#### a. Geşedana erênî

Çîroka hêj ne tekûz ya ji gotina cara yekem pê de hem li herêma ku derketî hem jî li herêmên belavbûyî geş dibe û xweşiktir dibe ye.

#### b. Geşedana peresînî

Çîrok li herêmên belavbûyî bi bandora çand û olê ji bingeha xwe dûr dikevin û geşedana xwe didomînin. Dibe ku çîrok dema cara yekem tê gotin jî ne bi awayeke xwerû be. Kes, navên cih û xwarinan, navnas, ajal hwd. tên guhertin. Ev guherbarî bi geşedana peresînî tê navkirin.

### c. Geşedana vajî

Di wê çîroka ku li gelek welatan hatî gotin û dîsa vegerayî welatê xwe de guherbarîyên girîng çêdibin. Lewra çîrok gotina xwe ya cara yekem nikare biparêze. Ev windakirina tiştên di bingeha çîrokê de wekî geşedana vajî tê navkirin (Sakaoglu, 1999: 9).

Di bin ronahiya wan agahiyan de em dikarin bêjin, diyarkirina dîroka guherbariya çîrokê ji diyarkirina dîroka guherbariya cureyên edebî yên din dijwartir e. Bi rastî jî taybetmendiya çîrokê ya ku nayê guhertin taybetmendiya wê ya vegotinî ye. Her wiha di herikbariya çîrokê de şayesên dirêj û dahûranên derûnî gelekî cih nagirin; ji bilî van jî, mijara vê ya yek bûyerî an jî rêzebûyeriya wê li gor berhemên edebî yên din çîrokê kurtir dike. Ji aliyê rûxsarî û mijarê ve cûdakirina çîrokê û romanê dibe ku hêsanî be, lê cûdakirina çîrok û serpêhatiyê ne hêsanî ye. Ji ber ku sînorên van her du cureyan tevlihev bûye. Di serî de cûdahiya çîrok û serpêhatiyan li gor hêvotina mijarên rastîn dihate kirin; lê belê di derbasbûna salan de, pirsgirêka vegotinek çîrok e an jî serpêhatî ye hişê nivîskaran mijûl kiriye û cûdakirina van her du cureyan ji aliyê nivîskaran ve jî hêsanî nebûye. Digel vê tevliheviyê, em dikarin bibêjin serpêhatî bi rêjeya cih dayîna hêmanên derasayî çîrok e. Lewra, pergala nivîsandina serpêhatiyê jî ne wekî çîrokan e; di bingeha xwe de serpêhatî kurtenivîsa romanê ye, ev raman jî ji objektîfbûna mijarên serpêhatiyê ya li gor çîrokê derdikeve.

Di encama van hemû agahiyan de, her çiqas bingeh û çavkaniyên çîrokan li gor herêm û welatan cûda bin jî li gor ramana mirovahî ji yek mirovî zêde bûye, çavkaniya çîrokan jî di dawî dawî yê de yek e. Lê belê tişta çîrokê dike gelêrî, neteweyî; bawerî, ziman, şêwaz û hêmanên çandê yên cûda ne.

## 2.4 Cureyên Çîrokan

Çîrok ku bi gelemperî li ser lihevketina qenc û neqencan dirawestin, ji bo bidestxistana nirxên bingehîn, roleke sereke digirin. Ji bilî vê armanca çîrokê, zarok bi rêya çîrokan demeke kêfxweş jî derbas dikin. Lê belê armanc û taybetmendiyên çîrokan li gor lêkolîneran cûda cûda hatine dîtin, ji ber vê yekê jî senifandina çîrokan di qada navneteweyî de bi komên curbicur hatine kirin. Ji van komên senifandinê yên herî balkêş û tên pejirandin xebatên Antî AARNE û Stith THOMPSON in.

Di cîhanê de senifandina çîrokan cara yekem ji aliyê lêkolînerê Çîrokan yê Fînî Antî AARNE di sala 1910an de hatiye kirin. AARNE, ev xebata xwe li ser çîrokên Danîmarka, Almanya û Fîniyan çêkiriye. Xebata li ser senifandina çîrokan ya duwem jî ji aliyê lêkolîner StithTHOMPSON ve di sala 1928an de hatiye kirin û ev xebat jî li ser çîrokên Brîtanyayê hatine çêkirin (Luthî,1997: 70).

Antî AARNE çîrok di bin sê beşan de veqetandiye:

1. Çîrokên Ajalan
2. Çîrokên Resen
3. Çîrokên Pêken

Stith THOMPSON jî senifandina AARNE hinek din bi pêş de biriye û senifandineke wiha kiriye:

1. Çîrokên Ajalan
2. Çîrokên Gelêrî yên Resen
3. Çîrokên Pêken
4. Rêzeçîrok
5. Çîrokên Derveyî Senifandinê (Aslan, 2001: 273-277).

Pertev Naili BORATAV jî senifandineke wekî Thompson kiriye:

1. Çîrokên Ajalan
2. Çîrokên Derasayî
3. Çîrokên Rastî/Resen
4. Çîrokên Pêken
5. Rêzeçîrok (Boratav, 1982: 78).

## 1. Çîrokên Ajalan

Çîrokên ajalan kurt in. Di van çîrokan de şîretkirin peyama bingehîn e. Çîrokên ajalan, berê guhdaran didin hizirkirinê. Di van çîrokan de her çiqas perwerdehiya guhdaran armanca yekem jî be taybetmendiya van ya kêfxweşiyê jî cihekî girîng digire (Bilkan, 2009: 20).

Çîrokên ajalan ew çîrok in ku lehengên wan ji ajalan pêk tên. Ji çîrokên ajalan re fabl jî tê gotin. Her çiqas lehengbûna ajalan û axaftina wan derasayî xuya be jî ji ber ku ajal bi gotin û helwestên xwe mirovan dinimînin ji bo guhdaran ne ecêb in. Dawiya van çîrokan her dem bi ders û şîretên sincî diqedin (Pertev, 2009: 88).

Çîrokên lehengên van ji ajalên taybetmendiyên van mîna mirovan in, hemû di nav cureya çîrokên ajalan de cih digirin. Gelek caran ajal wekî sembolan e û tu caran taybetmendiyên ajalan nîşan nadin. Ev çîrok bêhtir bala zarokan dikişînin (Sakaoglu, 1999: 16).

Di cîhanê de ji bo çîrokên ajalan em wekî mînaka herî baldar "*La Fontaîne"*bidin dê cih de be. Lê belê navê La Fontaîne û çîrokên ajalan çiqas bi hev re werin bilêvkirin jî bingeha van çîrokan çîrokê Hind û Rojhilatê tên pejirandin (Şirin, 1998: 21-24).

**2. Çîrokên Derasayî**

Pêşberê vê peyvê ya Almanî "märchen" e û ev cûre wekî çîrokên gelêrî yên ji keleporê tên zanîn. Ev çîrok bêhtir li ser sêhrê tên ava kirin û her dem qerqodeya mijarê li ser keftelefta qenc û neqencan e. Çîrok bêşîk bi serkeftina lehengên baş encam dibe. *Sîndirella, Prensesa Pembûû Heft Cûce, Rinda di Xew* de hwd. ji vê cureya çîrokê ne (Sakaoglu, 1999: 16).

Di nav cureyên çîrokan de ya bi têgeha xwe re herî guncaw dibe çîrokên derasayî ne. Hem ji aliyê mijar hem jî ji aliyê lehengan ve ev çîrok derveyê hişê ne û bi tevahî xeyalî ne. Ev çîrok li derdora lehengên derasayî yên mîna cin, perî, dêw, pîrhefok, ejderha tên derbirîn. Ev rewş jî bi rêya van çîrokan rastiyê derdixe pêş (Bilkan, 2009: 21).

Rexneyên ku ev cure li ser zarokan bandoreke negatîf dikê hebe jî encama van çîrokan her dem bi erênî ye. Ji bo vê yekê jî ev peyama erênî daxwaza tekoşînê û sebirê bi zarokan re çêdike û zarok van têgehan bi awayeke zû hîn dibin.

**3. Çîrokên Rastî/Resen**

Di van çîrokan de kes û bûyer nêzîkî rastiyê ne. Gelek kesên çîrokan yên mîna padîşax, wezîr, dewlemend, xizan, qazî, şivan, gavan, mîr û hwd. bi wesfên xwe yên jiyana rastîn di çîrokan de cih digirin (Bilkan, 2009: 21).

Di van çîrokan de bi gelemperî dijîtî heye; mîr-xulam, axa-rênçber, dewlemend-xizan, xweşik-kirêt, xurt-bêhêz hwd. Her dem yê ji aliyê teybetmendiyên xwe kêm yên din têk dibe. Kesên di çîrokên resen de ji kesên çîrokên derasayî de gelekî necûda ne. Lê

belê dîsa jî taybetmendiyên wan yên xweser hene. Di van çîrokan de lehengê sereke Padîşax e(Güleç 1988: 72).

**4. Çîrokên Pêken**

Ev çîrok gelemperî ji serpêhatiyên xwedî yarî û henekan pêk tên. Taybetmendiya vê cureyê ya herî girîng kurtbûn û tîrbûna wê ye. Ev çîrok carinan ji serpêhatiyên mûstehcen û ji aliyê zayendê ve vekirî pêk tên. Ji ber vê yekê jî bêhtir di nav mezinan de belavbûyî ne (Bilkan, 2009: 22).

**5. Rêzeçîrok**

Di van çîrokan de heme bêje lehengên çîrokê hemû ji ajalan pêk tên. Rêzeçîrok, ji rêzkirina bûyerên biçûk û negirîng pêk tên (Bilkan, 2009: 23).

Xelekên van çîrokan bi girêka hişmendiyê û awayeke hişk bi hev ve girêdayî ne. Vegotin li gor hejmara xelekan kurt û zêde dibe; bi gelemperî rêzeçîrok gelek ne dirêj in, bi awayeke lez diherikin. Gelek caran vegotin ji derekî dizîvire û ji bûyera dawiyê tê bûyera pêşiyê an jî ji lehengê dawiyê tê lehengê pêşiyê(Boratav, 1982: 95).

Ev çîrok ji çîrokên kurt yên li pey hev pêk tên. Armanca rêzeçîrokan ji şîret û perwerdehiyê zêdetir kenandina zarokan e. Zarok bi dil û can guhdariya van çîrokan dikin û di navbera xwe de jî herî zêde van dibêjin. Çîroka gelêrî “Pîrê û Çûk”ê mînakeke vê cureyê ye, bi kurtasî çîrok wiha ye; Pîrê çi dike çi nake nikare tenûra xwe pêxe. Çûk striya xwe didê pîrê, pîrê bi striya çûkê tenûra xwe pê dixe. Paşî çûk striya xwe ji pîrê dixwaze. Ji ber ku pîrê nikare striya çûkê bidê, çûk dawa heft nanan jê dike û ji pîrê distîne. Paşî dîsa bi vî awayî heft nanan dide şîvanan heft beranan ji wan distîne. Heft beranan dide dawetekê, bûkê ji wan distine, herî dawiyê jî bûkê dide şivanekî û bilûra şivanî jê distine û li bilûra xwe dixe (Xamo, 2014: 302-305).

Çîroka yekem çîroka çûk û pîrê ye, ya duyem ya çûk û şivanan e, ya seyem ya çûk û xwediyên dawetê ye, ya çarem ya çûk û şîvan e. Çawa tê ditin di çîrokekê de çar çîrokên kurt veşartî ne.

## 2.5 Çîroka Kurdî

Di nav gelê Kurd de hem navê çîrokê hem jî pênaseya çîrokê bi gelek cureyan tên zanîn. Li gor herêman nav û naveroka çîrokê bi awayeke xwezayî tê guhertin. Di

warê vê rewşê de sedemên herî girîng neyîniya standartbûna zimên û neyîniya xwendin û nivîsandina Kurdî ya di nav gel de be jî ji aliyê gelek sedemên vê guhertinê yên din ve di nav folklornas û lêkolînerên Kurd de hêj jî xaleke nîqaşê ye. Her çiqas encama van nîqaşan diyar nebibe jî tişta ku em dizanin Kurd ji aliyê çanda devkî ve gelek dewlemend in. Gelê Kurd li herêmên xwe navê çîrokê bi çi awayê bi kar anîbin jî diyar e ku di çanda devkî de çîrokê jî cihekî fireh û girîng girtiye.

Di Kurdî de li ser navkirina "çîrok"ê nêzikê panzdeh navan tên bikaranîn. Bêguman sedemên zêdebûna navan hene. Ji bo me sedema yekemîn kêmbûyîna berhemên nivîskî ne. Ji ber ku nivîs di nava gelê Kurd de zêde nehatiye bikaranîn. Gelê Kurd çand, dîrok, ceribandinên xwe bi rêya devkî û bi çîrokan gihandîya roja me ya îro. Em bi rêya wan berhaman li ser dîrok, mîtolojî û destanên Kurdan agahî digirin. Sedemeke din jî dîsa ji bo me, çîrok bi gelemperî ji bo perwerdekirina zarokan hatiye bikaranîn. Vêca ji bo hezkirin û pêşirînkirina zarokan ji bo çîrokê navên balkêş wekî çîrok, çîrçîronîk, dastan, xeberoşk, çêrçerok, çîronk, çîvanok, qewatî, biserhatî, meselok, xeberoşk, çîrvanok, çîrçîrok, serborî, metelok, kurteçîrok, xemisok, mesel, serpêhatî, hîkaye û hwd. tên bikaranîn (Kızıl û Tanrıkulu, 2015: 70-85).

Di nav Kurdan de sedema zêdebûna navên çîrok an jî çîrokên gelerî em dikarin bibêjin erdnigarî ye jî. ÎZADY, di pirtûka xwe de di derbarê vê sedemê de wiha dibêje: "Firehtirîn beşa çîrokên gelerî yên Kurd, em dikarin di bin navê "Kurdish winter stories-çîrokên zivistanê yên Kurdan" de berhev bikin. Lewra ev çîrok bi gelemperî di şevên dirêj û sar û xetere yên zivistanên Kurdan de tê vegotin. Ev çîrok behsa serkeftin û têkçûnên lehengan dikin. Di van çîrokan de, ji bo guhdaran di dawiyê de gelek gotinên bi şîret, bi mesaj û rê û rêbaz hene ku mirov bi wan xwe ji şertên demsala zivistanê diparêzin (Resûl,1992: 239).

Heciyê CİNDÎ û Emînê EVDAL, di pirtûka xwe bi navê "Folklora Kurmanca" de di derbarê çîroka Kurdî û sedemên pirnavbûna çîroka Kurdî de ronahiyê didin hinek xalên girîng:

"*Zarbêjî, çîrokbêjî, denbêjî bi jiyana gel ve girêdayîne û wek hewa, nan û avê her dema jê ra pêwîst in. Gelê Kurd çîrokbêj û dengbêj e. Dîwanên mîr û hakiman, odên gundan timê ciyê çîrokbêj, dengbêj, aşiq û derwêşan bûne.*

*Zargotina Kurdî pircûre, pirewaz û pirreng e. Ew çîrok in, destan in, afirandinên olî ne, kilam in, beyt in, mesele û metelok in. Her cûrekî afirandina*

*bedewîtiyê ya gelêrî, nexş û ewazek e, reng û rewşek e, bedewîk û xemlek e, qeydekî şîrîn îxwezayî û giranbûha ye.*

*Zarbêjiya Kurdî, wek kaniyên avzelal e gur, timê bi merdane ji gund û şên, ji çiya û baniyê Kurdistanê kişiyaye. Bi, dewranan çemên wek Ferat û dîcleyê ji ber herikîne Ji wê avê ne ku tenê xelkên Kurd, lê gelên cînarê Kurdan jî zeviyên xwe yê ruhî pê av dane.*

*Bi heyf gerekê bê gotin ew xizina mezin nehatiye xweyîkirin, îmbarkirin.*

*Tûnebûna dewletê, zeyîfbûn yanê bi heqî gotî tûnebûna xwendin-nivîsarê bi zimanê dê, gelê Kurd nikarîbûye xizina zargotina xwe ye bi dewrana xweyî derkevê, xweyîke."*(Cindî û Evdal, 2008: 23-25).

PERTEV, di pirtûka xwe ya bi navê "Zarok û Çîrok" de nîqaşên li ser nav û naveroka çîrokê bûyîn bi awayeke berfireh dide û hinek gotûbêjên nivîskar û rewşenbîrên Kurd yên di derbarê vê mijarê de wekî mînak dide:

*Birêz Firat Cewerî derheqê vê mijarê de dibêje ku:*

*"... tê wê manê ku ez niha, di dema îro de, ji bo şêweyê hunerê gotina 'çîrok' an jî mîna kurmancên jêr dibêjin 'kurteçîrok' dipejirînim û loma min ev nav bi kar aniye. Di kovar û rojnameyên mîna Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-1945), Roja Nû (1943-1946), Hêviya Welêt (1963-1965), Çiya (1965-1970), Hêvî (1983-1992) û gelek kovarên kevin û nû de navê 'çîrok'ê hatiye bi kar anîn... Herçî Kurdên Sovyeta berê ne, wan jî 'çîrok'ê wêdetir, gotina 'serhatî' bi kar anîne. Gotina serhatî, çîrok, kurteçîrok, serpêhatî, serbûrî her maneya 'story'an jî 'short story'a Îngîlîzî dide ku tê maneya çîrokê.*"

*Her wiha Cewerî piştî hin agahiyan dewam dike û dibêje:*

"*Lê ev jî rastiyeke ku gotina çîrokê ji aliyê gelek kesan mîna 'masal'a Tirkî, an jî 'saga'ya Swêdî tê fehmkirin. Li gelek deverên Kurdistanê Kurd ji masalê re dibêjin çîrok. Lê li hin deveran jî gotina 'çîrçîrok' heye ku ev gotin di kovara Hewarê de jî hatiye bikaranîn.*

*Di jiyana rojane de, di danûstandinên civakî de gotina 'çîrok' di zimanê gel de pir tê bi kar anîn. Gava yekî ji yekî re behsa jiyana xwe an jî behsa jiyana hinên din bike û yê ku jê re tê behs kirin hê jî bipirse, yê ku behs dike dibêje, 'çîroka wan dûr û dirêj e' an jî 'ev çîrok dirêj e', an jî 'çîrokeke dûdirêj e.'* "

Pertev piştî ramanên Cewerî, cih dide ramanên Rohat Alakom:

*“Di nav folklora Kurdî ya devkî de dewlemendiyeke herî mezin bêguman çîrok in. Çîrok beşeke folklorê ye, nivîskarên wan ne kifş in, gel bi xwe ev berhem afirandine. Car car di weşanên periyodîk de, çîrok li şûna serpêhatiyan (kurteçîrok)jî tê bi kar anîn. Lê belê ev yeka ne rast e, ji ber ku nivîskarên serpêhatiyan kifş e, serpêhatî berhemên nûjen in, bi tehr û naveroka xwe ve ji çîrokan cûda dibin. Ev yeka di warê navlêkirinê de tevlîheviyeke mezin peyda dike. Car car ji van her du berheman re jî çîrok tê gotin.*

*Dema mirov bi çavekî zanistî, rexnevanî û lêkolînî li çîrokên Kurdî mêze dike û babetên van analîz, safî dike, mirov wê çaxê dibîne ku ev berhem, afirandinên gelî, wek destanên Kurdî, gotinên pêşiyan û stranan ji me re dewlemendiyeke jiyîna folklorîk pêşkêş dikin. Li me şîretan dikin, rê nîşanî me didin, me di nav fantaziyên rengîn de dihêlin. Fantazî, xewn, xewnerojên sedsalan di nav van çîrokan de her çûne dewlemend bûne, beşek ji wan bi rastiyên jiyînê ve gihîştine hev, ji aliyê mirovan de têgihiştina jiyînê hêsantir kirine.”*

Di derheqê vê mijarê de Pertev dîsa hevpeyvîneke Zeynelabîdîn Zinar mînak dide:

*“Di rastiyê de berhemên gelêrî yên wekî ‘çîrok’ û ‘çîvanok’ ji hev du zêde bûne. Lê di navbera wan de ferq heye; di bingeha çîrokê de hîkayekî rasteqîne heye û ev di nav gel de hingî hatiye vegotin wekî şiklî hin guhertin çêbûye. Bo nimûne di hin çîrokan de em rastî navên padîşah, qral, sultanan têne. Ji van navan kêm zêde em texmîn dikin ev çîrok di kîjan zemanî de derbas bûye... Lê di çîvanokan de bûyereke rasteqîne nîne. Fantazî û pêşnumayên xeyalî hene ku ne diyar e ji layê kî ve hatiye afirandin...”* (Pertev, 2009: 87-91).

Ji agahiyên li jor em diderxin ku edebiyata Kurdî ji aliyê berhemên devkî ve gelekî dewlemend e nexasim ji aliyê çîrokan ve. Berhemên folklorê ji ber vê dewlemendiyê her çiqas rastî hin pirsgirêkan were jî em dizanin ku ev pirsgirêk ji xurtbûn û pirengiya folklora Kurdan derdikeve. Tişta ku em ji van nîqaşan bi awayeke kurtasî derbixin; çîrok û çîrokên gelêrî, çîrok û serpêhatî, destan û çîrokên gelêrî û hwd. her çiqas di cihê hev du de werin bikaranîn jî ne yek tişt in û gelek taybetmendiyên wan yên cûda hene.

### 2.6 Hin Têgehên Çîrokan

Di lêkolînên çîrokan de girîngiyek jî têgehên çîrokê ne. Dema çîrok tên lêkolîn ev têgehên bingehîn yên wekî; formel, kesayet, motîf û tîp derdikevine pêş. Ji bo têgihiştina çîrokê ya berfireh, zanîna van têgehan jî pêwîst e. Lewra di nav edebiyata devkî de ev taybetmendî di çîrokê de bi awayeke xweser û girîng cih digirin.

#### 2.6.1 Formelên Çîrokan

Taybetmendiya çîrokan ya herî girîng, ne formel jî bin, di nav honandina çîrokan de formel cihekî gelek girîng digirin. Ku navê çîrokan tê gotin hêmana ewil tê bîra mirov formel in. Mirov ji formela destpêkê fam dike ku bûyerên baldar dê pêk bên û her dem alîkarê qenciyên dê ser bikevin. Formel mirovan derdixe geriyaneke bêserî û bêbinî. Formel hem di nav beşên çîrokan de peywira girêkekî digire hem jî herikbariyekî dide çîrokê. Her wiha bala guhdaran dikişîne vegotinê.

Formel, qalibên di nav çîrokê de xwedî peywireke diyar in (Sakaoglu, 1999).

Di dîroka lêkolînên çîrokan de heta niha gelek lêkolîneran li ser formelên çîrokan li gor zanyariyên xwe senifandin kirine. Di nav van senifandinên formelan de hem lêkolînerên bîyanî hem jî yên hemwelatî hene.

BORATAV, formelê wiha pênase dike:"Hin gotinên biqalip û li gor cihê xwe yê di çîrokê de di destpêk, honandin û dawiyê de kurt an jî dirêj tên gotinin. Çîrokbêj an jî gotyar van gotinên qalipirtî di hişê xwe de amade digire û li ku dera çîrokê pêdiviyê bibîne bi kar tîne. Çîrokbêj an jî gotyarê baş yê ku formelan di cihê wan de bikartînê ye."

BORATAV, formelên çîrokan di bin çar serenavan de dinirxîne:

1. Formelên destpêkê yên kurt.

2. Bûyerên ecêp yên ku çîrokbêj wekî serboriyên xwe bi devê kesê yekem dibêje.

3. Çîrokên zincîrî yên wekî çîrokên serbixwe.

4. Formelên di nav çîrokan de û di dawiya çîrokan de (Boratav, 2008: 76-77).

SAKAOGLU jî formelan wiha disenifînê:

1. Formelên Destpêkê

2. Formelên Girêdanê / Derbasbûnê

3. Formelên di Dubarekirina Gotinan de

4. Formelên Dawiyê
5. Hin Hêmanên Formelan

### 2.6.1.1 Formelên Destpêkê

Formelên destpêkê; formelên ku gotyar hêj bi dest çîrokê nekirî ne. Armanca van formelan amadekirina guhdaran e (Sakaoglu, 2007: 58).Formel tevahiyeke çîrokê ne û mirov nikarê wan ji çîrokê cûda bigire. Peywireke formelan din jî herikbariyê dide çîrokan û balkêşiya çîrokan xurtir dike.

Hin formelên di destpêka çîrokên Kurdî de ev in:

- *Carekî... hebû/hebûn.*
- *Carekî cebarekîrehm li dê û bavên guhdarekî.*
- *Car ji nava caran, rehm li dê û bavên guhdêran.*
- *Carek ji caran rehm li dê û bavê guhdaran.*
- *Carek ji caran rehm li dê û bavê hazir û guhdaran.*
- *Carek hebû carek nebû kes ji Xwedê mezintir nebû û kes jî ji beniyan derewîntir nebû.*
- *Hebû tû nebû kes ji Xwedê mezintir nebû û kes jî beniyan derewîntir nebû.*
- *Hebû nebû... hebû/hebûn*
- *Heyamê berê /Zemanekî... hebû/hebûn.*
- *Rojekî... hebû/hebûn*
- *Tiştek hebû tiştek nebû, çû tişt ji Xwedê mezintir nebû*

### 2.6.1.2 Formelên Girêdanê / Derbasbûnê

Di çîrokan de peywira formelên girêdanê / derbasbûnê ya herî girîng derbasbûna di nav bûyeran de pêk tînê ye. Her wiha çîrokbêj balkêşiya vegotinên xwe bi rêya van formelan zindî digirin (Sakaoglu, 2007: 59). Di piraniya çîrokên Kurdî de formelên girêdanê bi awayeke helbestkî ango bi kêşe û stranî tên gotin lê ji ber ku çîrokên Kurdî ji demeke mêj de nehatine nivîsandin û parastin gelek ji van formelan ji aliyê gotyaran ve hatine jibîrkirin.

#### 2.6.1.2.1 Formelên ku di nava çîrokê de derbasbûnê pêk tînin

Ev formel ji bo ku baldariya çîrokê zêde bike û di nav çîrokê de derbasbûnekê pêk bîne tên bikaranîn. Ev ji bo ku guhdaran ji guhdariyê aciz nebibin tên bikaranîn. Di çîrokên Kurdan de formelên ku kêfekî didine guhdaran bêhtir ev formel in, lewre ev formel hem bi kêşe ne hem jî gotinên xwedî yarî ne.

#### 2.6.1.2.2 Formelên dema dirêj bi awayeke kurt îfade dikin

Çîrokbêj wekî çîrokê dibêje, ji ber ku guhdar ji gudariyê aciz nebin carina hin formelan bi kar tîne û çîrokê bi kurtasî dibêje. Ev formel hem çîrokan ji dûvdirêjbûnê rizgar dikin hem jî di navbera bûyeran de derbasbûnekê pêk tînin. Bi vê awayê bêhna guhdaran jî teng nabe. Mînak:

- *Welhasil...*
- *Du sê rojan bi rê diçe...*
- *Rojek du roj bi ser da diçe...*
- *Dem dibore...*
- *Du sê mehan...*
- *Salekî...*
- *Gelek di ser de naçe...*
- *Sal û zeman...*

#### 2.6.1.2.3 Formelên ji temaşeyên lehengan pêk tên

Di Formelên ji temaşeyên lehengan pêk tên bi gelek giyanweran di çîrokan de cih digirin. Di formelên derbasbûnê de temaşeyên giyanwerên mîna; mirov,dêw, hirç, pîra mirovxwer/pîrhefok, rovî, kotir/kevok, mar, gur, se û hwd. cih digirin.

### 2.6.1.3 Formelên di Dubarekirina Gotinan de

Ev formel ji axaftina du kesan pêk tên. Lewre ev axaftin di hin çîrokan de wekî qaliban cih digirin. Ji van formelan hin wekî pirs û bersiv hin jî wekî axaftinên asayî ne (Ozçelik, 2004: 77).Ji bo mînakê em dikarin çîroka *'Pîrê û Rovî'* ku di nav herêmên Kurdan hemûyan de tê zanîn bidin. Di vê çîrokê de formela axaftina dubara di navbera rovî, pîrê, bizin, çilo, hedat de derbas dibe;

*"Rovî jî diçe dev bizinê û dibêje:'Bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê mam rovî bide!'*

*Bizin dibêje:'Rovî here çilo bîne ez dê şîr bidime te.'*

*Rovî diçe dev çilo û dibêje:'Çilo çil bide, çil bizin bide, bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê mam rovî bide!'*

*Çilo dibêje:'Rovî here dasê bîne ez dê çilo bidime te.' Rovî jî diçe dev hedatî û dibêje: 'Hedat das bide, das çil bide, çil bizin bide, bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê mam rovî bide!'"*

#### 2.6.1.4 Formelên Dawiyê

Heta çîrok dom dike çîrokbêj bûyeran di xalek duyan de bi peve girêdide û piştî vê jî çîrokbêj divê çîrokê bi awayeke rêkûpêk bidawî bîne. Dema çîrokbêj, çîrokê bi hin gotinên bi kêşe girêdide û bala guhdaran dikîşîne xwe, dawiya çîrokê jî heta ji wî tê dirêj dike û bi formeleka dawiyê çîrokê xilas dike. Li vê derê du xal bala me dikişîne. Yek ji van hostayîya çîrokbêj e, yek jî bala guhdaran e. Çîrokbêjên şareza dawiya çîroka xwe bi formeleke herî baldar xilas dikin, ji ber ku gelek formelan dizanin. Bala guhdaran jî li ser çîrokbêj gelek bi bandor e. Ku guhdar hêj çîrok xilas nebûyî biaxivin an jî bi dest kenê bikin, çîrokbêj jî çîroka xwe bi formeleke herî kurt xilas dike (Sakaoglu, 2007: 62-63).

Di çîrokên Kurdî de hin mînakên formelên dawiyê:

- *Ez jî ji wir hatim yekî zêrek jî neda min.*
- *Çîroka me li vir xilas. Rehm li dê û bavên we.*
- *Rehm li dê û bavên guhdaran.*
- *Çiroka me çû deştê, dê û bavên me çûn beheştê.*
- *Ew her du gihiştine miraza xwe rehm li dê û bavên guhdaran.*
- *Ez hatim malê rehm li dê û bavên guhdaran.*

### 2.6.2 Kesayet

Wekî di berhemên edebiyatê yên din de, di çîrokê de jî bûyer li derdora kes an jî kesayetan pêk tê. Taybetmendiya lehengên çîrokê ya herî girîng ew e ku piraniya wan kesayetên derasayî ne. Lehengê çîrokê rasteqîn jî be xeyalî jî be cûdahiya wî/wê ya herî diyar taybetmendiyên wî/wê yên derasayîne.

Lehengên çîrokan bi gelemperî kesayetên di nav civakê de temsîl dikin. Carinan ev leheng ji wan kesayetên ku civak bêriya wan dikin pêk tê, carinan jî kesayetên ku civakê jê hez nekiriye û ji xwe dûr xistiye pêk tên. Her wiha lehengên çîrokê çi jî be taybetmendiya kesên di nav civakê de di nav xwe de dihemînin. Lewra çîrok neynika civakê ye.

Lehengên çîrokan ji hemû; "mirov (padîşax, mîr, bazirgan, darfiroş, keçelok, erep hwd.); ajal (şêr, rovî, hesp, kevok, ker, mar hwd.); riwek (dar, kulîlk hwd.); amûr û heyber (çiya, kevir, şkeft, bîr, av, sifre, sicade, aş, neynik, bilûr hwd.); giyanwerên xeyalî (dêw, perî, cin hwd.); fikrên xwerû û şênber (hiş, jîrayî, qencî, xirabî, bedewî hwd.) " tiştên tê hişê mirovan pêk tên (Elçîn, 1993: 369).

Dema me ev hemû agahî berhev kirin, em dibînin ku hemû tişt wekî kesayetekî derdikevin pêş me lê em dikarin bibêjin di çîrokan de piraniya kesayetan ji mirov, ajal û giyanwerên derasayî pêk tên.

### 2.6.3 Motîf

Motîf di vegotinên devkî de wekî hêmanên herî biçûk derdikevin pêşiya me. Motîf carinan li derdora kesayetan carinan jî wekî buyerakî carinan jî bi awaya tevgereke guhdaran derdikevin pêşiya me.

Têgeha "motîf"ê ji bilî di jiyana rojane de tê bikaranîn; di muzîk, wêne, hunerên bidestî û edebiyata gelêrî de jî tê bikaranîn. Lê belê ev têgeha di edebiyata gelêrî de tê bikaranîn; ji bikaranîna di jiyana rojana û şaxên hunerê yên din de cûdatir e. Di derbarê motîfê de ji xebatkarê herî girîng Stith THOMPSON, di berhema xwe ya bi navê "*Motif Index of FolkLiterature*"de wiha pênase dike: "Hemana herî biçûk ya çîrokên ji berê de xwedî jiyaneke domdar e." (Alptekin, 2002:113).

Ji lêkolînerên ku li ser motîfê xebîtîne Arthur CHRİSTENSEN motîfê wiha pênase dike: "Ew hêmanên ji bo pêkvedanên fikrên nû xwe bi awayeke gelek an jî hindik biçûk dikin, xwe bi zindîbûna xwe dipejirînin û guhdaran dikin nav destê xwe ye." (Şimşek,2001:156).

Alî Berat ALPTEKÎN, di pirtûka xwe ya bi navê "*Taşeli Masalları*"yê de cih dide pênaseya lêkolîner VESSELOVSKİ: "Komeka ku di çîrokê de êdî nabe tû qetên din e." (Alptekin, 2002:114).

Cureyên motîfên ku di çîrokan de tên bikaranîn li gor çand û dirûvê jiyana çîrokbêj diguhere. Çîrokbêj, dikare mijarên dizanê an jî guhdarkirî biguherîne û wan wekî motîfên nû di çîrokan de bi kar bîne. Lê belê piraniya motîfên tespîtkirî di "*Îndeksa Motîf*"an de cih digirin. Di pênc cildên ewilîn Îndeksa Motîfa ya Sitît THOMPSON de motîf li gor mijarên xwe ji A'yê heta Z'yê hatine rêzkirin. Her ji tîpekî mijarekî nîşan dide. Ev mijar:

A. Motîfên Mîtolojîk
B. Ajal
C. Qedexe
D. Sêhr
E. Mirin
F. Derasayî
G. Dêw
H. Ezmûn
J. Yên biaqil û bêaqil
K. Xapandin
L. Lêzîvira Qederê ya Vajî
M. Kifşkirina Pêşerojê
N. Şans û sûd
P. Civat
Q. Xelat û Ceza
R. Êxsîr û Revok
S. Zordariyên Derasayî
T. Zayend
U. Xwezaya Jiyanê
V. Ol
W. Taybetiyên Kesayetan
X. Pêken
Z. Hin Komên Motîfan (Şimşek, 2001: 156-158).

### 2.6.4 Tîp

Li gor weşana malper ya TDKyê(2016) pênaseya tîpê: "Ew tişta ku taybetmendiyên heman cure tişt û heyberan di nav xwe de dihemînê ye; kesê ku di berhemên edebiyatê yên wekî çîrok, roman û şanoyê vegotina wan dirêj de di nav qedroya kesan de cih digire û nûnertiya fikreke diyar û hişmendiya civakê dike ye; ew kesê lîstikê yê ku ji aliyê kesayetê ve nexweser, bi gelemperî kesên di nav civakê de diyar nîşan dide ye."

Mehmet KAPLAN, di pirtûka xwe ya bi navê "*Türk Edebiyatı Üzerine Araştırmalar Tip Tahlilleri*"yê de tîpê wiha pênase dike: "Ji aliyê civakê ve watedar e. Mirov, hişmendiya civakê ya ku jê derdikeve, ûrf û edetên wê û şertên wê yên civakî fam dike. Ew nûnertiya baweriyên dewrên civakê dikin. Tîp, peywira mifteyê ya berhemên edebî hildigirin li ser xwe. Dema şarezayî diguhere tîp jî diguherin." (Kaplan, 2009).

Li gor Doğan KAYA tîp: "Ew berhem an jî kesê ku xwedî hêza hebûnekexweser e." (Kaya, 2007).

Ji ber ku tîp motîfan di nav xwe de dihemînin awaya wan hinekî berfirehtir e lê ev berfirehî li gor cureyên çîrokan diguherê. Di tîpekî de dibe ku ji motîfekê zêdetir motîf hebin. Lê belê di çîrokên gelêrî yên bingehîn de motifên zêde dê her hebin. Lê çîrokên ajalan de bi gelemperî motifek tenê heye.

# 3 ÇÎROKÊN ZAROKAN Û NIRXÊNDI ÇÎROKÊN ZAROKAN DE

## 3.1 ZAROK

Zarok gencîneyeke hêj nehatiye kifşkirî ye. Pêwîstiya zarokan bi kifşkirinê heye. Lewre dinyaya zarokan ya xeyalê fireh e, xwezaya wan jî bêdawî ye. Zarok di nav vê dinyaya xeyalî ya bêdawî de bingeha geşedana xwe diavêjin û kesayeta xwe di nav civakê de bi dest dixin.

Mirovahî, ji roja hebûna xwe û heta niha bi armanca domandina dûndana xwe jiyaye. Mirov li ser domandina dûndana xwe dibe xwedî zarok. Armanca hevpar ya mirovên hatine li ser dinyayê û yên niha dijîyin zarok e. Zarok berdawamiya mirov û civakan pêk tînin. Ji ber vê yekê jî zarok her dem bûye hêviya mirovahiyê. Lewre zarok xelateke xwezayê ya ji bo mirovahiyê ye. Ji roja yekemîn ya jiyanê û heta niha peywira mirovahiyê ya herî girîng ku li ser zarokan, perwerdehî û veguhestina nirxên civakî ne. Her wiha pênaseya zarokan ji bo mirovahiyê di dîrokê de bûye ezmûneke girîng.

Di zimanê Kurdî de ji bo salên heta dozdeh û sêzdeh navên wekî zarok, zaro, zarî, gede, gedek, sêlek, sêwlek, doman, qeçek, sebî, mindal, eyal, tifal, biçûk, piçûk, weled û hwd. tên bikaranîn (Pertev, 2009: 21).

Di Ferhenga Saziya Zimanê Tirkî de zarok: “Mirovê di serdema geşedeanê de yê di navbera heyamên bebektî û balixbûnê de ye.” Tê pênase kirin. Li gor vê pênaseyê, zarok ji aliyê geşedanên bedenî û zîhnî ve di navbera temenên 0-16ê de tê dîtin (TDK, 2012).

Zarok, çêlîka mirovan yê ji temenê duyan heta temenê balixbûnê di serdema mezinbûnê de ye; kur an jî keça hêj balix nebûyî ye (Yalçın û Aytaş, 2012: 13).

Li gor zanyaran bi gelemperî zaroktî dibe çar serdemên (0-6; 6-8; 8-12; 12-15)temenê mirovan. Hinek, her çiqas van serdeman cûda cûda disenifênin jî bi gelemperî ev senifandin tê pejirandin. Di serdema zaroktiyê de her koma serdema temanan xwedî taybetmendiyên xweser in. Ku em bixwazin li ser çîrokên zarokan nirxandineke baş bikin divê em van komên serdemê temenan li gor taybetmendiyên wan binirxînin. Ji ber ku çawa her temenek xwedî taybetmendiyên xweser e, pêwîstî û pêwendiyên wan jî xweser in. Ev pêwîstî û pêwendî li gor derfet û peyamên ku em didin zarokan geş dibin an jî pêk tên.

Di diroka mirovahiyê de derfeta zarokan ya pêwîstî û pêwendiyê wekî em îro dinêrin hêsanî çênebûye. Zaroktî bi heta serdemên nêzîk jî ji aliyê gelek civakan ve hêj

nehatibû pênase kirin. Ji Mezrabotan heta Ewrûpaya Serdema Navîn di paşeroja hemû mirovahiyê de zarok wekî modela mezinan dihat pejirandin. Her wiha di wê serdemê de zarok ji bilî wekî mezinan dihatin ditîn, tu qiymetê wan jî nebû. Em heta di sedsala 18an de jî li Ewrûpayê dibînin ku zarok wekî heybereke bê qiymet û kêm hatiye dîtin. “Zaroktî, çiqas di sedsala 16an de wekî serdemekê hatibe pejirandin jî heta navîna serdama 18an jî wekî nirxekî nehatiye dîtin (Nas, 2004: 1).

Bîrbûna mirovan ya li ser dîtina zarokan ku zarok ne modelê mezinan e û zarok xwedî helwest û hizrên xweser in, di serdema 16an de bi dest pejirandinê kiriye. Lê belê pejirandina zarokan ya wekî nîrxekî di serdema 18an de pêk hatiye. Piştî wan geşedanan ji bo zarokan perwerdehiya bingehîn bûye mecbûrî, tevgerên zarokan dest pê kirine, xebata zarokan hatiye qedexe kirin, xebat li ser derûniya zarokan û pedagojiya zarokan lêkolînên zanistî hatine kirin, “Peymana Mafên Zarokan” hatiye destnîşan kirin û edebiyata zarokan derketiye holê.

Zarok, di dinyaya ku bi pêşve diçe û geş dibe de ji aliyê pêvejoya watedarkirina dinyayê ve koma ku herî pêwîstiya wan bi rênişandanê hene ne. Ji ber pêwîstî û temenên zarokan, dinyaya zarokan ji ya mezinan cûda ye. Li cem vê, cûdahiya dinyaya şênber cûdahiya dinyaya derûnî jî girîng e. Ji ber vê yekê jî têgeha “zarok” di dinyaya edebiyatê de ji xwe re cihekî nû girtiye û bi vê awayê ji zarokan re berhemên edebiyatê derketine holê.

Di serdema nûjen de zarok, êdî wekî modela mezinan nehatiye dîtin beravajî alîkarî ji bo geşedana zarokan hatiye kirin. Zarok êdî wekî kes û kesayetekî hatiye pejirandin. Perwedehiya zarokan ya rola bi armanca domandina civakê, jiyana zarokan ya di nav civakê de jî watedar kiriye. Her wiha di çêkirina berhemên ku ji bo zarokan hatina amadekirin de guherandinên rastîhev tên dîtin.

## 3.2 Nêrîna Çîrokên Zarokan

Her çiqas çîrok ji hemû komên temenan re xwedî wateyek e jî lê belê ji aliyê edebiyata zarokan ve cureya herî baldar û dewlemend çîrok e. Naveroka çîrokê ya têr û tijî her dem balê dikişîne li ser xwe. Lehengên derasayî, xeyalên bêsînor û her dem serkeftina heyberên baş ji aliyê baldariyê ve çîrokê ji cureyên din diveqetîne. Çîroka ku pirekî di navbera rastî û xeyalê de ava dike ji dinyaya mezinan ji bo zarokan ceribandinan pêşkêş dike.

Çîrok, ji bo bilêvkirin û pêkanîna zimanê zikmakî mamosteyê yekem e; çîrok yekem car taybetmendiyên çîrokê yên wekî hunerî, herikbarî û dewlemendiyê nîşa zarokan dike. Çîrok hêmana binghîn e ku hesta zimanê zikmakî dide wan (Şahin, 2011: 208-219).

Berhemên edebî, çi devkî çi jî nivîskî bin jî feraseta serdema ku derketine holê nîşa me didin. Ev berhem serdema pêşiya xwe jî digihînin serdema piştî xwe.

Çîrok ji berî hemû tiştî guhdar an jî xwendevanan dikişînin dinyayeke din û dikin ku bi awayeke cûda binêrin. Bandoreke bingehîn ya çîrokê ya din jî dema bûyer pêk tên şîrovekirina dirûvê jiyan, bûyer û amûran ya gotyar û lehengan e. Guhdar û xwendevan bi wan û nêrînên wan jiyanê hîn dibin. Ev aliyê nêrînê hem me digihîne perspektîfa paşerojê hem jî digihîne ramaneke cîhanî(Turinay, 1989: 158).

Çîrokên Kurdî yên ji bo zarokan ji aliyê nirxên civakî û perwerdehiyê ve pêşketîne. Em dikarin bibêjin gelek hîndarî bi rêya çîrokan tên hînkirin. Di vê derbarê de Ramazan PERTEV, di pirtûka xwe ya bi navê “Zarok û Çîrok”ê de agahiyên nivîskar Rohat ALAKOM wekî çavkanî dide: “...çîrokên kurdî gelek hînker û şîretkar in. Di van çîrokan de li dijî bêgavî, neçarî, tunebûn û xizaniyê, çawa em dibînin îmkan û mecalên nedîtî, nebihîstî ji aliyê mêrxasên çîrokî de tên afirandin, di nav van berheman de ew şerê pakî-nepakî, qencî-xerabiyê, xweşî-nexweşiyê her diçe tûj dibe, her çiqas dilsar û rûsar be jî dawiya beşek van çîrokan car car bi mirin û kuştinê ve diqede. Ew şer-dêw, teqereq, serpêhatî, bûyer û qewimandinên mezin yên ku di çîrokên kurdî de tê pêşkêşkirin, ji alîkî de wek neynikekê, janên civatê û rewşa civatê nîşan didin, pêwendî û hevgirêdanên mirovî radixin ber çavan.” (Pertev, 2009: 101). Wekî li jor tê gotin jî di çîrokên Kurdî de hestyariya civakî bi awayeke yekser bandorê li guhdar û xwendevanan dike. Tu çîrokên Kurdî nîn in ku hin nirxên civakî di nav mijara xwe de ne honandibe.

Ji ber ku kêfa zarokan ji taybetmendiyên lehengên çîrokan yên serkeftinê re tên bi lehengên çîrokan re yekhestiyekê pêk tînin û divin wek wan bin. Ev tişt jî bandorê li ser perwerdehiya zarokan ya kesayetî dike. Ev hêman jî girîngiya çîrokên zarokan zêdetir dike. Her wiha di çîrokan de divê taybetmendiyên lehengên çîrokan bêhtir nêzîkî rastiyê be. Divê zarok ji hesta rastiyê dûr nekeve. Divê serkeftinên lehengan bi hin hewildanan pêk bên. Heke serkeftin bi hêzên derasayî an jî ji rasthatinan hatibe bidestxistin, dibe ku ev rewş berê zarokan bide serkeftinên ji rêyên hêsanî werin bidestxistin.

Yek ji armanca perwerdehiyê jî ew e ku zarok wateya jiyana xwe binase. Ji bo pirs û meraqên ku di serê zarokan de derbas dibin wekî “ez ji ku hatime, çawa ji dayîk bûm, mirin çi ye” û wd. Bi bersivên mantiqî li hev bîne. Di serî de zarok van pirsan di cîhana xwe ya xeyalî de watedar dike, bi awayê têgihiştina xwe şîrove dike. An jî di çerçoveyeke giştî de dibîne û zêde li ser wan nafikire. Lê çi heye ku ji bo pêşxistina kesayetiyeke bitendirûst divê bi awayeke têrhatî îla bersivên wan bide. Di vir de gelek caran gotinên mezinan dilê wî/wê rehet nake, her kêmasiyekê dihêle. Girîngiya çîrokê li vir dest pê dike. Mijarên ku di çîrokan de derbas dibin bi rêyekê xwe digêhînin cîhana zarokan û muşkîlê û sergêjiyên zarokan aktuel dikin û dixin rojevê. Yanî zarok bê ku hay jê hebe xwe di nav cîhana çîrokan de dibîne. Tevlî lehengê çîrokê şerê xereban dike, direve, xwe dide alî, xwe vedişêre, li wan dide û axir bi serdikeve. Zarok hesta serkeftinê tahm dike, kêfxweş dibe (Pertev, 2009: 111).

Em dikarin bibêjin di pêkanîna hestyariya zaroktî de cureya herî baş çîrok in. Çîrok, rihê zarokan bi awayeke xwerû têr dike û dinyaya wan ya xeyalî dewlemend dike her wiha wan ji bo pêşerojê amade dike.

FEYZÎOGLU, pirsa “Çîrok ji bo çi ji zarokan re pêwîst in?” wiha dibersivîne: “Çîrok, hêza zarokan ya xeyalî xwedî dike û afirandina wan geş dike. Amûreke ku zimanî geş dike ye. Kesayetên netewî, nasnameyeke çandî û jiyaneke watedar pêk tîne. Tirsê hîn dike û wan ji jiyanê re amade dike. Di navbera çandên din de peywira pirê digire li ser xwe. Mirovê ne kêmhêvî yên xweşbîn digihînî. Ji rizgarbûn an jî xweseriya zarokan alîkariyê dike. Bedewiya di nav kirêtiyê de peyda dike. Lihevxistinên mirovan ya di hûndir de û dijberiya wan ya bi civakê re ji holê radike. Hişmendiya pîşeyî dide zarokan.” (Feyzioglu, 2007: 831-843).

Dema ku çîrok ji hemanên dawerî hate pakij kirin li holê jiyaneke rastîn dimîne. Zarok ji çîrokên xeyalî gelek ceribandinên jiyana rastîn bi dest dixin. Zarok bi rêya çîrokan dijberiyan nas dikin. Ew dijberiyên wekî bihêz-nebihêz, qenc-neqenc, xweşik-kirêt bi rêya çîrokan wêneyeke rastîn dide ber çavên zarokan. Ku mirov bi baldarî berê xwe bide çîrokan dibîne ku çîrok neynika jiyana mirovan e. Her wiha dema mirov di bûyerên rastîn de dijiyin di heman demê de xeyalan jî dikin, mirov jîna rastîn û xeyalên xwe di çîrokan de digîhînin hev. Bûyerên asayî û derasayî di çîrokan de wekî rastîn tên vegotin. Ew bûyerên ku di çîrokên berê de mirov bawer nedikir pêk werin, niha ji aliyên

gelek zarokên wan deman -mezinên niha- ve pêk hatine. Ji vî aliyî ve em dikarin bibêjin çîrokên zarokan ji afirandinên xweser ve jî zarokan amade dikin.

Me, bi heta vir behs kir ku çîrokên zarokan ji aliyê geşedana dinyaya wan ve gelekî girîng e. Her wiha çîrok ji aliyê peyamên ku di nav xwe de dihemîn ve jî gelekî girîng in. Di vê xalê de ji aliyê perwerdehî, veguhestina nirxên civakî û kesayeteke baş ve divê çîrokên zarokan xwedî hin erkên xweser bibe. Halit KARATAY, di gotareke xwe de ev erk wiha rêz kirine:

1. Çîrokên ku ji mijara dijberiya baş û nebaşan pêk tên û her dem lehengên baş serdikevin di hişê zarokan de alîkariya rûniştina têgehên başiyê dike. Di hişê wan de hizreke ku her dem baş serdikevin, çêdibe.

2. Lehengê çîrokê çiqas bê hêz û biçûk jî be her dem ku bimaf be û li ser rêya rastiyê be dê ser bikeve. Tişta bingehîn, rastî û bimafî ye. Hêzeke ku bê maf û bê rastî be tu wateyê wê nîn e.

3. Heke lehengê nebaş serbikeve dê alozî pêk ben. Hin rewşên bê telafî dê derkevin holê. Çîrok, baweriya qencî û rastiyê qewîntir dike; li zarokan şîreta qencî û rastiyê dike.

4. Lehengên ku qenc bin çiqas bê hêz bin jî dê her demê alîkariyê bibînin û dê bi wê alîkariyê serbikevin û ji rewşên nebaş rizgar bibin. Çîrok, bi zarokan re di her rewşê de hizreke erênî pêk tînin û ji bo rewşên xirab re baweriya hînbûniyên erênî pêk tînin.

5. Jiyan bi rasthatinan re tijî ye û ev rasthatîn gelek caran li ser benda rastî û qenciyê ne. Rasthatin di bûyerên çîrokan de cihekî pir girîng digirin.

6. Kî qenciyê bike dê qenciyê bibîne. Ji ber wê ye ku lehengên çîrokan di demên xwe yên zordariyê de tên perûkirin.

7. Di çîrokan de mumkûn e ku ji hin heyberên ji nişkê derdikevin ve alîkarî were dîtin. Divê mirov tu heyber û kesan bê nirx an jî bê wate nebîne. Lewra mîroyeke herî biçûk jî qenciya lêhatîkirin li erdê nahêle dê bersiva wê qenciyê bide.

8. Divê mirov li hemberî hemû zordarî û zehmetiyan bi sebir be. Her kî sebirê bikişîne helbet dê dilşad bibe.

9. Ji ber ku di çîrokên zarokan de gelek ajalên rastî û derasayî hene ev tişt bi zarokan re hezkirin û nirxdayîna ajalan jî pêk tîne (Karatay, 2007: 463-475).

### 3.3 Têgeha Nirxê

Nirx; gihayiyên ku ji bawerî, hêvî û tevgeran re wekî mêzînê ne. Têgeha nirxê, yekem car ji aliyê ZNANİECKİ ve ji zanista civakî re hatiye bidestxistin. Ev peyv ji Latînî hatiye û di rayeke wê de peyva "*valere*" heye her wiha ev peyv jî bi wateya bi qiymet an jî bi hêz e (Bilgin, 1995: 83).

Di ferhenga TDKyê de nirx: "1. pîvana ji bo girîngiya tiştekî diyar bike ye, qiymeta tiştekî, tişteke ku beranberî wê bi pereyan tê pîvan, 2. berdêl, bûha, 3.valor; wesfa hêjayî, jêhatîbûn, qiymet e(TDK, 2012).

Têgeha nirxê hem ji aliyê civakî hem jî ji aliyê derûnî ve hatiye nirxandin. Ji aliyê derûnî ve nirx, di geşedana kesayetê de navenda hêmanên motîvasyonî de cih digire. Derûnasan, nirx bi gelemperî wekî bijarteyên tevgeran yên di temenên nêzîk de bi rêya pêvejoyan tên bidestxistin, pênase kirine(Sagnak, 2004: 101-124).

Nirxên ku di rêkûpêkirina têkiliyên kesan yên di navbera hev û civakê de roleke girîng digirin, di rêkûpêkirina jiyana civakî de jî wekî mekanîzmayekê peywirê digirin. Kes bi rêya nirxan tevgerên mirovên din yên di nav civakê de watedar dikin û fam dikin (Dokmen, 2000: 280).

Ji ber taybetmendiya zanista civakî li ser pênaseya nirxê tu hevlêkirinên werin dest nîn in. Ango pênaseyeka nirxê ya ku ji aliyê hemû kesan ve were pejirandin gelekî zehmet e. Ji ber nêrînên qadên zanistên cûda, nirx jî ji gelek aliyên cûda hatiye pênase kirin. Di mirovnasiyê de; li ser têkiliyên di navbera mînakên çandê û dirûvê jiyanê de hatiye rawestan. Di civaknasiyê de; nirx li gor têkiliya îdeolojî û keleporê hatiye pênase kirin. Di derûnasiyê de; Li ser têkiliya tevgerên kesayetî û ajobariyan hatiye rawestan. Di felsefeyê de; Ji kes û civakê re çi armanc e û çi wan digihîne van armancan li ser vê rêyê meşiyaye û têgeha nirxê bi awayeke razber nirxandiye. Ku mirov li aliyê perwerdehiyê binêre; pergal û saziyên perwerdehiyê yên civakekê amûreke herî girîng e ku nirxên wê civakê wekî neynikekê şewq dide. Ji ber ku perwerdehî dirûvê baweriyê yên li gor nirxan e. Li gor hemû zanistan, civak, bawerî û perwerdehiyê em dikarin bi kurtasî bibêjin nirx, ew hêmana ku kes di jiyana xwe de girîngiyeke cûda lê dikin û li gor wê girîngiyê jiyana xwe didomînin e.

Tê zanîn ku mirov jîndareke civakî ye. Têkiliya mirovan ya yên din re bi tevgera wan ya derveyî pêk tê. Ev tevgera derveyî di heman demê de destpêkirina afirandina nirxan e. Ji ber ku armanca vê tevgerê ya bingehîn nirx e. Mirov her dem divê bi zanîn,

hiş, raman û rihê xwe geş, kûr û mezin bibe. Kesê ku ji aliyê jiyandin, ceribandin û ferasetê ve geş nebe û di cîhê xwe de raweste, ew kes dê sekinbar û teng bimîne (Bolay, 2007:69).

Nirx, ji derve nayên dîtin lê ji tevgerên kesan yên li hemberî di hin rewşan derketîn de tên fam kirin. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin di tevgerên reaksiyonî de bandoreke girîng ya nirxan heye. Nirx, bijarteyên kesan yên di derbarê çi baş e, çi nebaş e, çi xelet e çi rast e de kifş dike û alîkariya kesan dike ku ji nav vebijêrkan bijartineke rast bike. Nirx, ji bo têgihiştina têkiliyên mirovan girîng e. Ji ber ku nirx, ji tevger û biryarên mirovan re rêberiyê dikin û sînorekî didin tevgerên wan. Dema mirov rastî bûyerekî tên, mirov dê çi reaksiyonê bidin ji wan re dibe alîkar. Nirx, kesaneyî ne û bi rêya gotin û tevgeran tên nîşandan. Çalakiyên tên kirin an jî tên gotin nirxa mirovan nîşan dide. Mirovekî xwedî nirx hinekî bi cih û domanbar e. Dibe ku mirovê xwedî nirx di paşeroj û pêşerojê de jî dîsa xwedî heman nirxan be. Bêguman ku mirov bikeve pergaleke nirxandina di nirxê xwe de ev tişt jî dê guherbariyekê çêbike. Dibe ku mirov biryar bide ku hin darazên nirxan êdî neyên pejirandin.

Her çiqas nirx bi jiyana civakê re di nav têkiliyeke xurt de be jî hemû ceribandinên civakê wekî nirxekê nayê pejirandin. Çawa her tevgera ji aliyê kes û civakê ve derdikevin holê dîsa ji aliyê kes û civakê ve ne watedar e; nirx jî bi vê awayê ne. Hemû tevger an jî hêvî nabine nirx. Di derbarê taybetmendiyên nirxan de TEZCAN, nirxandineke wiha dike:“Heke em bibêjin gihiştineke civakî nirx e, divê xwedî hin taybetmendiyan be. Taybetmendiyên nirxan jî ev in:

1. Divê ji aliyê piraniya kom û civakê ve hatibe pejirandin. Girêdayiyê biryara kesekî nîn in.

2. Nirx ji bo pêwîstî û aramiya civakê ne. Ji ber vê yekê ji aliyê her kesê beşdarvanê civakê ve girîng in.

3. Beşdarvanên civakê yên ku wan nirxan dipejirînin, dilxwaz in ku ji bo wan nirxan fedakariyê bikin an jî bimirin. Ji ber nirx di nav xwe de hestan jî dihemînin.

4. Nirx têgehên razber yên ji aliyê hemû kesan ve tên pejirandinin. Nirx bi awayeke razber di hişê mirovan de cih digirin.” (Tezcan, 1987).

Di çîrokan de bêhtir nirxên cîhanî tên nîşandan. Çîrok bi mirovan re meraqa nirxên cîhanî yên wekî hez, dûristî, rastî, alîkarî, wekhevî, edaletî, şadî, cesaret bûn û biyakirina rê û rêbazên edebê pêk tînin. Her wiha çîrok di armanca ku mirov, serkeftî û

gihiştî be,  parêzerê edaletê be û bizane kêfxweş bibe de ye. Ji ber vê jî di çîrokan de li cem lehengên xwedî taybetmendiyên baş lehêngên xwedî taybetmendiyên nebaş jî cih girtine. Ji rêya taybetmendiyên kesayetî yên lehengan armanc ew e ku xwendevan an jî guhdar, tevgerên erênî û neyînî bizanin.

Curbicuriya di pênaseya nirxan de di senifandina nirxan de jî derdikeve pêşiya me. Nirx ji hin aliyan ve hatine senifandin. Lêkolîneran, nirx ji aliyê siyasî, aborî, civakî, ehlaqî, olî, bedewî û teorîk; hêz, serkeftin, hezperestî, tembîh, arasteya xweserî, gerdûnî, alîkarî, kevneşopiyê ve senifandine. Her wiha nirxên parastinî; Nirxên civakî; Nirxên ji aliyê ehlaqê ve yên qenc û neqenc; nirxên gelemper û taybet jî bûna mijarên senifandina nirxan (Akbaş, 2004: 30).

Wekî me li jor behs kiriye, di senifandina nirxan de rêyeke rêkûpêk nîn e. Em dê di xebata xwe de cih bidine senifandina GUNGOR. Li gor wî ku em ji qadên jîndarên yên di jiyana mirovan de derkevine rê em dê senifandineke wiha bikin:

**a.** Nirxên Estetîk

**b.** Nirxên Teorik

**c.** Nirxên Aborî

**d.** Nirxên Siyasî

**e**. Nirxên Civakî

**f.** Nirxên Olî

**g.** Nirxên Ehlaqî.

Li gor vê senifandinê tişta xwedî aheng û pîvan, daxwaza dinyayeke bedew wekî nirxên estetîk hatine pejirandin. Rastiyên di bin ronahiya zanistê de û ji cehaletê hatîn şûştin jî di bin nirxên teorîk de cih girtine. Her wiha aboriya xweser û daxwaza jiyaneke aram di nav nirxên aborî; daxwaza wekheviyê û tekoşîna azadiyê di nav nirxên siyasî; dostîbûna rastî û alîkariya mirovan di nav nirxên civakî; baweriya exîretê û ji gunehan pakijbûn di nav nirxên olî; negotina derewan û xwedî wijdanî di nav nirxên ehlaqî de hatine senifandin. Hemû kes di jiyana xwe de li gor astekê qiymetê dide van nirxan û li hemberê van tevgerekê nîşan dide. Ji aliyekî ve nirx armanca jiyana me ne; her wiha ne ku bi tenê armanca me ya jiyanê ne; armanca me ya ku hemû mirov vê armancê ji xwe re bikine armanc e jî (Gungor, 2000: 84).

### 3.4 Di Çîrokên Zarokan De Nirxên Civakî

Motîfên çandî yên di çîrokan de jî di perwerdehiyê de cihekî girîng digirin. Çand, kevneşopî, edet û nirxên di nav civakê de tên jiyîn di çîrokan de rasterast xwe nîşan didin. Her wiha ev hêman carinan wekî xala herî balkêş derdikeve pêşiya xwendevan û guhdaran. Ceribandinên di çîrokan de bi gelemperî wekî peyamên ehlaq û nirxên civakî hînbûneke xwezayî pêk tînin.

Nivîsarên edebî yên mîna çîrokan, bi feraseta xwe ya hunerî nirxên civakî li gor rastiya jiyanê şênber dikin. Ev feraset; di geşedana mirovan ya nêrîna bedewî û pejirandina nirxên civakî de roleke girîng digire. Ji ber vê yekê jî perwerdehiya bi çîrokan an jî xwendina çîrokan ji bo geşedana nêrîna bedewî, şênberkirina nirxên çandî, hestyarî û baldariya jiyanê re pir girîng e.

Li gor SEVER, di pêkanîna nirxên kesayetî yên di jiyana rastîn ya mirovan de pirtûkên zarokan peywireke sereke digirin. Her wiha zêdebariya pirtûkên zarokan ya li ser geşedana kesayetê wiha amaje dike: “Pirtûka zarokan, çavkaniyeke ku bersiv û bizavên hunermendan yên li hemberî pirsgirêkên di jiyanê de mînakdanekî dike ye. Ev çavkanî, pêjinekî bi zarokan re çêdike ku zarok dizanin, mirov xwedî taybetmendiyên cûda ne; têkiliyên mirovan û jiyanên di çandên cûda de dide naskirin. Derdora jiyana zarokan fireh dike, dike ku di wan derdorên jiyanê de rastî gelek mînakên hest û ramanên cûda were. Ev çavkanî, hişmendiyekî bi zarokên ku tevgera xwendinê wekî hînbûnekî dipejirînin re naskirina xwe, berawirdiya kesan, dîtina taybetmendiyên bi kesan re yên wek hev û yên cûda pêk tîne” ( Sever, 2010).

Wekî em dibînin nirx, bandorê hem li ser kesayet hem jî li ser hest û kelecanên kesan dike. Her wiha rênîşandanekî liser bijartin û tevgerên kesan dike û rola rêberiyê li ser xwe bar dike. Nirxên di nav demê de ji aliyê civakê ve tên çêkirin, avasaziya civakê pêk tînin û bi guherbariya civakê re ew jî rastî guherbariyekê tên. Ango çawa civak diguhere, guhertina nirxan jî domdar e. Erêniya vê guherbariyê jî li gor hewildanên malbat û saziyên perwerdehiyê an zêde dibin an jî kêm dibin.

Di çîrokan de hemû nirxên civakî kêm zêde cih digirin. Xala girîng ya di vir de ev e; bandora van nirxan ya li ser zarokan çiqas e, an jî di çîrokan de ev nirx li gor nêrîna hunermendiyê çawa hatine xemilandin ku li ser zarokan bandoreke erênî pêk tînin.

### 3.4.1 Hez

Hez, hesteke li ser gelek axaftin tê kirin û li ser gelekî tê sekinandine. Hez, di bin bandora hişyarkerên razber de ji zayînê bi heta mirinê dom dike. Lê belê ji ber ku hez hesteke razber e, çêdibe ku bi hemû kesan re bi awayeke şênber newê dîtin. Wekî zanista derûniyê nîşan dide. Hez di diyarkirina kelecanê de "*tişta ku tê hezkirin*" an jî "*objeya hezê*" karîgeriyeke girîng e.

Hez, ji bo pêwîstiya takekesan ya domdariya jiyana civakî nirxa manewî ya sereke ye. Ji ber ku ji bilî pêwîstiyên takekesan yên giyanwerî pêwîstiya herî girîng hezkirin e. Takekes, bi sedema vê xwe binirx his dike û dilşad dibe.

Ji bo zarokan pejirandina nirxa hezê bi dîtina hezê ya di qadên ew di tê de dijîn ve girêdayî ye. Ku zarok ji derdora xwe hezê bibînin dê hezê jî nas bikin û bipejirînin. Ji ber ku zarok, dema çavên xwe li dinyayê vedikin rastî hewildana naskirina dinyayê tên. Ji ber vê yekê jî hemû tevgerên zarokan yên di derdora wan ya jiyanê de pir girîng in.

Pênaseyeke hezê ya misoger nîn e. Ev rewş jî wê dike dîtbar. Ji ber vê yekê, mirov dikarê li ser hezê gelek nêrînên zanistî bibêje. Ji bo hezê:"Hesta ku berê mirov dide kêfxweşî û pêwendiya tiştekî." (Hançerlioglu, 1992: 417). Pênaseyek tê kirin. Di ferhenga têgehên felsefî de pênaseya hezê wiha hatiye kirin: "Meyila li ser tişteke ku diçe xweşiya mirov; rewşa rih ya digihêje dildariyê.

Cureyên hezê;

**a.** Hezkirina mirovan

**b.** Hezkirina zarokan

**c.** Hestyariyeke bê sedem

**d.** Hezkirina ji dilî

**e.** Hezkirina xwezayê"(Akarsu, 1984: 154).

Her çiqas bi mirovan re bingeha hezkirinê ya ji zayînê hebe jî hemû cure hez ji aliyê derdorê ve ji mirovan re tê veguhestin û hînkirin. Di vê veguhestinê de rola sereke ya malbat, civak, çand, kevneşopî û vegotinên gelêrî ne. Dema ku mirov hezê bi van hêmanan nede zarokan, zarokêndê xwe bê nirx, bê qiymet bibînin û baweriya wan li wan naye.

Potansiyela her mirovan ya hezkirinê heye. Lê belê ev potansiyel tu caran bê hewildanê naye hiskirin. Ev keftûleft naye wateya êş kişandinê. Hez herî baş bi rêya kêfxweşî, aşitî û jiyanê tê hînkirin. Di rastiyê de tirsa tenêtî û neyîna hezê ewqas mezine

ku ev tirs gelek caran mirovan dike êxsîrê xwe. Lewra sedema gelek nexweşiyan bêhezî ye.

Çîrokên ku me lêkolîn li ser wan kiriye de gelek cureyên hezê xwe nîşa me didin. Hezkirina mirov, giyanwerên din û xwezayê di van çîrokan de heza hevpar e.

#### 3.4.1.1 Hezkirina Malbatê

Piştî ku takekes tê dinyayê yekem car çavên xwe li nav endamên malbata xwe vedike. Takekes, di pêvejoya geşedana xwe de hemû mînakên tevgerên perwerdehiyê, ewil ji endamên malbata xwe hîn dibe. Malbateke hembêz germ û tijî hez û aram bondereke erênî li ser tendûristiya rihê zarokan dike. Zarok bi encamên tevgerên xwe dizanê ku malbata wî/wê li cem wî/wê ye û bi vê awayê li xwe ewle dibe.

Çawa nirxa hezê di nav nirxan de wekî nirxa yekem tê pejirandin; di nav nirxa hezê de jî hezkirina malbatê heza yekem e. Ji ber vê yekê jî tevahiya afirandinên mirovan de hez roleke sereke digire û di nav vê hezê de jî hezkirina malbatê her dem xwe dide pêş. Lewra di bernameyên saziyên perwerdehiyê de jî hezkirina malbatê bi awayeke girîng cih digire.

Zarok, şadîk û hêviyên malbatan in. Di çîrokên Kurdan de hin malbatên ji zarokê xwe hez dikin û wan diparêzin hene. Zarok ji bo malbatan xwedî nirxe. Malbat ji bo şadî û qenciya zarokên xwe hemberî gelek zor û zehmetiyan tên.

Kurd jî di baweriya ku malbat hêmaneke girînge de ne, di hemû afirandinên xwe yên gelêrî û çanda xwe de hezkirina malbatê wekî mijareke taybet didin pêş xwe û nîşan didin. Di çîrokên Kurdî de siyaneta dê û bavan, têkiliyeke erênî ya di navbera xwişk û birayan de, biya dê û bavan kirin, kêfxweşiya endamên malbatê ya bi hev re, wekheviya di nav xwişk û birayan de û hwd. di gelek xalan de li ser girîngiya rayên malbatê hatiye rawestan.

Di çîrokan de girîngiya saziya malbatê li holê ye. Her çiqas di çîrokan de yekîtiya malbatê hatibe parastin jî di hin çîrokan de ji bo xwendin, xebat û hin sedemên din an bav an jî zarok ji malbatê dûr ketiye. Mînak, di çîroka “Sê zêr û sê şîret” (Gelêrî) de zilamekî feqîr heye û nû zewiciye. Li gundê xwe nikarê debara xwe bi dest bike. Ji ber ku tu kar li gundê wî nîn in. Ew jî xatirê xwe ji jina xwe dixwazê û diçê welatên biyanî ji bo xebatê û bi salan venagere.

Di gelek çîrokên Kurdî de hezkirina dayîkê li ser hezkirina bavû birayan re ye. Lê belê her çiqas çîrokên bi vê awayê hebin jî her dem hezkirina zarokan li ser wan hezkirinên din e. Zarokên wan çi nêzîk çi dûr di hemû çîrokan de malbat ji zarokên xwe hez dikin. Mîna di çîroka "Pîrê û Mirîşka Wê"(Gelêrî) de jinikeke pîr û mirîşkeke wê heye. Pîrê mirîşka xwe dibe û diçe zozanan. Mirîşka pîrê li zozanan bîst çêlîkan derdixîne. Mirîşk û çêlîkên wê rojekî winda dibin û bi tenê rêdikevin da herin gundê pîrê. Di rê de diçine aşekî û Mam Rovî li wan dibe bela. Vêca mirîşk ji bo her bîst çêlîkên xwe dikeve gelek tevgerên zor û zehmet de. Mirîşk ji hezkirina çêlîkên xwe, ji tekoşîneke dijwar serkeftî derdikeve.

#### 3.4.1.2 Hezkirina Dayîkê

Dayîk perçeyeke malbatê ya herî girîng e. Hezkirina dayîkê ji dil e û bê sedem e. Di tevahiya çîrokên Kurdî yên ku ev mijar di nav honandina wan de cih girtiye de hezkirina dayîkê ji aliyê zarokan ve bê sedem tê hiskirin. Ji ber ku di geşedana pêvejoya zarokan de bandora dayîkê li ser zarokan gelek zêde ye. Her wiha hêza herî girîng ya ku rênîşandinekê didin jiyana zarokan hezkirina dayîkê ye. Raya di navbera dayîk û zarokê de hêj di demên zayînê de dest pê dike û ev ra her û her bi hêz dibe. Zarok jî her dem ji hebûna dayîka xwe kêfxweş dibe û li xwe ewle dibe. Her çiqas di serdema balixbûnê de pêwendiya zarokan li ser hevalên wan jî be dîsa hevala wan ya yekem û domdar dayîk e.

Li gor ramaneke belavbûyî heza herî domdar hezkirina dayîkê ye. Ji ber ku zarok di her temenî de ji bo dayîkê zarok e. Zarok jî di her temenî de pêwîstiya heza dayîkê dike. Ji ber ku heza dayîkê bê hesap û bê sedem e, bi dozîndarî ye. Heza dayîkê ji berî hemû tiştan hezeke rastîn e.

#### 3.4.1.3 Hezkirina Bavî

Di geşedana zarokan de bav jî herî kêm mîna dayîkê girîng e. Bi taybetî bav di mînak girtinê de ji bo kurikan cihekî taybet digire. Ji bo zarokan dayîk çiqas nîşana heza bêdawî û dilovaniyê ye, bav jî ji bo wan nîşana desthilatdarî, hêz û parastinê ye.

Hezkirina bavî piştî hezkirina dayîkê rû dide. Ji ber ku têkiliya dayîk û zarokan ji pêşiya zayînê dest pê dike û heta temenên ewil jî ev têkilî bi tenê di navbera her duyan de bi awayeke xurt didome. Her çiqas di vê rewşê de heza zarokan ya bavê wan diyar

nebe jî piştî temenên ewil ku dema zarok hinekî ketine di tevgerên xweser de hingî hezkirina wan ya bavî bi awayeke diyar rû dide.

Piştî zayînê, bi geşedana zarokan ya giyanwerî ve geşedana wan ya hestyarî jî hêdî hêdî rêya xwe diguhere. Dema zarok tê li ser rûyê dinyayê pêwîstiya wî/wê ya pêwendî û xwarin û vexwarinê hemû ji aliyê dayîkê ve tê pêkanîn. Ev rewş jî girêdana wan ya bi hev re xurtir dike. Sal derbas dibin û bav cihê dayîkê digire. Lê belê tu caran heza dayîk û bavî nabe yek, cûdahiya wan hezan ji rastiya wan ya xwezayî tê (Fromm, 1994: 12).

Di civaka Kurdan de her çiqas bav di roleke girîng de be jî di çîrokên Kurdan de wekî dayîkê cih negirtiye. Bav kesê ku dixebite û pereyan bi dest dixeye, debara malbata xwe pêk tîneye. Di çîrokên ku dayîk wekî jîndareke pîroz hatiye pêşkêş kirin, bav fîgûrekî gelekî kêm maye. Her wiha di hin çîrokan de xwendekar an jî guhdaran rastî xayîntiya bavî jî tên. Ji bo mînak, di çîroka "Çildîtin"ê (Gelêrî) de Bavê Ehmed Çelebî mîr e. Di navbera wan de hezeke diyar heye. Tu pirsgirêkan wan nîn in û her du jî ji hev hez dikin. Lê demek tê û her du jî ji *"Çildîtinê"* hez dikin. Ehmed Çelebî diçe ji bo xwe Çildîtinê direvîne lê bavê wî bi sêhr û hileyan kar dike ku kurê xwe ango Ehmed Çelebî bikuje û Çildîtinê ji wî bistîne. Ji bo hezkirina Çildîtinê hezkirina di navbera bav û kur de diguhere dijminatiyê.

Di çîrokên Kurdan de hezkirina dayîkê lê pêş jî be, di gelek çîrokan de di hin beşan de hezkirina bav jî cih digire.

#### 3.4.1.4 Hezkirina Xwişk û Birayan

Hezek jî ya di nav malbatê de zarok rastî wê tê heye. Ev hez ya xwişk û birayan e. Têkildariya zarok ya bi xwişk û birayan re hem geşedanên erênî hem jî yên neyînî pêk tîne. Hezkirina xwişk û birayan di nav cureyên hezê de ji hezên herî berfireh e. Her wiha ev hez ji asta geşedana dawî ya zarokan hesteke civakî ya girîng e. Di vê hezê de jî peywira herî girîng ya dê û bavan e. Dema zarok his dike ku hez bi xwişk û birayên wî/wê re tê parvekirin hingî an dê ji xwişk û birayên xwe hez bike an jî dê ji wan nefret bike. Ev her du helwest jî li gor tevgerên dê û bavan bi zarokan re çêdibin.

Zarok; alîkarî, parvekirin û yekîtiyê yekemcar di nav jiyana malbata xwe de hîn dibê. Di vê jiyanê de ku yek ji aliyê temen û serdemên geşedanê ve hebe ew zarok çêtir

li xwe ewle dibe. Ji bo tenêtî û pêwîstiya xwe ya lîstikê pêk bîne bi xwişk û birayên re dilehîze; ji ber ku xwişk û bira, hevalê zarokan yên yekem in.

Heza xwişk û birayan wekî rûaliyekê pêwîstiya bihevrebûnê ya din tê nirxandin. Ev hez bi zarokan re ewil wekî zikreşiyekî rû dide û di navbera her du zarokan de ku gelek temen hebin ev hest hinek din kûrtir dibe. Di demê de bi rêya tevgerên dê û bavan heza di navbera zarokan de tê parvekirin û geşedana zarokan ya hestyarî parseng dibe. Ku malbat di vê rewşê de bi tevgerên xwe vînekî nedin pêşandan berê zarokan dê bikeve narsizm û lixwebûnê. Her wiha di serdemên din de zarok dê ji kesekî û civakê hez nakin (Sonmez, 2003: 48).

Di çîrokên Kurdî de heza xwişk û birayen heye. Lê belê vê hezê jî wekî heza bavî gelekî bi girîngî cih negirtiye.

**3.4.1.5 Hezkirina Xwezayê**

Heza xwezayê, hezeke li hemberê bûyerên di barîgehiyê de diqewimin ecibandina kesan zêde û li hemberê wan xweşikbûnan de siyaneta mirovan zêde dike ye. Xala bingehîn ya heza xwezayê nêrîn û dîtin e.

Heza xwezayê ya herî xweşik, mirov hem di xwezayê xwe de hem jî di berhemên edebî de dibîne. Ji ber ku heza xwezayê ji bo geşedana zarokan ya hestyarî girîng e. Heza xwezayê û hişmendiya parastina xwezayê bi hev ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê hem di berhemên folklorîk hem jî yên nûjen de heza xwezayê bi âwayeke baldar cih girtiye.

Ku em li çîrokên cîhanê û yên Kurdan binêrin em dibînin ku di nav taybetmendiyên wan ya herî girîng de heza xwezayê heye. Di berhemên helbestvan, nivîskar, wênesaz, wênekêş, hozan, peykertraş û hunermendên din de jî qêrîn û rawestînên wan yên li hemberê xwezayê nirxeke balkêş e. Xweserî û veşartîbûna xwezayê her dem bala hunermendan kêşandiye û gelek caran raman, hestyarî û helwestên xwe bi rêya heza xwezayê pêşkêş kirine. Hunermendên ku ji heza xwezayê kêm mayîn jî di gêra jiyanê de winda bûne û hatine jibîrkirin.

Mirov ne desthilatdarê xwezayê ye, beravajî perçeyeke wê ye. Ji ber vê yekê di çîrokan de siyaneta xwezayê ji aliyê lehengên çîrokan ve hatiye girtin. Mîna; di çîroka “Sê Zêr û Sê Şîret” de şîreta sêyemîn: “Tu caran li ber derava an jî çeman ranaze û avahiyan çêneke” ye. Di vê şîretê de peyama girîng siyaneta xwezayê ye.

### 3.4.1.6 Hezkirina Ajalan

Li ser rûyê dinyayê jîndar tenê ne mirov in. Ji beşek yên di dinyayê de bi mirovan re jiyana xwe didomînin ajal in. Ji ber ku ajal di jiyanê de ji gelek aliyan alîkariya mirovan dikin û pêwîstiya wan ji bo jiyanê gelekî girîng e. Di vê xalê de divê mirov jî ji wan hez bikin û wan biparêzin. Peywireke mirovan ya xwezayî jî ev e. Ev peywir jî ji hezkirina ajalan dest pê dike. Heza ajalan ji aliyê civakan ve jî berpirsiyariyeke herî girîng e. Mirovekî empatîk, xwedî nêrînên cûda û xwedî têkiliyên bi tendûristî bi rêya hezkirina ajalan pêk tê. Bi vê rêyê heza ajalan nêrînên zarokan yên dinyayê dewlemend dike.

Zarok, bi rêya çîrokan ji bilî ajalên kedî yên berî jî nas dikin û di navbera van ajalan de danberhevan dikin. Bi vê awayê hînbûnên zarokan hinekî din şênber dibin. Taybetmendiyeke din jî di gelek çîrokan de ajal wekî hevalên mirovan hatine nirxandin. Zarok, bi vê rêyê nirxên hînbûyî yên mîna hevaltî, dostîbûn, alîkarî û parvekirinê jî xurt dikin. Ji ber ku zarok di her çîrokê de lehengan mînak digirin. Mînak, di çîroka “Serpêhatiya Hesp û Kerê ” (Xamo, 2014: 55-56) de zilamekî hespek heye û ew gelekî ji hespê hez dike. Ew her roj hespê xwe baş qeşawî û timar dike. Xwarina wî baş dide. Loma jî hesp gelekî kêfxweş û liserxwe ye.Di vê çîrokê de peyam, hezkirina ajalan e.

Di armanca hînkirina heza ajalan de dibe ku koma herî girîng zarok bin. Ajal di jiyana zarokan de cihekî girîng digire û bandora ajalan li ser geşedana zarokan ya hestyarî gelek e. Ajal rastiya hezkirinê nîşa zarokan dikin. Zarok gelek caran heza ku di dilê wan de weşartî mayî bi rêya heza ajalan kifş dikin.

Di derdora heza zarokan ya ajalan ji kitik, se, kîvroşk û çûkan pêk tê. Ev ajal bi taybetmendiyên xwe yên kedîbûnê bi zarokan re hevaltiyê dikin. Ji zarokan re rêya hezkirinê vedikin û carinan cihê hevalên wan carinan jî cihê dê û bavê wan digirin. Ev tişt bêhtir di çîrokan de xwe diyar dike. Ji ber ku zarok, tu caran ji guhdarkirina çîrokan nawestin û her divin lehengê wan çîrokan ew bin.

Di çîrokên Kurdî de her çiqas heza ajalan li pêş jî be ajal bi gelek taybetmendiyên xwe yên erênî û neyînî cih digirin. Mînak; Rovî çiqas “Mam Rovî” jî be di gelek çîrokan de qurnaz û hîleker e, hakeza gur wisa ye. Bizin her dem şîrker û dilovan e. Mar xayîn û bêbawer e. Se, ji bo xwedanê xwe gelek baş e û hwd. Zarok bi

rêya van taybetmendiyên ajalan hem hezkirina ajalan hem jî naveroka gelek nirxên din hîn dibin.

### 3.4.1.7 Hezkirina Dibistanê

Dibistan, tevdîrên peyikan ku di tevgerên zarokan de guherbariyan çêdikinin. Li ser dibistanan di hêmanên bi bandor hene. Ev; perwerdehî û hîndarî ne. Divê ev her du hêman bi hev re lihevkirî bin. Di perwerdehiya zarokan de piştî malbatê ya herî bi bandor dibistan in. Zarok nirxên ku di malbatê de hînbûyî di dibistanê de bi pêş ve dibe.

Ji bo zarokên di destpêka dibistanê de dibistan wiha tê pênase kirin:"Ji bo zarokekî/ê dibistan, derdoreke civakî ya ku xwedî rê û rêbaz û peywirên hînbûnê û fersenda hevnasînê ya bi gelek kesên nû re ye." (Yavuzer, 2004: 86).

Perwerdehî tevgere bi heta dawiya jiyana mirovan dom dike ye. Her wiha perwerdehî di hin serdeman de di dibistanan de pêk tê. Zarok di dibistanê de li gel hezkirin û siyanetê gelek ceribandinên din yên di jiyana wî/wê de pêwîst in, bi dest dixe. Ji ber vê yekê hestên zarokan yên li hemberî dibistanê gelekî girîng in. Ev hest bandorê li ser kesayet, pîşe û tevahiya jiyana wî/wê dikin. Ji ber ku dibistan ji bo zarokan tenê ne cihê hînbûna waneyan e. Zarok li dibistanan gelek nirxen cîvakî dibine û hîn dibe.

Zarok bi rêya xwendin û têgihiştina tiştên nû heza xwe ya dibistanê xurt dikin. Di vir de rola çîrokan derdikeve holê. Lewre, zarok bêhtir ji xwendina çîrokan hez dikin. Çîrok çiqas baldar bin xwendin jî ewqas bi zarokan şêrîn dibe. Ku di çîrokan de peyama hezkirina dibistanê jî were honandin hingî zarok jî ji dibistanê jî hez bikin. Leheng xwendekar bin zarok jî xwendekaran mînak bigirin.

Di çîrokên gelêrî de heme heme qet behsa dibistanê nayê kirin lê belê di çîrokên zarokan yên nûjen de dibistan cih digire. Dibe ku ev tişt ji bo ku, dibistan di serdemên berê de wekî saziyên serbixwe nehatibin pejirandin. Lewre em dizanin ku di serdemên berê de perwerdehî di mizgeft an jî medreseyen da pêk dihat. Dibe ku ji ber vê be jî di gelek çîrokan de ji dêla lehengên mamoste bêhtir lehengên mîna, mela, qazî, qadî hatine bikaranîn.

### 3.4.1.8 Hezkirina Welêt / Welatparêzî

Welatparêzî di ferhengê de wekî; "Hezkirina axa welêt û mirovên civakê ye."(www.tdk.gov.tr) hatiye pênase kirin.Welatparêzî mîna nirxên civakî yên din di jiyana mirovan de cihekî girîng digire.

Welat, ji bo mirovan ji wateya perçeyekî axê zêdetir e. Welat; axa ku mirov li ser çandeke hevpar ava dike ye. Ji kesên ku heman erd, kevneşopî û çandê parve dikin re welat mal e. Lewre welat bi qedir û taybet e.

Divê takekes hestên xwe yên civakî bi hev re parve bikin. Ji van hestên civakî yek jî hezkirina welêt e. Di çanda Kurdan de welat cihekî pir girîng digire. Ji ber vê yekê hînkirina heza welêt ji bo zarokan pir girîng e.

Heza welêt bi xwe re hesta fedekariyê jî tîne. Lewre heza welêt bi vî aliyê xwe ve ji hezên din cûda dibe. Bingeha vê hezê di nav malbatê de tê danîn û bi rêya derdora civakî jî geş dibe. Derdora civakî ji bo şênberkirina welêt bi bandor e. Ji ber vê yekê ji bo hezkirina welêt divê zarok ji xwe re mînakên erênî wekî model bigire. Di vir de jî dîsa çîrok derdikevine pêş. Çîrok di hezkirina welêt de li ser zarokan gelekî bi bandor in. Her wiha di serdema leheng model standinê de çîrok bandoreke mezin li ser zarokan dikin. Zarok lehengên welatparêz ji xwe re mînak distînin.

Di çîrokên bi nirxa welatparêziyê hatine honandin de xala bingehîn hezkirina welêt û veguhastina nirxên neteweyî yên hevpar in.

### 3.4.2 Hevaltî

Di destpêka hestên ku di navberan mirovan de girêkên xurt dihonênê; hez tê. Ev nirx li gor rewş û geşbûna xwe li ser her mirovan dirûveke xweser distîne. Rastiyeke din jî zarok ji bilî hezkirina dê û bavan, pêwîstiya heza bi hevalên xwe re dibîne.

Hevaltî, di pêvejoya geşedana zarokan de cihekî girîng digire. Hevaltî di geşedana civakî ya zarokan de alîkariyeke sereke dike. Zarok, di nav civakê de pêwîstiya hevaltiya hevsalên xwe dike. Zarok vê pêwîstiya xwe ewil ji xwişk û birayên xwe dihilîne. Di temenên pêş de jî bi kesên ji malbatê cûda re dikeve têkiliyê de û hevaltiya wî/wê ya civakî dest pê dike.

Her çiqas hevaltî û dostîbûn di nirxên wekî hev tên dîtin jî ev her du nirx di bingeha xwe de ne yek tişt in. Dostîbûn di navbera du kesên şertên wan wek hev de rû dide. Di navbera dostan de cûdahiya temen, pozîsyon, derdor, çand û hwd. hebe,

dostîbûna wan gelekî dom nake. Di navbera zarokan de jî dostîbûneke bingehîn pêk naye. Kelecanên di navbera wan de tîr in, lê belê ne domdarin. Ji ber ku geşedana zarokan ya hişmendî hêj bi awayeke rast nerûniştiye. Di vê xalê de mînaka herî zelal guherbariya komahevalan ya zarokan e. Di serdema zaroktiyê ya yekemîn de zarok zû dibine heval û dîsa zû dev ji hevalên xwe berdidin, an jî wan zû ji bîr dikin. Di serdema dibistana seretayî de hevaltî, ji dibistanên pêş û salên pêş de jî merhaleya dostîbûnê heye (Govsa 1998: 94-97).

Di çîrokên zarokan de heke ku leheng ne mirovên mezin, jîndarên derasayî û ajal bin, hemû leheng ji zarokan pêk tên. Ev tişt jî ji bo çîrokên zarokan asayî ye. Di çîrokan de lehengên zarok tu caran tenêtî nekişandiye. Her car an zarok, an kesekê mezin, an ajalek an jî jîndarek bûye hevalê lehengê çîrokê. Ango di çîrokên zarokan de girêke hevaltiyê ya di navbera zarokan de gelekî xurt e.

### 3.4.3 Aşitî

Aşitî, ji bo çareserkirina pirsgirêkan ya di navbera mirovan, siyaneta dadweriyê û mafên mirovan e. Bêguman di nav vê têgehê de siyaneta jiyan û rûmeta mirovan û jidûrketina pêşbiryaran jî hene (Harris û Morrison, 2003: 12).

Her wiha di aşitiyê de têkiliyên erênî hene. Aşitî, di nav civakên bi hev re dixebitin û di têkiliyên xwe de siyaneta cûdahiyên hev digirin de geş dibe (Matthews, 2002: 29).

Nirxa aşitiyê di rêkûpêkirina civakê û hevsenga barîgehiyê de ji nirxên herî girîng e. Ji ber vê yekê di perwerdehî û geşedana zarokan de cihekî girîng digire. Ev nirx ji bilî pirtûkên zarokan yên dibistanê, di çîrokan de jî gelek hatiye bikaranîn. Di çîrokan de aşitiya di navbera heval û ajalan de bi awayeke ku zarok jê fam bikin hatiye honandin.

### 3.4.4 Dadwerî û Wekhevî

Têgîna dadweriyê di ferhengê dewekî: “lihevkirina maf û hiqûqê, rastî, nêrîna mafê ye.” (www.tdk.gov.tr) tê pênase kirin. Em ji van pênaseyan rêbikevin, em dikarin bibêjin, ne kêm ne jî zêde bikaranîna mafê ya ji encama xebatê hatî bidestxistin e.Dadwerî, sûdwergirtina derfetên wekhev ya mirovan, rewşa ku mirov rastî yek kiryariyê tên û rewşa gihiştina encamên wekhev e (Cevizci, 2010: 211).

Em dibînin ku li cihê ku dadwerî lê hebe aram e, cihê ku dadwerî lê ne be jî aloz û bê aram e. Ne ku di bawerî an jî di çandekî de li hemû cîhanê dadwerî xwedî girîngiyeke mezin e. Loma nirxeke barîgehî ye. Di rêkûpêkirina jiyana civakê de ji bo zarokan hînkirina nirxa dadweriyê girîng e. Ji ber ku dadwerî têgeheke razber e. Dibe ku têgihiştina wê ji bo zarokan dijwar be. Di vir de jî dîsa çîrok derdikevin holê. Lewre di şênberkirina nirxên civakî de ji bilî ceribandinan, rola sereke ya çîrokan e. Çîrok bi rêya bûyeran, nirxên razber yên wateya wan hinekî dijwar li ber zarokan bi awayeke derasayî dike şênber. Di çîrokan de, bi gelemperî nirxa dadweriyê bi rêya desthilatdarên mîna padîşax, mîr, beg, qadî, mele û hwd. xwe wekî mijarekê nîşan didin. Zarok bi têkiliyên di navbera van û gel de hînî nirxa dadweriyê dibin.

### 3.4.5 Bêrîkirin

Bêrîkirin, xwestina dîtinê an jî gihiştina kesekî an jî tiştekî ye. Mirov bêriya kesê ku jê hez dike, girîng dibînedike. Bêrîkirin, ji hesta mirovan ya herî bîngehîn e. Dema ku mirov bêriya kesekî dike bê aram û bê kêfxweşî dibe. Mirov di jiyana xwe de teqezî bêriya an kesekî an jî tiştekî dike.

Di çîrokên zarokan de tê dîtin ku lehengên çîrokan bêriya endamên malbatê, heval, mal, gund, bajar, rojên berê û ajalan dikin. Di çîrokan de tê dîtin ku bêrîkirin carinan mirovan kamil carinan jî bê kêf dike. Di çîrokan de bêrîkirin carinan bi hesta xemgînî jî derdikeve holê. Lewre di hin çîrokan de bêrîkirina lehengan heta dawiya temenê wan dom dike.

### 3.4.6 Berpirsiyarî

Berpirsiyarî, pejirandina encamên bûyeran yên ku mirov bi vîna xwe pêk tîneye (www.tdk.gov.tr). Mirov di jiyana xwe de carinan dikevine di bin gelek berpirsiyariyan de. Em di çîrokan de dibînin ku gelek mînakên vê rewşê hene. Carinan leheng berpirsiyariyê jîndarekî ne carinan jî berpirsiyariyên wî/wê yên ji afirandinê bala mirov dikişînin.

Berbirsiyarî, tevgerên takekesan yên li gor merhale, wijdan û peywirên xwe bi cih tîneye. Ku takekes di nav civakê de peywirên xwe bi cih bîne ew dê bi siyanet be ku neyîne cih, civak dê wî/wê ji xwe dûr bixe. Divê berpirsiyariya zarokan ne ji ber desthilatdariya endamên malbatê be. Ev tişt ne rast e. Divê ewil zarok xwe wekî

takekesekî/ê his bikin. Wekî em dizanin ku hemû nirx ewil di nav malbatê de tên hînkirin. Nirxa berpirsiyariyê jî ewil di malbatê de bi zarokan re çêdibe. Ji ber vê yekê divê dinyaya xeyalan ya zarokan ji aliyê dê û bavan ve baş were zanîn. Divê zarok rastî astengiyên berpirsiyariyê neyên. Lewre, divê dê û bav hin peywirên ku zarok karibe berpirsiyariya wan pêk bînin, bidin wan.

### 3.4.7 Alîkarî

Ku mirov xwe nexe di cihê yên li hemberê xwe, dê nizanibe pêwîstiya wan bi çi heye. Lewre, alîkarî bi têgihiştina kesên li hemberî mirov dest pê dike. Em dikarin bibêjin alîkarî binbeşa qenciyê ye. Ji ber ku alîkariya kesên pêwîst wekî qenciyê tê hesab kirin. Alîkarî mirov kêfxweş dike. Alîkarî wekî hesta şadiyê barîgehî ye. Ji ber vê yekê di hemû civakan de wekî dilpakiyeke mezin tê pejirandin.

Civak ji kesan, qencî û alîkariyê dixwaze. Kes zarok jî be mezin jî be, her dem divê di tevgera qenciyê de be. Ev hêvî ji civakan hemûyan re pêwîst e. Lewre ji alîkariyê yekîtiya civakê pêk tê. Girîngiya alîkariyê hatiye zanîn ku di hemû serdeman de ev nirx bi zarokan tê hînkirin.

Di tevahiya çîrokên zarokan de alîkarî an jî qencî hatiye parvekirin. Lewre di bingeha çîrokan li ser qenciyê hatiye avakirin. Kesên ku alîkariyê bikin ji wê alîkariyê kêfxweş bibin dê wê tevgera xwe bidomînin. Ev çerxa ku xwe di çîrokan de nîşan dide ji bo cih girtina alîkariyê ya bi zarokan re gelekî girîng e.

Di çîrokên zarokan de lehengên alîkariya heval, nexweşan, ajalan, mûhaciran, zarokan, mezinan, pîran, xizanan, rênçberan, yên di bin zilmê de mayîn dikin diderkevine pêş. Di çîrokan de carinan hin alîkarî bêsûd hatine kirin, hin jî bisûd hatine kirin. Di çîrokên zarokan de alîkarbûn bi hemû lehengan re şadî pêk aniye.

### 3.4.8 Rastî û Dûristî

Di ferhengê de wekî; "Tevgere rast, lihevhatina dadwerî û ramana bi rastiyê re." (www.tdk.gov.tr) hatiye şîrovekirin. Nirxa dûristiyê di jiyana me de cihekî pir girîng digire. Lewre divê di têkiliyên mirovan de ewlehî hebe ev tişt jî rasterast bi dûristiyê ve girêdayiye. Di piraniya ferhengan de têgehên rastî û dûristiyê bi hev re hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê jî me her du têgîn bi hev re bi kar anîn.

Têgînên rastî û dûristiyê di rewşên wekî mirov ji bo kesekî xirab ne fikre û di demên zordariyê de jî dev ji rastiyê bernede tê bikaranîn. Dûristî ji fezîletên serdest yên mirovan e. Di dûristiyê de jêdûrketina derew û durûtiyan heye. Her wiha rastî û dûristî bingeha ewlehiyê ye.

Divê hînkirina wan her du nirxan ji temenên biçûk were destpêkirin. Divê nebaşiya derewan ji zarokan re were gotin. Divê xirabiya hîlebaziyê bi zarokan were hîn kirin. Divê zarok zanibin ku encama rastî û dûristiyê her dem erênî ye. Wekî hemû nirxan divê bingeha van nirxan jî hêj biçûktayiyê de were avêtin.

Nirxên rastî û dûristiyê têgehên piralî ne. Di gotin û tevgeran de zelaliyê, li hemberê bûyeran de jî di tevgeran de erenî û çêkeriyê divê. Ji bo kesên ku divin bi derdora xwe bi xwe re aş bin pêşmerc e.

Di çîrokên zarokan de lehengên sereke ji aliyê rastî û dûristiyê ve tîmsalên dûristiyê ne. Lehengên sereke her dem rastiyê dibêjin û di dûv rastiyê de ne. Sozên ku dane, tînin cih û niyeta başiyê li ser xirabiyê bi kar nayenin. Dema ku leheng karên li ser rastî û dûristiyên dikin dilê wan aram e. Lê ku di tevgereke xirab de bin dilê wan ne aram e û di hesta poşmaniyê de ne. Ji ber vê yekê tu car ji ser rêya rastiyê dernakevin.

### 3.4.9 Hestyarî / Empatî

Hestyarî, asta balkêşandinê ya kesekî ya li derdora xwe ye. Di ferhengê de wekî; “Kesê xwe ji aliyê hest û ramanan ve bike di cihê kesê li hemberî xwe de ye.” (www.tdk.gov.tr). Di têkilî û danûstandinên mirovan de hestyarî ango empatî roleke sereke digire. Ji bo têkiliyeke baş û jiyana civakî ya baş, ramana hestyarî pir girîng e. Ji ber ku takekes dixwazin ku civak wan biecibîne û ji wan hez bike. Di vê xalê de têkilî bi takekesekî/ê ramana hestyarî pêk nayene. Lewre, ji bo dostîbûn û têkiliyên takekesan divê raman û hisên beranber hebin.

Hestyarî di zarokanre hêza hindûr pêk tîne. Hestyarî di biryardanan de alîkariya bijêrtinên rast dike. Ji ber vê yekê hebûna vê nirxê dibe sedema gelek tevgerên erênî. Zarokên xwedî hestyarî di têkiliyên xwe yên malbat û hevalan de encamên erênî bi dest dixin. Lewre, armanca çîrokan ya weşartî nirxa hestyarîyê ye. Zarok gelek caran bi rêya lehengan rastî nirxa hestyariyê tên û hînî rewşên ji xwe dûr dibin.

### 3.4.10 Dilovanî

Dilovanî, nirxeke xwezayî ye û ji bingeha mirovahiyê tê. Dibe ku hesta mirovan ya herî kûr dilovanî be. Di ferhengê de wateya dilovaniyê wiha hatiye pênase kirin: “Xemgînî an jî dilsotina ji bo rewşa xirab ya kesekî” (www.tdk.gov.tr). Takekes bi qasî wijdana xwe dilovan e. Takekesê dilovan bi rehm e, xusarê li tu kesan nake. berevajî ji bo kesên ku ketîn di zor û zehmetiyan de xemgîn dibe. Dilovanî hêj di temênên biçûk de di dilê zarokan de cih digire ji ber ku dilovana herî mezin dayîk e. Zarok, yekem car bi alîkariya dayika xwe rastî hesta dilovaniyê tên. Her wiha di çîrokan de jî dilovanên herî mezin her dem dayîk in.

### 3.4.11 Xweşbînî

Di civakê de dibe ku herî zêde pêwîstiya kesan bi nirxa xweşbîniyê hebe. Xweşbînî di ferhengê de wekî; “Di hemberê hemû tiştan de rewşa aram ango rewşa xweş dîtina tevgeren; tolerans, mûsamaha.” (www.tdk.gov.tr)yê hatiye şîrove kirin. Ku em li vê şîroveya xweşbîniyê binerin em dibînin ku di têkiliyên mirovan de hebûna xweşbîniyê çiqas girîng e.

Nirxa xweşbîniyê hem di çand û kevneşopiya civaka me de hem jî di perwerdehiya fermî û folklorîk de cih digire. Ji ber vê yekê jî di berhemên edebî de jî cih girtiye. Xweşbînî jî wekî nirxên din hêj di temenên biçûk de bi zarokan tê hîn kirin. Lewre di çîrokên zarokan de ev nirx wekî peyameke gelemperî di hemû çîrokan de xwe nîşan dide.

### 3.4.12 Piştevanî

Têgîna piştevaniyê di ferhengê de bi wateya; “Girêdana li ser sûdên hevpar, hest û ramana hevpar ya di avakirina komekî de” (www.tdk.gov.tr) hatiye şîrove kirin. Nirxa piştevaniyê her çiqas ji takekesan derdike ve jî di tevgerê de civakê nîşan dide. Ji bo hebûna takekesan ya di nava civakê de li gor hebûna nirxa piştevaniyê ye. Di nav civakekê de nirxa piştevaniyê çiqas geş be ew civak dê bêhtir bi pêş de biçe. Lewre piştevanî, rêyê ji bo têkiliyên baş, komên armancên wan hevpar û yekîtiyeke xweşik alîkariyeke xwezayî dike.

Di jiyana civakî de hin berpirsiyariyên takekesan hene yek ji van berpirsiyariyan jî piştevanî ye. Di piştevaniyê de ji bo armanceke hevpar pêwîstî bi keda takekesan heye. Her takekes ji bo sûda komê an jî civakê divê kedkar be. Di vê kedê de; hez,

dostîbûn, alîkarî, dilovanî, hêvî, serkeftin û hwd. gelek nirxên din jî hene. Takekes ne ji bo sûdeke taybetî kedê dikin, armanca wan sûdeke civakî ye û ji bo hemû kesan e. Sûda piştevaniyê ya girîngiyeke din jî, takekes xwe tenê his nakin û xwe di kom an jî civakê de bi nirx dibînin.

### 3.4.13 Mêvanperwerî

Mêvanperwerî ji taybetmendiyeke girîng ya civaka Kurdan e. Di dîroka Kurdan de gotinên, "Mêvanê Xwedê", "Odeya mêvanan" û "Mêvanê şevê" girîngiya vê nirxê didine ber çavan. Dibe ku di çanda Kurdan de taybetmendiyaherî balkêş mêvanperwerî be. Mêvan ji bo civaka Kurd gelekî bi qedr û qiymet in. Ji ber ku baweriya ku "*Mêvan mêvanê Xwedê ye*" di nav civakê de wekî rê û rêbazeke dilxwaziyê ye.

Di çîrokan de ev nirxa ku ji berên bingehîn yên civakê ye jî gelekî cih girtiye. Heme heme di hemû çîrokan de hin leheng li mala hin lehengên din dibine mêvan. Di hemû mêvaniyan de jî ji bo mêvanan qedir tê girtin.

### 3.4.14 Xîret û Biryardarî

Xîret, tê wateya; girêdana bi peywira xwe ve an jî hewildana ji bo karekî (Yurtbaşı, 2012:121).

Xîret, vîna ji bo rakirina astengiyên li pêşiya karekî ye (www.tdk.gov.tr). Biryardarî, hêza berxwedanê ya li hemberî zor û zehmetiyan û vîna pêkanîna karekî ye. Bi zarokan re hebûna vê nirxê ji bo coşî û lixwebaweriya wan pir girîng e. Zarok bi zayîna xwe re her dem di nav geşedanekê de ye. Bi taybetî di serdema xwendinê de ev nirx pir girîng dibe. Zarok di dibistanê de rastî gelek hîndariyan tê û di dikeve hewildaneke têgihiştinê de. Dema ku zarok li hemberî van hîndariyan ser bikeve ev tişt zarokan di jiyanê de bêhtir motîve dike.

Zarok ji bo bidestxistina hevalan, ketina çavên mamosteyan û teqdîrkirina malbatên, her dem di nav hewildanekê de ye. Ji bo gihiştina dûndaneke zîrek, jêhatî û bi vîn hebûna vê nirxê bi girîngî pêwîst e.

Xîret û biryardarî di xebateke de ji bo rakirina astengiyan hêmana herî girîng e. Ji ber vê yekê divê zarok li hemberê rewşên jiyanê zanibin çi bikin. Di vir de jî dîsa bar li ser milê malbat, mamoste û berhemên zarokan e. Lewre çîrok ji li derekî di hînkirinê de cihê malbat û mamosteyan digirin.

### 3.4.15 Meraqa Zanyarî

Meraq, ji bo zarokan sedema domandina xwendina berheman e. Ji ber vê yekê di berhemên zarokan de divê bi teqez, hêmana meraqê cih bigire. Berhemên xwedî hêmana meraqê, bandora balê û domdariya berhemê zêde dike û bi vê awayê bi zarokan re hezkirina xwendinê jî zêde dibe. Her wiha berhemên ji aliya mijarê ve xwedî hêmana meraqê di vê qadê de bêhtir serkeftî ne.

Di berheman de carinan hêmana meraqê dibe sedema tiştên xirab jî, lê ku xwendevan û guhdar berê xwe bide tevahiya mijarê,ji bingeha wê bûyerê meraqa leheng derdikeve. Divê armanca berhemên zarokan meraqa zanyarî be. Zanyarî bi kurtasî bi hiş ve rêketin an jî yekirina raman, hiş û mantiqê ye (Sonmez, 2013). Ji bo hînkirineke bingehîn hebûna meraqa zanyarî di destpêka hînkirinê de roleke sereke digire. Ji ber ku mirov bi meraqa zanyarî ji bo civak û cîhanê afirandin û dahênan pêk tînin. Ji bo zarokan ji têgeha meraqa zanyariyê armanc; di hînkirinê de ji rêberiya zanistê sûd wergirtin e.

### 3.4.16 Lixwebawerî

Di ferhengê de; “Siyaneta mirov ya dide xwe, heysiyet, nirxa siyaneta bîngehîn e.” (www.tdk.gov.tr). Takekesên ev nirx bi wan re heyî, kesên dizanin çi dixwazin, xwedî siyanet û ji bo jiyanê xwedî nêrîneke zelal in. Serkeftinên mezin bi lixwebaweriyê tên destpêkirin. Ku mirov li xwe ne bawer be, ne dikare ser bikeve ne dikare karê destpêkirî xilas bike ne jî dikare di nav civakê de vîna gotinekê nîşan bide. Kesên ku lixwebawer di jiyanê de rastî çi astengiyê werin jî her dem li gor armanca xwe bi ser dikevin.

Ji bo zarok biryarên rizgar bidin û xwe bi awayeke rast bidin têgihiştin; karibin bibin berpirsiyarê tiştekî an jî kesekî/ê divê hêz û jêhatinên xwe zanibin. Di vir de jî dîsa rola çîrokan girîng e. Ji ber ku zarok dema lehengên lixwebawer wekî mînak bigirin ji bo cesareta wan ya di jiyana rasteqîn de ev mînak standin dê ji wan re alîkar be.

### 3.4.17 Sebir / Xweragirî

Sebir, dilpakiya li hemberê rewşên xirab yên wekî êş, bêheqî, mirin û hwd. rawestan an jî bêdeng mayîn e (www.tdk.gov.tr). Nirxa sebirê, di tevehiya xalên jiyana

me de cih digire û her wiha di jiyana me ya civakî de jî girîngiya wê domdar e. Hebûna vê nirxê, kontrolkirina têkiliyên me yên bi mirovan re û ji bo rewşên xirab bandoreke neyinî li me neke, pir pêwîst e. Jiyan bi tevahiya xwe hewildanek e û mirov di vê hewildanê de bi alîkariya sebirê bi ser dikeve. Di jiyanê de mirovên xwedî vîn û sebir digihêjin armanca xwe.

Em dikarin bibêjin sebir li ser derûniya mirovan jî bandoreke erênî dike. Lewre li hemberî zor û zehmetiyan ku ji destê takakesan tiştek neyê, sebir bi takekasan re qayîmiyeke derûnî pêk tîne. Di jiyanê de hin jiyandinên civakî yên hêsan û dijwar hene. Li vir jî tişta girîng ev e; takekes li hemberî van xwedî hewildan, cesaret û sebir bin e.

Takekes li hemberî zor û zehmetiyan çiqas bi sebir be, dê xwe ji wan zor û zehmetiyan ewqas bi xusareke hindik xilas bike. Ji ber vê yekê di pêvejoya hewildana jiyanê de divê zarok ev nirx bi dest xistibe. Her çiqas sebir pêvajoyeke zehmet jî be divê zarok xwedî hêvî bin û hêviyên wan newin şikestin. Di vê xalê de berhemên zarokan jî divê li gel nirxa sebirê cih bidine hêviyan. Ji ber ku sebir û hêvî du nirxên wekî goşt û neynûkê ne. Yek bê yekî bêwate ye. Divê zarok jî di hişmendiya vê de bin û zanibin ku sebirê bikişînin dê hêviyên wan pêk werin. Her wiha ku hemû daxwazên zarokan di demeke zû de pêk werin zarokên xwe di navenda dinyayê de his bikin, encamê vê rewşê jî dê nebaş bibe. Divê zarok girîngiya demê hîn bibin û hînê nirxa sebirê bibin.

### 3.4.18 Cesaret

Cesaret, bêtirsiya li dijî rewş an jî karekî ye. Cesaret bidiliyê û lixwebaweriyê dixwaze. Ji ber vê sedemê mirov, di her mijarê de bi cesaret nabe. Mirov, di baweriya serdestiyê ya kar an jî rewşekê de cesareta xwe nîşan dike. Zarokên lixwebawer, bi cesaret in û xwe bi awayeke serdest didine fam kirin. Ji ber vê jî hebûna vê nirxê ji bo geşedana zarokan ya civakî û hestyarî gelekî girîng e.

Takekes bi nirxa cesaretê li dijî rewşên diltîrsî tê. Ew Takekesên ku ev nirx bi wan re heyî di nav civakê de jî cihekî bi siyanet digirin. Ji ber vê yekê jî divê ev nirx bi berheman jî were hîn kirin. Takekes di temenên biçûk de hin nirxan bi dest dixe û kesayeta xwe pêk tîne. Avakirina kesayetê di malbatê de dest pê dike û di jiyanê de bi gelek hêmanan xwe temam dike. Di vê pêvajoyê de divê takekes bi tevgerên xwe ve newe rexne kirin. Lewra bi takekes re tirsa civakî dê çêbibe. Ev rewş jî dê bibe sedema bêcesaretiyê.

Di çîrokên zarokan de em dibînin gelemperiya çîrokan de leheng bicesaret û lixwebawer in. Di gelek çîrokan de leheng bi pîrhefokan, dêw, ajalên hov û hwd. re hewildanê dikin. Her wiha di van çîrokan de armanca hewildanê jî rizgar kirina, malbat, heval, xwişk û bira, civak û hwd. in. Di hemû çîrokên ku lehengên wan bi cesaret in de lehengan sûd ji vê nirxê wergirtiye. Tu leheng nîn in ku ji ber cesareta xwe xusiriye.

### 3.4.19 Siyanet

Nirxa siyanetê di ferhengê de; "Hesta hezê ya ku dibe sedema mirov qedirê kesekî an jî tiştekî digire ye." (www.tdk.gov.tr). Bi vê pênaseyê mirov bi vê nirxê di civakê de cihekî erênî digire û bi derdora xwe ya civakî re têkiliyên baş ava dike.

Ev nirxa ku di hemû civakan de xwedî cihekî pir girîng e. Siyanet, di jiyana zarokan de jî cihekî girîng digire. Hebûna vê nirxê di geşedanên zarokan yên hestyarî de bandoreke erênî pêk tîne. Ji ber vê yekê di hemû materyalên hînbûnê yên zarokan de ev nirx bi avayeke hûrgilî hatiye bikaranîn.

### 3.4.20 Pîroz Kirin

Pîroz kirin ji bo hemû takekesan girîng e. Her wiha ecibandin û pîroz kirin ji bo zarokan jî nirxên pir girîng in. Lewre serdemên ewil di geşedana zarokan de bandora pîroz kirinê gelekî li ser hînbûnên zarokan heye. Zarok di encama tevgerên xwe de ji malbat û derdora xwe pesendê dixwazin. Ev ji bo zarokan hêviyeke rûmetî ye. Ji gihiştina xwe ya kesayetî û lixwebaweriyê zarok pêwîstiya pîroz kirinê dikin.

Zarok hesta pîroz kirinê yekem car di nav malbatê de tam dike. Dema ku tevgerên xwe pêk tîne di hêviya pesenda endamên malbata xwe ye. Ev pesend carinan ji pîroz kirin carinan bi rewşeke aborî carinan jî rewşeke manewî pêk te. Tişta di vir de girîng ne ku pîroz kirina bi heyber an jî gotinekê ye; tişta girîng zarok xwe bi nirx his bike û xwe wekî takekesekî/ê bibîne ye.

### 3.4.21 Paqijî û Tendûrîstî

Ji bo tendûristiyê hêmana herî girîng paqijî ye. Ji ber vê yekê hînkirina paqijiyê hêj di temenên biçûk de bi zarokan tê hîn kirin. Her çiqas paqijî ne tişteke teorîk jî be di bikaranîna paqijiyê ya di berhemên zarokan de ji bo mînak girtinê ango model standinê di hînkirinê de roleke girîng digire. Her wiha bi taybetî, di temenê model standinê de

lehengên çîrokan bêhtir bandorê li ser zarokan dikin. Lewma bikaranîna nirxa paqijiyê ya di berhemên zarokan de ji bo perwerdehiya paqijî û tendûristiyê gelek encamên erênî pêk tîne.

Paqijî di çîrokande ne wekî peyemeke sereke hatiye honandin. Lê belê di gelek çîrokan de, di nava bûyeran de derbas bûye. Paqijî bi gelemperî li derdora jiyana lehengên çîrokê diqewime.

### 3.4.22 Nirxên Neteweyî

Ûrf û edetên civakê çanda civakê pêk tînin. Her civakek bi kevneşopiyên wekî; xwarin û vexwarin, cil û berg, dîlan, şîn, cejn, rojên pîroz, serdan, jiyana rojane û hwd. taybetmendiyên xwe kifş dike. Ji bo hişmendiyeke neteweyî zanîn û bikaranîna kevneşopiyê gelekî girîng e. Takekesên di vê hişmendiyê de bi veguhestina van nirxan pêk tê. Her wiha ji nirxên barîgehî jî merhaleya yekem nirxên neteweyî ne.

Di pêşveçûna civakê de pêwîstî bi zarokên welatparêz; ji civak û mirovahiyê peywirdar heye. Ev pêwîstî jî bi hînkirina nirxên neteweyî tê cih. Di vê xalê de jî dîsa berhemên zarokan roleke girîng digirin li ser xwe.

Di hemû çîrokên zarokan de nirxên neteweyî cih girtine; ji ber ku çîrok gelêrî ne. Di tevahiya bûyerên çîrokan de ev nirx xwe bi awayeke berfireh nîşan didin.

## 3.5 Hin Mijarên Din

### 3.5.1 Dîrok

Hînkirina dîrokê jî bi qasî nivîsandina dîrokê girîng e. Ji bo hişmendiya dîrokê berhemên zarokan gelekî girîng in. Lewre di çîrokan de ji bilî nirxên manewî dîroka civakan jî heye. Hem çîrokbêj hem jî nivîskar ne mûmkun eku nivîsareke kevneşopî bê dîrokê neqiş bike. Dîrok di hemû nivîsên gelêrî de hinekî veşartî jî be ji nav bûyerên çîrokan bêhna dîroka civakê tê.

Ji bo hişmendiya neteweyî, zanîna dîrokê girîng e. Bingeha hişmendiyê jî di temenên biçûk de bi takekesan re çêdibe. Di vê xalê de ji bilî malbat û dibistanê di hînkirina dîrokê de rola herî girîng li ser berhemên zarokan e. Xaleke din jî; zarok bi alîkariya berhemên gelêrî yên wekî destan, çîrok, vegotinên gelêrî û hwd. dîroka civaka xwe bi kêfwxeşî hîn dibin.

### 3.5.2 Bawerî

Bawerî pêwîstiyeke manewî ye. Takekes di jiyana xwe de ewil li gor nirxên ji malbata xwe piştre ji nirxên hevalên xwe û dawiyê de jî ji nirxên derdora xwe hîn bûyî rêyeke baweriyê awa dike. Di vê rêyê de takekes nirxên li gor xwe dipejirîne û yên ne li gor xwe jî napejirîne. Lê belê bingeha baweriya xwe, di zaroktiya xwe de ava dike. Hêzbûna vê bingehê di destê malbatan de ye, bes geşedana wê hem bi hişmendiya takekes hem jî bi alîkariya berhemên zarokan e.

Di serdeme zaroktiyê de zarok bi tenê heza Xwedê di dilê xwe de bihemîne û hinekî jî di dinyaya xwe ya hindûr de cih bide tirsa Xwedê, ev reaksiyonê di geşedana wî/wê ya olê dê pêkhatinên erênî pêk bînin (Albayrak, 2006: 400). Lê belê, divê di nav hez û tirsê de hevsengek hebe. Lewre dibe ku hezkirin ji tirsê an jî tirs ji hezkirinê be. Di vir de tişta ku di baweriyê de rast divê tirs ji hezkirinê be. Dema ku hezkirina Xwedê bi vê bingehê were hînkirin dê geşedana zarok ya hestyarî û derûnî baş pêşve biçe.

Di berhemên zarokan de jî bi gelemperî çîrokan de pêkanîna baweriyê ya bi zarokan re li ser hezkirinê ye. Lehengên bawermend her dem tiştê baş dikin û dema dikevin tengasiyê de jî Xweda alîkariya wan dike. Leheng jî bi dûayên xwe hezkirina xwe nîşanî Xwedê dikin. Her wiha li piraniya herêman, di çîrokên Kurdan de daxwaz bi dûayên ji bo Xwedê dawî dibin. Mînak; "*Çîroka me çû deştê dê û bavên me çûn behiştê*", "*Rehm li dê û bavê guhdaran*" û hwd. Ji van mînakan diyar e ku bawerî di civaka Kurdan de nirxeke pir girîng e. Lewra ji bo veguhestina baweriyê di hemû berhemên zarokan de vê nirxê bi baldarî cih girtiye.

### 3.5.3 Keftelefta Jiyanê

Dema ku em zarokan ji bo jiyanê amade dikin divê em her dem minakên jiyana baş nedin wan ji ber ku ev hêza zarokan hewildana wan ya bi jiyanê re kêm dike. Divê zarok li gel minakên jiyanê yên baş rastî mînakên zor û zehmet jî werin. Lewre jiyan di tevahiya xwe de xweşî û nexweşiyê dihemîne. Takekes hêj biçûk hişmendiya vê rastiyê zanibe dê jiyana xwe de pengavên lixwebawertir biavêje.

Çîrok ji bo vê hişmendiyê gelek mînakên curbicur didin zarokan. Zarok bi alîkariya çîrokan hemû dûrivên jiyanê nas dikin û hişmendiyeke jiyîna jiyanê bi wan re çêdibe. Di çîroka "Pepûk" (Gelerî) de zarok, rastî zehmetiyên jiyanê tê û sêwîtî hesteke çawa ye dibîne. Her wiha di çîroka "Şengê û Pengê" (Gelerî) de li gel sefîtî û safîtiya

Şengê û Pengê rastî dilhişkî û çavbirçîbûna hirçê jî tê. Em dikarin bi hezaran mînakên wiha bidin, lewre çîrok, ji bo naskirin û hînkirina jiyanê bi hemû awayan jiyandinan dide ber çavên xwendevan û gudaran.

### 3.5.4 Hêza Xeyalkirinê

Zarok, tiştên dibînin, dibîhisin û dixwînin di xeyala xwe de bi awaya zindîkirinê şîrove dikin. Ji ber vê yekê jî dinyaya xeyalan ya zarokan pir firehe. Zarokên hêza wan ya xeyalê bi pêş de be, hêza wan ya afirandin û ramana azad jî bi pêş de ye. Ev taybetî kesên lixwebawer, afirîner û ji aliyê hizrê ve rizgar diderxîne li pêş me. Ji ber vê yekê di hînkirina zarokan de berhemên bi hêmanên xeyalî ji bo geşedana zarokan ya zihnî pir girîng e.

Dema ku behsa xeyalê were kirin, em dizanin ku berhema sereke çîrok e. Çîrok ji dinyaya xeyalê ya zarokan kaniya ava wê herî xweş e. Zarok, dikarin bi saetan ji wê kaniyê avê vexwin û li derdora kaniyê bilîzin.

Çêdibe ku zarok carinan dinyaya rastîn û xeyalî ji hev cûda neke. Lê belê di temenên pêş de ev tişt jî dê ji holê rabe û xeyalperestiya zarokan dê ji wan re bibe dewlemendiyeke afirandinê.

### 3.5.5 Hînbûnî

Hînbûnî ew tevgerên ku takekes her dem nîşan didin e. Çêdibe ku hin van hînbûniyan erênî hin jî neyînî bin. Armanca civak û li gel wê ya perwerdehiyê hînbûniyên erênî ne. Ji ber vê yekê civakê jî li ser hînbûniyên erênî ango nirxan berhem afirandine. Civak dizane ku ji bo hînbûniyên erênî pêwîstiya zarokan ji bilî malbat û dibistanê bi hin tiştên din jî heye. Di vir de dîsa çîrok derdikevin holê. Zarok gelek tevgerên erênî bi rêya lehengên çîrokan bi dest dixin. Zarok bi rêya minak giritinê tevgerên lehengên çîrokan wekî hînbûniyan ji xwe re digirin.

Ji ber ku di bingeha çîrokan de veguhestina peyamên erênî hene; çîrok ji bo hînbûniyên erênî jî dibe amûra hêzê. Zarok gelek caran hînbûniyên xwe li gor lehengên çîroka diguherin an jî qayîmtir dikin.

### 3.5.6 Hişmendiya Zimên

Hînbûna zimanê zikmakî hînbûna çanda civakê ye. Dema mirov ji amûrên veguhestinê yên çandê bimîne dê ji hînbûna hişmendiya civakê jî bimîne. Ziman ji bo bidestxistina vê hişmendiyê hêmana herî pêwîst e.

Ji bo geşedana zimên ya zarokan ji bilî pêwendî û hewildanên malbat, mamoste û derdorê; afirandinên nivîskî yên ji bo zarokan jî roleke pir girîng dilîzin. Lewre berhemên nivîskî yên zarokan, zêdebariyeke erênî li geşedana zarokan ya zihnî, hestyarî û zimên dikin. Her wiha ev berhem bi zarokan re hişmendî û hestyariyê jî pêk tînin.

"Bi zimanê çîrokê zimanê zikmakî wekî amûra di destê karkerekî de çawa tê bikaranîn yekem car bi wî/wê dide hînkirin, hin hunerên çîrokê; çalakî, dewlemendî û bedewîyê yekem car bi wî/wê nîşan dide, hesta ku ji yên zimanê wî neaxive dûr dike û yê bi zimanê wî/wê diaxive nêzîk dike yekem car bi wî/wê re çêdike çîrok e." (Boratav, 1998: 14).Ji ber vê yekê dema ku em zarokan bi zimên hîn dikin û hişmendiya zimên didin wan divê em dêhndar bin. Divê em materyala rast, watedar û bi ewqasî kêfxweş bi kar bînin.

Çîrok ji bo geşedana zimên ya zarokan alîkar e. Di derbarê çîrokê de axaftin, pirs kirin û dramatizasyon jêhatîbûna zarokan ya guhdar kirin û vegotinê bi pêş ve dibe. Di geşedana hêza raman û xeyalê, çêja zewqa zimên, bikaranîna taybetmendiyên zimên de gelek fonksiyonên girîng yê çîrokê hene.

Zarok hêj di dergûşê de hînî zimên dibin. Ev hînbûna zimên di heman demê de hînbûna çandê jî ye. Hêj zarok di dergûşê de bi lorîn û çîrokên guhdar dikin rastî parçeyeke çanda xwe tên. Çîrokên di vê demê te ji zarokan re tên gotin peyvên di axaftina wan de diyar dikin û xizîneya peyvên wan dewlemend dikin. Zarok bi rêya van berhaman hêj ji xwe haş nemayîhînî avasaziya hevokên zimanê xwe yê zikmakî dibin. Her wiha hêdî hêdî rê û rêbazên zimanê xwe hîn dibin. Bi encama van hînbûnan jî zarok dê di temenê xwe yên pêş de zimanê xwe bi awayeke rêkûpêk bi kar bîne û takekesekê/î xwedî hişmendiya zimên û bigihe.

Çîrok, dirûvê zimên yên herî xwezayî nîşa me dikin. Di çîrokan de hêmanên zimên yên mîna; vegotinên dawerî, hevokên nerast, biwêj û gotinên pêşiyan û hwd. bi aramiya zimanê axaftinê tê veguhestin. Di vê rewşê de, fonksiyona çîrokê ya di perwerdehiya zimên de zêdetir dibe. Serdestiya çîrokbêj ya li ser zimanê çîrokê, jêhatîbûna wî/wê ya bikaranîna biwêj, gotinên pêşiyan û gotinên xweş, berê guhdaran

dide hînbûna zimên. Di wê wateyê de em dikarin bibêjin çîrok, ji bo komên hemû temenan hîndariyeke xwezayî, balkêş û bêhempa ye.

### 3.5.7 Wêje /Edebiyat

Zarok, jîndarekî di dinyaya xwe de dijî û bi çavekî cûda li dinyayê dinêre ye. Dereke ku zarok bi alîkariya xeyalên xwe neçiyê û tişteke ku neke nîn e. Ji bo ku em nirxên dixwazin bi hînî zarokan bikin divê em berhemên bandorê li ser dinyaya wan dikin deynin li ber wan. Bi taybetî çîrok ji wan berheman e. Lewre di geşedana zarokan de rola edebiyatê pir girîng e. Ji ber ku edebiyat dema dinyaya zarokan pêşkêşî wan dike, bi zimanê wan diaxive û hestên wan parve dike û ji bo zarokan zêdebariyên erênî pêk tîne. Bêguman, edebiyat bi tenê hin tevger û nirxên diyar nade zarokan, di heman demê de kêfa zarokan jî tîne. Ji ber vê yekê armanca berhemên edebî ne bi tenê perwerdehî ye. Her wiha berhemên edebî bi zarokan re hişmendî û nêrîneke hunerî ya edebiyatê jî pêk tîne. Her çiqas ev armanc hinekî neyekser jî be zarok pêre pêre bi hunera edebiyatê re hevnasinekî pêk tînin.

Edebiyata zarokan nexasim çîrok, di navbera paşeroj û pêşerojê de mina pirê ye. Di bingeha çîrokan de vegotinên devkî û di domahîka wê de jî vegotinên nivîskî hene. Ji ber ku çîrok ji gotinên pêşiyan yên ji paşiyan re gotine, pêk tên. Ango di naveroka çîrokê de hêmanên çanda devkî hene ku ev hêman bingeha edebiyatê pêk tîne. Zarok jî bi saya çîrokê bingeha edebiyata civaka xwe nas dike û hîn dibe.

### 3.5.8 Naskirina Kesayetan

Têkiliyên mirovan yên bi nirxên civakê û kesên din re kesayetê pêk tîne. Kesayet, nirxa ku civak li kesan bar dike ye û li gor şertên derdorê diyar dibe. Hevrengiya di nav tevger û şertên girîng yên di navbera civak û kesan de bandorê li ser kesayetê dike.

Her malbat, dibistan an jî civak dixwaze ku mirovên qenc bi kesayeteke erênî bigihîn. Em dikarin bibêjin armanca civakan ya sereke jî ev e. Ji ber ku kesên ji aliyê kesayetê ve qenc, ne ji bo xwe tenê ji bo civakê jî bingeha aramî û şadbûnê ne. Ji bo pêkanîna vê armancê jî pêwîstî bi veguhestina nirxên çandî yên civakê heye. Kesayet li gor veguhestina van nirxan dirûv digire û geşedana kesayetê bi awayeke erênî pêk tê.

Ji bo kesayetê veguhestina nirxên civakî bi gelek rêyên sereke pêk tên. Mina; malbat, derdor, dibistan, mamoste, heval, afirandinên edebî û hwd. gelek hêmanên din di vê armancê de roleke sereke dilîzin. Lê belê di vir de rola afirandinên edebî li gor wan hêmanên din hinekî berfirehtir e. Lewre, berhemên edebî ji aliyê gihiştin û belavbûnê ve xwedî derfetên xweser in. Ev berhem bi rêya nivîs û vegotinê digihêjin gelek kesan û bandorê li ser wan dikin. Her wiha zarok bi alîkariya berhemên edebî danberhevdana kesayetan dikin û ev jî ji bo têgihiştin û diyarkirina kesayetan ramaneke erênî pêk tîne.

Di nav berhemên edebî de jî bo zarokan berhemên ji aliyê kesayetan ve têr û tijî jî çîrok in. Zarok, di çîrokan de rastî gelek kesayetên curbicur tên. Derfeta çîrokan ya herî girîng di warê kesayetan de ev e ku; çîrok bi rêya hemû heyber û jîndaran dirûvên kesayetan didine ber çavên zarokan e. Kesayet, carinan wekî ajalek; kevok, bizin, çûk, se, hesp... Carinan wekî heyberek; neynik, keştî, şûr, dîwan... Carinan wekî heyberên derasayî; dêw, cin, melayîket, sêrbaz... Carinan jî wekî jîndarek; dar, gul, kulîlk û hwd. xwe nîşan didin.

Dema zarok çîrokan dixwînin an jî li wan guhdar dikin. Di nav dinyaya çîrokan ya xeyalî de rastî tiştên baş û nebaş, kesayetên qenc û xirab tên. Her wiha ji bilî van kesayetên bingehîn rastî gelek cûreyên kesayetan tên û zarok ji xwe re kesayetên taybetmendiyên wan erênî mînak digirin. Ev jî ji bo rûniştandina kesayeta zarokan geşedana erênî pêk tîne.

### 3.5.9 Naskirina Cih û Waran

Di çîrokan de cih û war, dem û dîrok hêmaneke bi hêz e. Lê belê di piraniya çîrokan de cih û war, dem û dîrok nediyar e. Piraniya çîrokan ji bûyerên di demên borî de derbas dibin hatine honandin. Her çiqas ev taybetmendiyeke çîrokan be jî dîsa jî xwendevan û guhdar bi rêya çîrokan taybetmendiyên cih û warên welatê xwe nas dikin. Ev naskirin çiqas gelemperî jî be ji bo zarokên di temenên biçûk de ji aliyê hînbûna erdnîgariyê ve roleke erênî pêk tîne.

Zarok bi saya çîrokan; çem, çiya, dol, newal, deşt, şkeft, welat, gund, bajar, daristan, qesr, xan û hwd. gelek tiştên din nas dikin û cûdahiyên wan ji he hev cûda dikin. Ji aliyê naskirina cih û waran ve xaleke din jî; zarok, gelek agahiyên di derbarê herêmên welatê xwe de jî ji çîrokan werdigirin. Lewre çîrok ji herêmekî derdikeve lê

belê li gelek herêm û welêtan belav dibe. Zarok jî bi saya vê taybetiya çîrokê di derbarê herêmên ku tu car nedîtî û neçûyiyê de xwedî agahî dibe. Ev hînbûnî bi rêyeke be rasterast bi zarokan re hestyariyeke neteweyî jî pêk tîne.

### 3.5.10 Lîstik

Lîstîk, ji pêwîstiyeke takekesan ya zaroktiyê ye û ji bo geşedana wan ya zihnî, derûnî û hestyarî gelekî girîng e. Lîstik, rêbaza ceribandinên hînkirinê ne ku tu kes bi mijaran nikare vê pêk bîne (Yavuzer, 2004: 176 - 177).Her wiha lîstik, gelemperî bi vîna rizgar ya zarokan bi awayeke xwezayî derdikeve holê. Zarok dema dilîzin di derbarê dinya û derdora xwe de gelek agahî û hunerweriyan hîn dibin. Ji bilî vê lîstik, di hinkirina rê û rêbaz, berpirsiyarî, peyanerî, hevkarî, siyanetê û biryardanê de jî roleke girîng dilihîze.

Di nav lîstikê de çêdibe ku zarok carinan bi hevalên xwe re bikeve nîqaşê de. Zarok bi vê rêyê çareserkirina pirsgirêkan hîn dibe. Çêdibe ku carinan bibe serokê lîstikê û carinan jî ji lîstikê were dûr xistin; zarok bi vê rêyê jî ceribandinên jiyanê nas dike.

Çîrok jî li derekî ji bo zarokan lîstik e. Zarok di nav wê dinyaya xeyalî de bi seatan dijiyin. Ew bi xwe jî dikevine di nav bûyeran de û dibine lehengên çîrokê. Li gel lehengan bi ajal û heyberan re diaxivin û dema xwe bi wan re diborînin.

## ENCAM

Edebiyata zarokan, ji dawiya sedsala 19an û pê de wekî mijareke girîng hatiye dîtin. Pêşveçûnên di zanistên derûnî û yên din de nêrîna têgeha "*zarok*"ê guhertiye û pêwîstiya lêkolînên li ser perwerdehiya zarokan derketiye holê. Wekî em dizanin ku fonksiyona edebiyatê ya perwerdehiyê jî heye, lêkolînên edebiyata zarokan jî li ser vê rêyê ne. Dema ku ji aliyê lêkolîner û nivîskaran ve kêmasiya edebiyata zarokan hatiye dîtin di derbarê vê cûreyê de gelek berhem û lêklîn hatine kirin. Lewre edebiyata zarokan jî wekî cureyeke serbixwe di nav dîroka edebiyatê de cih girtiye.

Dema çerçoveya edebiyata zarokan ji aliyê lêkolîner, nivîskar û pedegogan ve hatiye diyar kirin, hêmanên edebiyata zarokan jî bi awayeke giştî di nav edebiyatê de cih girtine. Em dikarin bibêjin di nav van hêmanan de ya herî nêzî dinyaya zarokan çîrok in. Lewre çîrok, pêwîstiya jiyana zarokan ya xeyalî tîne cih û wan ji bo jiyana rastîn amade dike.

Çîrok berhemeke edebî ye ku dikare bikeve dinyaya hûndirê zarokan. Lehengên çîrokê, şêwaza bûyeran; biwêj, zûgotinok û vegotinên gelêrî hêj zarok pê nehasayî dikevine hişê zarokan de. Mirov dimeyzêne ku zarok di lîstikan de wan gotinên nû hînbûyî bi kar tîne. Çîrokbêj jî her dem bi rêya çîrokan nirxên mîna sebir, qencî, alîkarî, hevaltî, hezkirin û hwd. bi zarokan didine hiskirin. Zarok bi saya çîrokan hêza xwe ya nîqaşê bi pêş ve dibin. Dijberiyên di navbera nirxên qencî-neqencî, rastî-xeletî, feqîrî-dewlemendî, şadî-xemgînî û hwd. de nas dike û li gor hest û ramanên xwe xwedî

fikreke xweser dibe. Ji ber vê yekê çîrok di serî de ji bo geşedana zimên û di pey de ji bo geşedanên din pir girîng e.

Ji vegotinên gelêrî çîrok, di jiyana zarokan de xwedî cihekî pir girîng e. Lewre çîrok, bangê li rih û dinyaya xeyalî ya zarokan dike. Bi awayeke giştî pêwîstiya zarokan bi çîrokê heye. Zarok, jiyandinên di jiyana xwe ya rojane de nikaribin pêk bînin bi alîkariya vegotinên gelêrî nexasim bi çîrokan dijiyîn. Zarok bi rêya xeyalkirinê vê pêwîstiya xwe bi cih tînin.

Çîrok zêdebariyekê li geşedana zarokan ya zimên û hişmendiyê dikin. Zarokên di temenên pêşdibistanê de guhdariyê li çîrokan dikin hînî têkiliyên di navbera bûyeran dibin. Encaman ji van bûyeran derdixin û xwedî ramanên xweser dibin. Xwendina çîrokan ya ji bo zarokên di vî temenî de ji bo geşedana wan gelek baş e. Ji ber ku zarokên di van temenan de her roj hînî tiştên nû dibin û çîrok berê hînbûnên wan dide rastî û qenciyê. Her wiha zarok bi vê sayê hem ji bo xwe hem jî ji bo civakê wekî takekesên kêrdar dê geşedana xwe bi rê ve bibin.

Li gor van agahiyan, sûdên bikaranîna çîrokan ya di nav edebiyata zarokan de em dikarin bi awayeke giştî wiha rêz bikin;

- Çîrok ji bo geşedana zimanê zikmakî roleke girîng dilîze.
- Zarok bi rêya çîrokan hînî çand û kevneşopiyan xwe dibin û bi vê awayê nirxên neteweyî jî nas dikin.
- Çîrok ji bo hînkirina nirxên civakî û barîgehî alîkariyeke yekser didin zarokan.
- Çîrok ji bo naskirina xwe û kesayetên din honandin û mînakên dewlemend didin zarokan.
- Çîrok bi rêya senaryoyên curbicur zarokan ji bo jiyana rastîn amade dikin û jiyandinên mezinan hêj di temenê biçûk de didin ber wan.
- Zarok bi rêya lehengên çîrokan hemû mînakên kesayetan nas dikin û yên baş ji xwe re mînak digirin. Lewre lehengên sereke her dem rolmodelê zarokan e.
- Zarok bi saya çîrokan hem derdora xwe hem jî derên ku tu caran nebîne jî nas dikin. Ev jî çanda gelemperî ya wan bi pêşve dibe.
- Zarok bi xwendin ûguhdarkirina çîrokan nêrina bedewî û zewka edebiyatê bi dest dixin. Ev bidestxistin di temenên pêş de jî ji bo derketina aliyê wan yê hunerî girîng e.

Di dawiyê de di bin ronahiya van agahiyên li jor me dayîn de, çîrok dewlemendiya jiyana zarokan e; hesta bedewiyê ya zarokan geş dikin; ji bo naskirina xwe û ya derdora xwe alîkar in. Çîrok hezkirina jiyanê didin zarokan, paceyeke hêviya qenciyê ji wan re vedikin. Hestyariya sebirê di pêşberê zor û zehmetiyên jiyanê de didin zarokan. Lewre, divê em ji bîr nekin ku çîrok ji pêwîstiyên zarokan derketine holê.

## ÇAVKANÎ

### Pirtûk

Akarsu, B. (1984). *Felsefe Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Pirtûkxaneya İnkılap.

Albayrak, N. (2004). *Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü*. İstanbul: WeşanênLM, Çapa 1.

Alptekin, A. Berat (2002). *Taşeli Masalları*. Ankara: Weşanên Akçağ.

Aslan, E. (2001). *Çıldırlı Aşık Şenliği*. Diyarbakir:WeşanênDicle Üniversitesi Eğitim Fakültesi.

Bilgin, İ. (1995). *Çanakkale İçinde Vurdular Beni*. İstanbul: Weşanên Erdem.

Bilkan, A. Fuat. (2009). *Masal Estetiği*. İstanbul: Weşanên Timaş.

Bolay, S. Hayri (2007). *Aşkın Değerler Buhranı.* Recep Kaymakcan ve Diğerleri (Ed.). *Değerler ve Eğitimi İçinde*. İstanbul: Weşanên Değerler Eğitim Merkezi.

Boratav, P. Naili (2014). *Halk Hikayesi Ve Halk. Hikayeciliği*. İstanbul: WeşanênTarih Vakfı Yurt.

________ (2008). *Az Gittik Uz Gittik*. Ankara: Weşanxaneya İmge.

________ (1998). *Zaman Zaman İçinde.*İstanbul: Weşanên Adam.

________ (1988).*100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. İstanbul: Weşanxaneya Gerçek.

________ (1982). *Folklor ve Edebiyat-1*. İstanbul: Weşanên Adam.

Bozdağ, F. (2000). *Çocuk Kitaplarında Metin Dil ve Resimleme İlişkisi*. Ankara: 1. Ulusal Çocuk Kitapları Sempozyumu Sorunlar ve Çözüm Yolları.

Cemiloğlu, M. (2003). *Türk Dili ve Edebiyatı Öğretimi.* Ankara:Weşanên Alfa.

Cevizci, A. (2010). *Eğitim Sözlüğü*. İstanbul: Weşanên Say.

Cindî, H. û E. Evdal. (2008). *Folklora Kurmanca*. Stenbol: Weşanên Avesta,Çapa 1.

Devellioğlu, F. (2000). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügatı.* Ankara: Weşanên Aydın Kitabevi. Çapa 17.

Dilidüzgün, S. (1996). *Çağdaş Çocuk Yazını*. İstanbul: Weşana Yapı Kredi.

________ (2007). *Masallar ve Masalsı Türler*. Eskişehir: Weşanên Anadolu Üniversitesi Açoköğretim Fakültesi.

Doğan, D. Mehmet (2008). *Büyük Türkçe Sözlük*. İstanbul: Weşanên Pınar.

Dökmen Ü. (2000). *Evrenle Uyumlaşma Sürecinde Varolmak, Gelişmek ve Uzlaşmak.* İstanbul: Weşanên Sistem.

Elçin, Ş. (1993). *Türk Halk Edebiyatı'na Giriş*. Ankara: Weşanên Akçağ.

Farqînî, Z. (2012). *Kurdî-Tirkî Ferheng*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê. Çapa 6.

Feyzioğlu, Y. (2007). *Masallar çocuklar için neden gereklidir?* S. Sever (Ed.), II. Ulusal Çocuk ve Gençlik Edebiyatı Sempozyum Bildiri Kitabı. Ankara: Çapxaneya Ankara Üniversitesi.

Fromm, E. (1994). *Sevme Sanatı*, (Çeviren: Yurdanur Salman). İstanbul: Weşanên Payel.

Gövsa, İ. A. (1998). *Çocukta Duygusal Gelişim*. İstanbul: Weşanên Hayat.

Güleç, H. (1988). *Halk Edebiyatı*. İstanbul: Weşanên Çizgi Kitabevi.

Güleryüz, H. (2003). *Yaratıcı Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Weşanên Pegem.

Güneş, F. (2000). *Çocuk Kitaplarının Okunabilirlik Ölçütleri Açısındanİncelenmesi*, I. Ulusal Çocuk Kitapları Sempozyumu. Ankara: Weşanên Ankara Üniversitesi.

Güngör, E. (2000). *Değerler Psikolojisi Üzerinde Araştırmalar*. İstanbul: Weşanên Ötüken.

Gürel, Z., Temizyürek, F. ve Şahbaz, N. K. (2007). *Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Weşanên Öncü Kitap.

Hançerlioğlu, O. (1992). *Türk Dili Sözlüğü*. İstanbul: Pirtûkxaneya Remzi.

Harrıs, I. M. ve Morrıson, Mary L. (2003). *Peace Education.* 2. Edition, North Carolina, USA: Mcfarland Company Publishers.

Jiyan, A. (2005). *Ziman û Jiyan*. Stenbol: Weşanên Perî. Çapa 1.

Kaplan, M. (2009). *Türk Edebiyatı Üzerine Araştırmalar Tip Tahlilleri*. İstanbul: Weşanên Dergâh.

________ (1998). *Kültür ve Dil.* İstanbul:Weşanên Dergah.

Karatay, H. (2011). Kuramdan Uygulamaya Çocuk Edebiyatı El Kitabı. (Editör: T. Şimşek). Ankara: Weşanên Grafiker.

Kaya, D. (2007). Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü. Ankara: Weşanên Akçağ.

Kaya, D. (2007). Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü. Ankara: Weşanên Akçağ.

Kıbrıs, İ. (2010). Çocuk Edebiyatı ( 4. baskı). Ankara: Weşanên Kök.

________ (2000). *Uygulamalı Çocuk Edebiyatı.* Ankara: Weşanên Eylül.

Matthews, I. (2002). Peace With Me, Non-Violent Conflict Resolution in and out-of-School. Paris: UNESCO.

Nas, R. (2004).)Örneklerle Çocuk Edebiyatı.1. Bursa: Weşanên Ezgi Kitabevi, Çapa 2.

Neydim N. (2000). Çocuk ve Edebiyat/ Çocukluğun Kısa Tarihi/ Edebiyatta Çocuk Figürleri. İstanbul: Weşanên Bu.

Oğuz, M. Öcal (2010). Türk Halk Edebiyatı El Kitabı. Ankara: Weşanên Grafiker, Çapa 7.

Oğuzkan, A. Ferhan (2000). Yerli ve Yabancı Yazarlardan Örneklerle Çocuk Edebiyatı. Ankara: Weşanên Ani.

________ (2010). *Çocuk Edebiyatı.* Ankara: Weşanên Ani, Çapa 9.

Özçelik, M. (2004). Afyonkarahisar Masallari. Isparta: Pirtûkxaneya Fakûlte.

Özdemir, E. (2002). Eleştirel Okum. Ankara:Weşanxaneya Bilgi.

Özünel, Ş. Ç. (2000). Çocuk kitaplarındaki görsel anlatımın eğitimdeki yeri. S. Sever (Ed.). I. UlusalÇocuk Kitapları Sempozyumu Bildiri Metinleri. Ankara: Weşanên Pegem.

Pertev, R. (2009). Zarok û Çîrok. Stenbol: Weşanxaneya Doz. Çapa 1.

Propp, V. (1998). Folklor: Teori ve Tarih. N. Hasgül, T. Tanyel (wer.) İstanbul: Weşanxaneya Avesta, Çapa 1.

Resûl, Î. M. (2010). Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî. Hewlêr: Weşanxaneya Aras, Çapa 3.

________ (1992). *The Kurds: A Concise Handbook*. Crane Russak, USA.

Sakaoğlu, S. (2007). *Masal Araştırmaları*. Ankara: Weşanên Akçağ.

________ (2002). *Gümüşhane ve Bayburt masalları.* Ankara: Weşanên Akçağ.

Seven, S. (2011). Edebî Metinlerle Çocuk Edebiyatı. (Editör: Ş. DEMİREL). Ankara: Weşanên Pegem Akademi, Çapa 2.

Sever, S. (2010). Çocuk ve Edebiyat.İzmir: Weşanên Tudem.

Sönmez, V. (2003). Sevgi Eğitimi. Ankara: Weşanên Anı.

Sürmeli, K. (4-6 Ekim 2006). Masal Kitaplarında Grafik Tasarım Sorunları ve Çözüm Önerileri. II. Ulusal Çocuk ve Gençlik Edebiyatı Sempozyumu, Ankara: Weşanên Ankara Üniversitesi Edebiyat Fakültesi.

Şimşek, T. (2007). Çocuk edebiyatı. Konya: Weşanên Suna.

________(2001), *Yukarı Çukurova Masallarında Motif ve Tip Araştırması*. Ankara: Weşanên Kültür Bakanlığı.

Şirin, M. Ruhi (2007). Çocuk Edebiyatı Eleştirel Bir Bakış. İstanbul: Weşanên Kök.

________ (2006). *Çocuk Hep Çocuk*. İstanbul: Weşanên İz.

________ (1998). *Masal Atlası*. İstanbul: Weşanên İz.

Tezcan, M. (1987). Kültür ve Kişilik. Ankara: Weşanên Bilim Kitap Kırtasiye.

Tezel, N. (1985). Türk Masalları I-II. Ankara: Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Türinay, N., M. Ruhi Şirin (Haz.) (1989). Masal ve Çocuk Edebiyatındaki Yeri,Çocuk Edebiyatı Yıllığı İçinde. İstanbul: Weşanên Gökyüzü.

Türk Dil Kurumu. (2012). Türkçe sözlük. Ankara: Weşanên Türk Dil Kurumu.

Ural S. (2013). Çocuk Edebiyatı.(Ed. M. Gönen). Ankara: Weşanên Eğiten Kitap.

Uygur, N. (2006). Kültür Kuramı. İstanbul: Weşanên Yapı Kredi.

Yalçın A., Aytaş, G. (2012). Çocuk Edebiyatı. Ankara: Weşanên Akçay, Çapa 6.

Yavuzer, H. (2004). Çocuk Eğitimi El Kitabı. İstanbul: Weşanên Remzi Kitabevi.

Yıldırım, K. (2008). Nûbehara Biçûkan. (Arapça-Kürtçe Sözlük). Stenbol: Weşanxaneya Avesta.

Yurtbaşı, M. (2012). Sınıflandırılmış Atasözleri Sözlüğü. İstanbul: Weşanên Excellence Publishing.

Zinarê X. (2014). Hebû Tunebû… Antolojiya Çîrokên Zarokan. Stenbol: Weşanxaneya Rûpel, Çapa 1.

**Weşanên Biwext, Kovar û Malperên Înternetê**

(www.tdk.gov.tr./13/08/2016).

Bedirxan, K. E. (2014). Kürt Edebiyatı. Wêje û Rexne.Stenbol. Hejmara Yekemîn, Çapxaneya Kayhan.

Karatay, H. (2011). Dil Edinimi ve Değer Öğretimi Sürecinde Masalın Önemi ve İşlevi. Kovara Türk Eğitim Bilimleri, Havîn 2007, 5(3), 463-475).

Kızıl, H. ve Tanrikulu, V. (2015). Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayên Grimm re [The Comparison of Bedlîlik and Hedlîlik of Kurdish and The Wolf and The Seven Young Kids of Grimm Brothers]. International Journal of Kurdish Studies 1 (2), pp.70 – 85.

Luthi, Max. (1997). Avrupa Masal Tipleri ve Kişileri, (wer. S. Sönmez.), Kovara Milli Folklor, S. 36, s. 70.

Roşan, S. (25.04.2010). Ziman û Edebiyat. http://www.rizgari.com/modules. (28 Kanûn 2014).

Sağnak, M. (2004). *Kişi-örgüt değer uyumunu ölçme çalışmaları ve kullanılan yöntemlerin karşılaştırılması*. Kovara *Değerler Eğitimi*, 5, 101-124.

Sever, S. (1995). *Çocuk Kitaplarında Bulunması Gereken Yapısal ve Eğitsel Özellikler*. Kovara Abece, 107, 14-15.

Sorî, H. (1932). Edebiyatî Kurdî. Kovara Hawar. Şam. Sala Yekem, Hejmar Pêncemîn. Çapxaneya Tereqî.

Sönmez, Ö.Faruk (2013). “Allocation of Space For “Sc ıentıfıc ıty” Value ın Soc ıal studıes Currıculum” International Journal of Academic Research, Part B,Vol:5, No:5, ss 278-284.

Şahin, M. (2011). Masalların Çocuk Gelişimine Etkilerinin Öğretmen Görüşü Açısından İncelenmesi. Kovara Milli Folklor, cilt 23, hejmar 89 r. 208-219)

**Tez**

Akbaş, O. (2004). Türk Milli Eğitim Sisteminin Duyuşsal Amaçlarının II. Kademedeki Gerçekleşme Derecesinin Değerlendirilmesi. Yayımlanmamış Doktora Tezi. 30. Ankara: Gazi Üniversitesi, Eğitim Bilimleri Enstitüsü.

Albayrak, A. (1996). Ergenlerin Dini Gelişiminde Sevgi ve Korku Motifinin Etkinliği (Yarı Deneysel Araştırma). Bursa. (Uludağ Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Yüksek Lisans Tezi).

Attı, H. (2013). Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zînê (Teza Lîsansa Bilind ya Nehatî Çapkirin). Mêrdîn. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê.

Ergun, F. (2013). Folklora Herêma Botan. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez. Mêrdîn. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê.

Karakuş, I. Şerife (2006). Çocuk Edebiyatı Ürünlerinin Okuma Gelişimine Etkisi (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Ankara: Gazi Üniversitesi.

Küçük, E. Emine (2005), İlköğretim 6., 7. Ve 8. Sınıflarda Okutulan Türkçe Kitaplarındaki Düz Yazı Metinlerinin Çocuğa Görelik İlkesine ve Metinlerin İçerdiği Eğitsel İletilere Göre İncelenmesi (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Elazığ: Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

**PÊVEK-1**

## DI HER TIŞTEKÎ DE XÊREK HEYE

Hebû çi nebû, rojekî padîşaxek hebû. Vî padîşaxî gelek ji nêçîrê hez dikire. Rojekî dem li ber zivistane û dîsa laşê padîşaxî ji bo nêçîrê xidxidiye. Padîşaxî jî gotiye wezîrê xwe û leşkerên xwe:

-De xwe amade bikin! Em dê biçin nêçîrê.

Padîşaxî, wezîr û leşkerên xwe dane dora xwe û bi çiyayên herêmê ketine. Hêj gelek bi çîyê de neçûyîn, Padîşaxî gotiye:

-Kuro wezîr! Dinya gelek sar e, gelo em bi paş ve venegerin?

Wezîr:

-Padîşaxê min, di her tiştekî de xêrek heye! Em bidomînin.

Padîşax jî bi ya wezirê xwe kiriye û nêçîra xwe didomine. Qederek di ser deçûye, birek pezkovî dîtine. Padîşax xwe daye li ser zinarekî û tifeke xwe li ber pezkoviyekî xweş kiriye. Lê dinya jî gelek sar e. Padîşax tam kar kiriye ku tiliya xwe li ser tetikê (tilîkêş) dare, lê ji ber sermayê teliya wî ya hingî bûye cemed ji binî ve jêbûye û ketiye erdê. Bûye hawar hawarê padîşaxî û xwe li erdê gevastiye. Wezîr jî li derdora wî di hir de di wir de çûye o gotiye:

-Padîşaxê min, di her tiştekî de xêrek heye.

Û bi vî şeklî ev gotin dubare kiriye. Padîşax jî gelek hêrs bûye û gotiye:

-Kuro wezîr! Ev çi qîseye te ji bo xwe girtiye. Malmîratê malmîrat! Hema çi nexweşiya bi serê me tê tu dibêje; “Di her tiştekî de xêrek heye.” Em bimirin jî tu dê bibêje; “Di her tiştekî de xêrek heye.” Leşkerino, zû vî bigirin û biavêjin zindanê!

Leşkeran, wezîr girtiye û avêtine di zindanê de. Du sê sal bi ser vê meseleyê de çûne. Wezîr hêj di zindanê de ye. Rojekî dîsa padîşaxî gotiye xulam û leşkerên xwe:

-Xwe amade bikin, em dê biçin nêçîrê.

Padîşaxî, xulam û leşkerên xwe dane dora xwe û çûye nêçîrê. Gelekî ji herêmê dûr ketine û çi nêçîr nedîtine. Padîşax jî gelekî ji nêçîrê hez dike û li xwe nahêle ku bê nêçîr bizîvire qesra xwe. Wê şevê li nav çiyayên asê de konê xwe vedane û bi dest xewê kirine. Gelek bi ser razana wan ve neçûye mirovên hov li ser wan de girtine û dest û piyên wan girêdana û bo xwe birine. Çandeke wan mirovên hov jî heye ku yên girtî hema çi jî be ku qûsureke wan hebe wan naxwin û diberdin. Welhasil, ji ber ku tiliya

padîşaxî jî jêkiriye wî, hin leşker û xulamên wî yên bi hin derên xwe bi qûsur in, berdane.

Padîşax, gehiştiye qesra xwe û gotiye:

-Zû wezîr ji zindanê derbêxin û bînin dîwana min!

Leşkerên wî jî çûne wezîr ji zîndanê derêxistine û anîne dîwana padîşaxî.

Dema padîşaxî wezîr dîtiye ew hembêz kiriye û gotiye:

-Kuro wezîr! Tu zelamekî camêr û qenc î.

Wezîrê feqîr, şaş maye û çi tênegihiştiye. Bi çawên xalî gotiye:

-Çima padîşaxê min?

Padîşax gotiye:

-Ne ji ber te ba vê gavê ez dê ne li vir bûma û ez çûbûm rehmetê. Tê bîra te, te her dem ji bo min digot; “Di her tiştekî de xêrek heye.” Min jî ji bo vê gotinê tu avêtî zindanê?

Wezîr gotiye:

-Belê padîşaxê min, tê bîra min.

Vêca, padîşaxî serpêhatiya xwe ji bo wezîrî gotiye û lêborîn ji wezîr xwestiye.

Wezîr gotiye:

-Padîşaxê min, hewce nîne tu lêborînê ji min bixwaze. Gerek ez spasiyekî li te bikim. Eger te, ez zindan nekiriba me vê gavê ez mirîbûm. Ango “Di her tiştekî de xêrek heye.”

Çîroka me çû deştê, dê û bavên me çûn behiştê.

(Gelêrî)

## ÇÎROKA KITIKÊ

Rojek ji rojan pîremêrek hebû. Piremêr gelek feqîr bû. Siharekî mesînê tijî av kiriye û çûye di dolekî de da destnimêj bigire. Dema pîremêrk xwe çemandiye mesînî ji nîşkê ve mesîn wergeriyaye û rijiyaye. Piremêrik hêrs bûye û gotiye mesînî:

-Mesînko bo çi tu wergeriyayî?

Mesînî gotiye:

-Bo çi giya di bin min de şîndaye!

Pîremêrik gotiye giyayî:

-Bo çi te di bin mesînî de şîndaye?

Giyayî gotiye:

-Bo çi pez min dixwe!

Pîremêrik gotiye pezê:

-Bo çi tu giyayî dixwe?

Pezê gotiye:

-Bo çi gur tê min dixwe!

Pîremêrik gotiye gurî:

-Bo çi tu pezê dixwe?

Gur gotiye:

-Bo çi se diberdine li pey min!

Pîremêrik gotiye sê:

-Bo çi tu diberde li pey gurî?

Sê gotiye:

-Bo çi bermaliya malê nanê hişk û nexweş dide min!

Pîremêrik gotiye bermaliyê:

-Bo çi tu nanê hişk û nexweş dide sê?

Bermaliyê gotiye:

-Bo çi mişk genimê me dixwe!

Pîremêrik gotiye mişkê:

-Bo çi tu genimê wan dixwe?

Mişkê gotiye:

-Bo çi kitik diberdine li pey min!

Pîremêrik gotiye kitikê:

-Bo çi tu diberdê li pey mişkê?

Kitikê gotiye:

-Ez dixwimvedixwim û her li çavên te dinêrim.

(Gelêrî)

## KER, MIH, ROVÎ Û SE

Carek ji caran rehmet li dê û bavên guhdaran. Carekî ker, mih û se çûne rêkekî karwanê. Se şivanê ker û mihê ye. Di rê de ker û mihê ji xwe re diçêriyan lê belê bo seyî çi nebû bixwe û mecbûr birsî dima. Her sê ajal dema di rê de diçûn gehiştine mêrgeke gewr. Seyî ji bo ker û mihê got:

-Hûn li vir rawestin û ji xwe re biçêrin, ez dê biçim li erdekî tişteke xwarinê bibînim û bixwim. Lê kero divê tu nezirî! Ez dizanim, dema tu têr bixwe tu dê zirî. Mihê tu jî li kerê hişyar be, de ku nezire. Heger ker bizire, gurek dê bêtin tana we û wê we bixwe, ez jî li tana we nîn im.

Seyê gewr, wan şîretan li her du hevalên xwe dike û diçe bo xwe xwarinekî peyda bike. Qederek li ser çûna seyî derbas dibe û ker mih di mêrga şîn û fireh de têr dixwin. Dema ku her du têr dibin, kerê gotiye mihê:

-Dengê min tê û divê ez bizirim.

Mihê gotiye kerê:

-Kuro kero nezire, seyî gotiye me deng nederêxin, gur dê be tana me û me bixwe. Se jî li dev me nîne, em neşên. Qetiyen tu nezire!

Kerê gotiye:

-Wele ez dê bizirim. Ziriya min tê.

Mihê her çiqas gotiye nezire jî çare ji kerê nekiriye. Kerê jî dûvê xwe rakiriye û bi dengekî bilind zirên pêketiye. Dema ku ker ziriyaye li pişt teraşekî gurekî dengê zirîna kerê kiriye û xwe di jêr de berdaye. dîtiye ku li mêrgê kerek û miheke diçêrin. Gilîza devê gurî herikeye. Gur di serê xwe de fenek honandiye, hatiye dev ker û mihê û gotiye:

-Kuro çima hûn di mêrga bav û kalên min de diçêrin. We ji kî destûr standiye!

Ker û mih tirsiyane, qederekî ziman li her duyan şkestiye. Bi dûv re mihê gotiye:

-Wele tu bi heq î. Ê vêca tu dê çi li me bikî?

Gurî bi awayeke bêminet gotiye:

-Ez de we bixwim!

Mihê gotiye:

-Wele tu me naxwî, em qebûl nakin!

Gurî gotiye:

-Çima hûn qebûl nakin, ma ez çi bikim hûn dê qebûl bikin?

Mihê gotiye:

-Divê tu şahidekî bînî, bo te şehdebûnê bide ev mêrg ya te ye hingî tu dê me bixwî.

Gurî jî hizra xwe kiriye ka kî bike şahidê xwe. Hinekî hiziriye û biryar li ser rovî daye û gotiye:

-De baş e. Hûn çi erdan ve neçin ez dê niha şahidekî bînim bêm.

Gur çûye li pişt teraşekî gazî rovî kiriye. Rovî gotiye:

-Ev te xêre tu gazî min kiriye.

Gurî gotiye:

-Mamê rovî ka were şehdebûnê bo min bide!

Rovî gotiye:

-Bo çi ez bo te şehdebûnê bidim.

Gurî gotiye:

-Wele, mihek û kerek wê hatine di nav mêrgekî de diçêrin. Min jî gote wan; "Ev mêrga bavê min e, ez dê we bixwim." Wan jî gote min; "Here bo xwe şahidekî bîne da em bizanin ev mêrg ya te û bavê te ye." Vêca tu were bibe şahidê min. Ûrik û rûviyên kerê gelek in, yên mihê ji di ser de têra te hene. Ez dê ûrik, rûvî û serî û pepikên wan bidime te, bila goştên wan jî bo min be.

Rovî gotiye:

-Wele, gelek baş e. Ez dê şehdebûnê bo te bidim. De rabe em biçin!

Di wê navberê de dema gur ji dev ker û mihê çûye, se jî hatiye. Berê xwe daye ku rengê ker û mihê zer bûye, mehdê wan qulibiye, mirin ji çawên wan dibare. Gurî gotiye:

-Ev xêr e, hûn wisa bi mecal ketine?

Mihê gotiye:

-Wele, dema tu çûyî kerê têr xwar û zirî.

Gurî gotiye:

-Ê vêca çi bûye?

Mihê axaftina xwe domandiye:

-Dema ker zirî, gurek hat û got; "Ev mêrg ya min e, hûn bê destûra min hatine di tê de çêrîne, ez dê we bixwim."

Gurî gotiye:

-Êêê! Hûn sax in, li pêşberê min in.

Mihê gotiye:

-Ne me qebûl nekir. Me got; “Here şahidekî bîne da em bawer bikin ev mêrg ya te ye.” Vêca ew jî çûye şahidekî bo xwe bîne. Em jî di tirsa xwe de bûn. Baş e tu hatî. Ka aqilekî bide me, em çi bikin?

Gur hinekî hiziriye û gotiye:

-Ez dê biçim li wê teraşa he xwe weşêrim. Dema ku gur û şahidê xwe hatin. Bibêjin; “Em bi şahidekî jî ewle nabin, li wê teraşê henê minasibek heye, here bi wê minasibê sond bixwe da em ji we bawer bikin.” Êdî we çi şol pê nîn e. Ez dê dermanê dilê wan bidime wan.

Mih û kerê ev aqilê seyî ecibandina. Se jî çûya li teraşê xwe weşartiye. Qederek çûye se û Mam rovî hatine dev ker û mihê. Gurî gotiye:

-Ev e şahidê min Mam rovî ye. Mamê rovî da şehdebûnê bide!

Rovî gotiye:

-Belê, ez şehdebûnê didim ku ev mêrg ji berê de ya bav û kalên gurî ye.

Mihê gotiye:

-Na ev tenê çênabê. Çêdibe ku te şahid bi bertil kiribe. Ha,li wê dera he minasibek heye, bila şahidê te li ser wê minasibê jî sond bixwe em dê ji te û şahidê te bawer bikin.

Gurî gotiye rovî:

-De mamê rovî here sond bixwe û were.

Rovî jî çûye li ber teraşê sond bixwe, hinekî nêzîk bûye, guhê seyî di nav teraşê de dîtiye û gotiye:

-Wele ez li ser vê minasibê sond naxwim.

Gurî gotiye:

-Çima tu sond naxwî?

Rovî gotiye:

-Na mamo! Ev minasib gelekî dijwar e dê bi min ve bidî. Ez sond naxwim. Ku tu li xwe bawer bibe tu here sond bixwe!

Gur kiriye û nekiriye rovî sond nexwariye. Gur çi bike, mecbur ew çûye li ber teraşê xwe çemandiye da sond bixwe, ji nişkê ve se ji nava teraşê derketiye û bi niqira gurî re girtiye û li erdê gevastiye. Çavên ker, mih û rovî jî li wan e. Rovî gotiye:

-Ma min ne got te; “Ev minasib gelekî dijwar e, dê bi te ve bide.”

Çîroka me çû deştê dê û bavên me çûn beheştê.

(Gelêrî)

## ÇÎROKA EHLAQÊ

Wextekî mîrekî Colemêrgê yê gelek baş hebû. Rojekî ev mîr dibêje; “Ez di nav mirovên xwe da bigerim ka kî baş e, kî nebaş e, li gor encamê jî ez dê bo xwe hin guhertinan bikim.” Di serê xwe da planek çêkiriye û bi dest plana xwe kiriye.

Gazî du xulamên xwe dike. Her du xulamên wî tên dev wî. Berê xwe dide xulamekî, ew xulam gelek paqij e, cilên wî dirist in, didanên wî paqij in, riha wî dirist kiriye, pirça wî şeh kiriye. Berê xwe dide xulamê din, gelek paqij nîn e, cilên wî lewitîne, didanên wî ji qelûn kişandinê zer bûne, riha wî paqij nîn e û pirça wî jî ne şeh kiriye.

Kêfa mîr gelek ji bo xulamê paqij tê û dibêjê xulamê ku paqij:

-Tu here hemamê serê xwe bi dilê xwe bişo! Ev tişt ji bo te xelat e.

Piştre jî gazî xulamê ku bi qirêj dike û dibêje:

-Min hevalê te rêkir hemamê, ji ber ku tu mirovekî gelek baş î, min tu rênekirî. Bes ew hevalê te yê din di heqê te da tiştên gelek nebaş gotin.

Mîr gelek tiştên nebaş yên din ji devê xulamê paqij dibeje, lê xulamê qirêj qet dengê xwe dernaxe û çî tiştî nabêje.

Hindek wext derbas dibe xulamê paqij yê ku çûye hemamê tê. Mîr vê carê xulamê bi qirêj rêdike hemamê û gazî xulamê ku nû ji hemamê hatiye dike. Xulamê paqij tê dev mîrê xwe. Mîr dibêje:

-Wele min ev xelat da te jî lê tu mirovek baş nîn î!

Xulamê paqij dibêje:

-Mîrê min bo çi ez baş nîn im?

Mîr dibêje:

-Ew hevalê te yê din ewê qirêjoyî, niha di heqê te da gelek tiştên nebaş gotin.

Gelek kerbê xulamê paqij vedibe û dibêje:

-Mîrê min ji xwe yê ne baş ew e, ez mirovekî gelek baş û gelek qenc im.

Û gelek tiştên nebaş di heqê hevalê xwe yê nepaqij da dibêje. Mîr hingî dizane ku başî û nebaşî, ji derveyê mirovan diyar nabe.

Hinek wext derbas dibe, xulamê nepaqij jî ji hemamê tê. Mîr her du xulaman li dev êk rûdinêne û dibêje xulamê paqij:

-Tu mirovekî baş nîn î, bes hinga tu di hemamê da min di derbarê te da gelek tiştên nebaş ji bo hevalên te gotin lê hevalê te qet dengê xwe dernexist û tiştên nebaş ji

bo te negotin. Vêca, hevalê te çû hemamê, min hin tiştên nebaş di derbarê wî da gotin, te di cih da qala wî kir û te gelek tiştên nebaş gotin. Welhasilê min hûn ceribandin ka kî ji we baş e. Tu baş derneketî, hevalê te baş derket. Ji vir pêda ev zelamê ku bi qirêj dê li dev min be, tu jî li bin emrê wî da be.

Dema ku mîr axaftina xwe xilas dike, hinekî dihizire û ji bo her du xulaman xwe çîrokekê dibêje:

-Rojekî zelamek çûye dev agirî û gotiye; "Ku li erdekî agir nebitin, em dê çawa te bibînin?" Agirî ji gotiye; "Ku ji kî erdê dûkel biçe ez li wir im." Zelam çûye dev avê û gotiye; "Ku mirov biçe erdekî û te nebîne dê çawa zanibe tu li ku derê yî?" Avê gotiye; "Ji kî erdê dengê şirşirekê were ez li wir im." Zelam çûye dev ehlaqê û gotiye;"Dema ku tu nebî em dê çawa te bibînin?" Ehlaqê gotiye; "Wekî te ez nedîtibim, tu çû caran min nabînî. Ez di biçûktayiyê da têm wergirtin, heta niha te ez wernegirtibim tu çû caran bi ehlaq nabî û tu dê her mirovekî pîs bî."

Mîr çîroka xwe xilas kiriye û gotiye her du xulaman:

-Vê çîrokê jî çû caran ji bîr nekin!

(Gelêrî)

## MIRÎŞKA PÎRÊ

Rojekî li gundekî, demê zomê tê û gundî pez û heywanên xwe bi rê dêxin û diçin zomê. Li wî gundî pîreke feqîr jî heye bi tenê mirîşkeke wê heye. Pîrê jî mirişka xwe dibe û diçe zomê.

Vêca, Xwedê kerema xwe bi wê pîrê dike, mirîşka wê rojê du lib hêk dike. Pîrê jî her du sê rojan hêkên xwe dibe, bi penîr an jî bi şîr an jî bi mastî diguhere û bi vê awayê tiştên ku li zomê tên berhevkirin ji bo xwe berhev dike. Rojekî mirîşka pîrê sil dibe û diçe derekî. Dera ku mirîşk çûye bîst rojan li wê derê dimîne û çil lib hêk dike. Ka piştî çend rojan çil çûçûkan derdixe.

Demê zomê xilas dibe, gundî qesta gund dikin û berê xwe didine gund. Dema ku gundî diçin pîrê ji bo mirîşka xwe bi dest girî û hawarê dike:

-Ka mirîşka min, ma ku ve çûye kî mirîşka min biriye?

Bi vê awayê dike qîr û gazî. Gundî jî dibêjin:

-Ma kî yê mirîşka te bê, an guran xwariye, an roviyan xwariye an jî berze bûye.

Welhasil, gundî û pîrê ji zomê bar kirine û çûne. Dema ku zom bar dike diçe, qederek bi ser da diçe û mirîşk qesta zomê dike. Mirîşk tê zomê ku çû kes li zomê nemaye, warê xalî bûye, li cihê konê pîrê bager dilehîze, peyîza dereng e, dinya sar bûye û li wan deran ji hin kinciran pêve çû nîn e. Mirîşk jî ji wan erdan hin kinciran dide dora serê xwe û çûçikên xwe, qesta gund dike.

Mirîşk û çûçikên wê qederek rê diçin û digehêjin aşekî. Mirîşk berê xwe dide aşî ku di tê da çû kes nîn e. Mirîşk dibêje:

-Ez vê şevê bi rê bikevim rovîyên min û çûçikên min bixwin, hema ez dê îşev li vir bimînim.

Mirîşk û çûçikên wê xwe dixine di quncikeke aşî da û betlana xwe dikin. Hindek wext hêj derbas nebûyî, roviyek dikeve di aşî da berê xwe didete ev e xalaxala mirîşkane, kêf kêfa wan e. Rovî nêzî mirîşkê dibe û dibêje:

-Min divê ez li gel te xizmanetiyê bikim, bo vê jî tu çûçikeke xwe bide min.

Mirîşk dibêje:

-Belê Mam Rovî, xizmanetî navbeyna me û we de heye, lê belê tu jî here gazî heval û hogirên xwe bike, destek cil xwe bike, şalekî bavêje pişta xwe û xencerekî bêxe ber xwe de em zanibin tu zavayî. Û hingî jî em dê mirîşkekê bidine te.

Rovî dibêje:

-De baş e. Lê heta ez werim hûn bi çû derê ve neçîn.

Mirîşk dibêje:

-Tu qet meraq neke Mam Rovî, soza me soz e!

Rovî diçe, gazî du sê hevalên xwe dike û dizivire. Heta rovî diçe û tê mirîşk pir dide diçe lalê xwedanê aşî Mam Heyder û dibêje:

-Mamê Heyder! Bi Xwedê roviyê çûçikên min bixwe. Min vî qaskî roviyê xapandî vêca ez di bextê te da me tu min ji vî zalimî xilas bikî!

Dema ku mirîşk we dibêje, Mamê Heyder xwe li pişt deriyê aşî diveşêr e. Mirîşk jî diçe lalê çûçikên xwe. Qederek diçe rovî tê. Rovî dibêje:

-Selamûn aleykûm.

Mirîşk dibêje:

-Alêykûm selam, Mamê Rovî, tu bi xêr hatî. Ka vêca bêhnekî em bo xwe dawetê bikin, kêfxweşiyê bikin.

Û rovî, mirîşk û havalên roviyên din li milê êk dikevine dawetê, reqereqê ji dawetê tînin. Di ber dawetê da geh mirîşk dibêje de stranekî bêje geh rovî dibêje tu bêje, domahiyê da rovî stranekî dibêje:

*“Mirîşkê per belekê,*
*Goştî bixwim gelekê,*
*Werine kêf û henekê.”*

Dema rovî vê stranê dibêje, mirîşk jî dibêje:

*“Mam Heyder ha Mam Heyder,*
*Mam Heyder tête ji wê ve,*
*Tu bi gozekê re bigire*
*Roviyê di deştê de.”*

Dema mirîşk vê stranê dibêja rovî xwe diavêje hewa. Mirîşk dibêje:

-Mamê Rovî qey çi li te qewîmiye, ma ne te stran got ez ne livîm, çima dema min got tu wisa dikî?

Rovî dibêje:

-Ez û Mam Heyder dijminê êk in. Wî bavê min kuştiye û bapîrê wî jî bapîrê min kuştiye, em xwîndarên êk in. Dema te navê wî got ez hêrs bûm.

Rovî dizivire û straneke din dibêje:

*"Mirîşkê mirîşkelanê,*
*Goştî bixwim serî li danê*
*Werine kêf û seyranê."*
Mirîşk jî dibêje;
*"Mam Heyder tête ji wê ve*
*Tu bi gozekê re bigire*
*Roviyê di deştê de."*

Dema mirîşk strana xwe xilas dike, Mamê Heyder ji nişkê ve xwe diavêje û bi gozeka rovî re digire. Mam Heyder rovî dike qefesê da û mirîşk û çûçikên vê dibe gund dide pîrê. Gelek kêfa pîrê tê, ji bo alîkariya wî jî bîst çûçikan dide Mamê Heyder. Ez hatim malê rehmet li dê û bavên guhdaran.

(Gelêrî)

## SÊ ZÊR Û SÊ ŞÎRET

Rojekî zelamek heye. Jineke vî jî heye û zelam gelekî ji jina xwe hez dike. Lê zelam gelekî feqîr bû û çû şol jî li wan deran nîne. Zelamî rojekî gotiye jina xwe:

-Ez dê biçim xerîbiyê şol bikim.

Jina wî ya feqîr jî gotiye:

-De baş e.

Zelam jî debara xwe hazir kiriye û bi rêya xwe ya dûr ketiye. Sal û zeman li ser çûna zelamî derbas bûne. Zelam gelek salan şol kiriye lê bi tenê sê zêr peyda kiriye. Zelamî bêriya jin û mala xwe kiriye. Rojekê tiştên xwe hemû dan êk û berê xwe da malê. Gava ku di kolanekê ra derbas bûye dengek bihîstiye. Zelamekî pîrê li ber çadirekî ye û gelek mirovên li dora wî ne û ew zilamê qîr dike:

-Şîreteke min heye. Kî zêrekî bide min ez dê vê şîretê ji bo wî bêjim.

Zelamî jî xwe nêzî wan mirovan kiriye û berê xwe daye wan. Gotina wî zilamê pîr ji bo wî bûye meraq. Lê sê zêrên wî hene, dudil bûye. Û berê xwe diaye çadirê. Zelam ketiye jûr da û zêrê xwe kirine di nav destê zelamê pîr da û gotiye:

-Ka vêca şîreta te çi ye bêje min?

Zelamê pîr gotiye:

-Şîreta min “Sebr ”e. Her wextî sebrê bikişîne.

Zelam madê xwe kiriye û gotiye:

-Ev bû şîreta te? Ne min jî ev zanîbû.

Zelamê pîr:

-Wele te bive nevê gotina min ev e, de oxir be ji bo te!

Zelam, peşêman peşêman ji çadirê derketiye. Hêj du pengav neavêtîn, zelamê pîr dîsa qîr kiriye:

-Şîreteke min ya din jî heye, heçî ku bive bila zêrekî bînî û werê.

Dîsa meraq ketiye dile zelam da û di dile xwe da gotiye; “Zêrekî min li boşê çû belkû ev şîret êka law be!” Dîsa dudil çûye bin çadirê û gotiy:

-Ez dê vê şîreta te jî bikirim lê bila ev baş be ha!

Zêrê xwe yê duyê jî kiriye di nav destê zelamê pîr da û gotiye:

-Ka bêje şîreta te ya duyê çi ye?

Zelamê pîr gotiye:

-Şîreta min ya duyê ev e; “Çû caran ji tiştên tu kesî re nebêje kirête!”

Zelam, hêrs bûye û gotiye:

-Ev bû gotina te, ev çi şîret e? Kerê kore jî vê tiştê dizane!

Zelamê pîr gotiye:

-Wele ev bû şîreta min, te bivê nevê gotina min ev e.

Zelam derketiye û dîsa peşêman peşêman çûye. Hêj du pengav nehavêtîn dîsa zelamê pîr qîr kiriye û bi dengekî bilind gotiye:

-Şîreteke min ya din jî heye kî divê bila werê!

Zelam dîsa rawestaya û meraq ketiyedi dile wî da û di dile xwe da gotiye; “Ma ve her du zêr çûn êk jî bi kêr çû tiştî nayê, heme belkî ev şîreta din bi kêr min were. Zelamî di nav wan aloziya da berê xwe daye çadirê û zêrê xwe yê sêyê jî daye zelamê pîr û gotiye:

-Ha ve zêr ji bo te, ka bêje şîreta te ya sêyê çi ye? Lê bila şîreta te vê carê qenc be!

Zelamê pîr gotiye:

-Şîreta min ya sêyê ev e; “Karwanê xwe çû caran di nav du çiyayan da nede rawestan!”

Zelam dîsa hêrs bûye û gotiye:

-Malmîrat ma ev bû şîreta te, ev çi ye? Min jî ev tişt zanîbû. Te ez xapandim te zêrên min hemû ji min wergirtin.

Zelamê pîr:

-Ma min tu bi darê zorê înaye vê derê! Gotina min ev bû. Bes zanibe ku ev şîretên min dê rojekê ji bo te bine aqil.

Zelam peşêman peşêman derketiye. Hizr kiriye ku zêrên xwe yên çend salan, daye sê gotinên beredayî. Di dile xwe da gotiye; “Ev jî bêsiûdiya min e!” Û çûye gehiştiye karwanekî bi wî karwanî ra berê xwe daye mala xwe.

Rojeke temam bi kerwanê ra rê çûye. Bûye şev û kerwan di nav du çiyayan da li rex çemekî rawestaya. Serekê kerwanê gotiye:

-Em dê îşev li vira rawestin û binivin.

Di wê demê da şîreta zelamê pîr ya, “Çû caran kerwanê xwe di nav du çiyayan de nerawestîne!” hatiye hizra zelamî. Zelam çûye rex serekê kerwanê û gotiye:

-Em li vir ranewestin!

Serekê kerwanê gotiye:

-Çima birako em li vir ranewestin?

Zelamî gotiye:

-Min bi zêrekî şîretek kirîbû û ev şîret jî, “Çû caran kerwanê xwe di nav du çiyayan de ranewestîn.” E.

Serekê kerwanê gotiye:

-Ka here lo! Tu nabînî dinya sayî ye çû tişt nîn e, em dê li vir bimînin. Te bivî tu here dereke din.

Zelam kriye û nekiriye tû bi serê serekê kerwanê nexistiye. Wî her zêrê xwe ji bo vê şîretê dabû ew rabûye, çûye dereke bilind li wê derê nivistiye. Demekê şevê bûye bager û baran, wekî esman kul bûyî baran hatiye, lehî rabûye, kerwan hemû li ber xwe biriye. Bûye sibeh, zelam berê xwe dayê ku avê kerwanê biriye, hizra xwe de gotiye; “Zêrê min li boşê neçû, ne ji vê şîretê ba vê gavê ez mirî bûm.” Û bi rêya xwe ketiyet û çûye.

Qederek rê çûye berê xwe daye ku li pêşiya wî xanek heye li xanê sed pencere hene û di not û neh pencereyan da serê mirovan diyar dike. Tirs ketiyedi dilê zelamî da. Lê ber êvar e, mecbûr bûye herê wê xanê. Çûye ber deriyê xanê, destê xwe li deriyê xanê daye ketiye jûr da. Berê xwe dayê, ve di xanê da zelamekî rûniştiye û li ber jî teşteke tijî av e, di nav avê da jî beqekê pîs zehîf heye. Xwediyê xanê gotiye:

-Xêre! Tu ji ku derê tê û te çi divê?

Zelamî bi tirs gotiye:

-Ez rêwî me, min divê ez îşev li vir bimînim.

Xwediyê xanê gotiye:

-Belê li vir bimîne, lê ji bo min bêje ev beqê ku tu dibînî, spehî ye?

Di wê demê da şîreta zelamê pîr ya, “Çû caran ji tiştên kesî re nebêje kirêt e!” Hatiye bîra zelamî. Zelam di dilê xwe da gotiye, “Ez bi şîreta wî zelamê pîr ji mirinê xelas bûm, her min zêrê xwe pê daye, ez dê dîsa bi ya wî bikim.” Û gotiye:

-Ev beq gelek spehî ye.

Di wê demê da beq pîçekî pim bûye, mezintir bûye. Zelam tirsa û şaş maye.

Xwediyê xanê dîsa gotiye:

-Ez ji bo te dibêjim ev beq spehî ye?

Zelamî bi dilekî tirs gotiye:

-Ev beq gelekî spehî ye, xweşik e!

Beq hinek din pim bûye û mezintir bûye. Zelam ji tirsa û nezaniye çi bikî.

Xwediyê xanê gotiye:

-Ez ji bo te dibêjim tu rast dibêjî ev beq spehî ye?

Zelam di nav tirs û xwêdanê da dîsa gotiye:

-Belê ezbenî, çû beqên wekî vê nîn in û gelekî spehî ye.

Beq, pim bûye pim bûye teşt tijî kiriye û peqiyaye. Ji nav wê peqandinê da jineke rûs û gelek spehî derketiye. Zelam gelekî şaş maye û ji tirsa, ziman lê şkestiye. Xwediyê xanê gelek kêfxweş bûye, çûye jinik hêmbêz kiriye û berê xwe daye zelamî:

-Tu her bijî, te jina min ji sêhrê xelas kir!

Zelam çû jê tênegehiştiye. Wekî mirovekî gêj lê nêriye. Xwediyê xanê gotina xwe domandiye:

-Beriya niha gelekî, pîrhefokek hate vir û gelek tişt ji me xwestin lê ew tiştên ku wê dixwestin min pêk neyînandin. Wê jî jina min kire beq. Xelasbûna jina min jî; divê mirovek bêje ew spehî ye. Heta niha nehwêd û neh mirov hatin û hemûyan got; “Beq ne spehî ye.” Min jî serê hemûyan jêkirin û li pencereyan ve hilawêstin. Ez bawerim ku te jî ew serî di pencereyan da dîtine. Vêca ku mirovê sedê jî gotibaya ev beq kirêt e, jina min dê bimira. Ez nizanim te ji bo çi got ev beq spehî ye, bes tu mirovê sedê bûyî û te jina min ji mirinê xilas kir. Vêca mirovên ku heta niha min serê wan ser jê kiriye tiştên wan hemû yên te ne.

Kêfa zelamî hatiye, wê şevê li wê xanê maye. Bûye sibeh, zelam rabûye sertêşta xwe xwariye û gelek mal, ziynet û hêştirên xwe wergirtiye û bi rêya mala xwe ketiye. Zelam gelek roj û şev bi rê çûye şevekê gehiştiye li ber deriyê mala xwe. Di pencerê ra berê xwe daye ku ve jina wî û ciwanek gel êk dinivin. Zelam hêrs bûye xencera xwe kişandiye û çûye her duyan bikuje. Vêca di wê demê da şîreta ewil ya ku “sebr” bû hatiye bîra wî. Û zelam çûye deriyê malê vekiriye, pehînek li piyê jina xwe daye û gotiye:

-Rabe keçê ev çi kes e di nav cihê te da?

Jina zelamî ji xewê hişyar bûyebi çavên matmayî zelamê xwe nêriye ku zelam xencer derêxistiye û li ber serî rawestaya. Jinikê kelecanekê gotiye:

-Ev kurê te ye mêrê delal! Hinga tu çûyî ez bi halekî bûm, heta tu ji xerîbiyê hatî, kurê te mezin bû, bû ciwan.

Zelam ji nû ve kêfxweş bûye û keniye, jin û kurê xwe hêmbêz kiriye, Tiştên ku di serê wî ra borîn hemû ji wan ra gotine. Şîretên zelamê pir hemû yên ji bo wî bûbûne alîkar gotine û heta heta di nav şad û kêfxweşiyê da jiyana xwe borandine.

Rehm li dê û bavên guhdaran.

(Gelêrî)

## ÇÎROKA MAM ROVÎ

Carek ji caran rehm li da û babê hazir û guhdaran. Carekî pîrek hebûye û çêlekeke wê jî hebûye. Pîrê her şev çêleka xwe dotiye û şîrê xwe bi deriyê mala xwe ve hilavêstiye. Roviyek jî hûre bûye û her şev hatiye şîrê pîrê vexwariye. Pîrê jî her sibeh çûye berê xwe daye ku şîr çû nîn e. Şevekê pîrê bo xwe dibêje:

-Welehî ez dê xwe îşev veşêrim ka ev çi heywan e tê şîrê min vedixwe.

Bûye şev pîrê dîsa çêleka xwe dotiye û bi deriyê mala xwe ve hilavêstiye, dasek jî kiriye destê xwe da xwe li derekê veşartiye. Pîrê berê xwe daye, roviyek hatiye şîrê wê vexwariye. Hema pîrê ji nişkê ve dasa xwe hildaye û li roviyî kêşandiye. Rovî baz daye lê dûvê xwe xilas nekiriye û dûvê roviyî jêbûye. Rovî reviye û çûye dev hevalên xwe. Hevalên rovî diberdine pey rovî û dibêjin:

-Rovî rovî dûv qulûto, melkemoto tu bi ku ve diçî bi wê here!

Rovî jî bêdûv şerm dike û dîsa vedigerê dev pîrê û jê hêvî dike ku dûvê wî bidete. Pîrê jî dibêje:

-Dema tu şîrê min bînî ez dê dûvê te bidime te.

Rovî dibêje:

-Ma ez dê şîrê te ji ku derê bînim?

Rovî çi bikî çi nekî, diçê dev bizinê û dibêje:

-Bizinê ka hindek şîr bide min.

Bizin dibêje:

-Tu çi ji şîrî bikî?

Rovî, hal û mesela xwe bo bizinê dibêje. Bizin jî dilê wê bi rovî ve dimîne û dibêje:

-Here hindek çilo bo min bîne ez dê şîr bidime te.

Rovî diçe dev çilo û dibêje:

-Çilo çil bide, çil bizin bide, bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê Rovî bide.

Çilo dibêje:

-Rovî here dasê bîne ez dê çilo bidime te.

Rovî jî diçe dev hedatî û dibêje:

-Hedat das bide, das çil bide, çil bizin bide, bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê Mam Rovî bide.

Axirkî hedat diçe dasê bo rovî, tîne. Rovî dasa xwe werdigire û diçe didite çilo û dibêje:

-Çilo çil bide, çil bizin bide, bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê Mam Rovî bide.

Dara çiloyê, hindek çilo didete rovî û rovî çiloya werdigire diçe dev bizinê û dibêje:

-Bizin şîr bide, şîr pîrê bide pîrê dûvê mam rovî bide.

Bizin şîrê rovî didete û rovî şîrê xwe werdigire diçe dev pîrê û dibêje:

-Şîr pîrê bide pîrê dûvê Mam Rovî bide.

Pîrê şîrê xwe werdigirê û hindek zengil mengilan jî dûvê rovî ve dike û didete. Rovî bi kêf dûvê xwe tîne û diçe di nav hevalan da digerê. Dema ku rovî digere deng ji zengilên bi dûvî wî ve tên. Hevalên wî li dora wî kom dibin û dibêjin:

-Kuro te ev zengil û mengil ji ku înane?

Mam rovî jî qurnaz e. Dibêje hevalên xwe:

-Birakino! Ev zengil zehf in, we çiqas bivê ez dê bo we bînim.

Hevalên Mam Rovî dibêjin:

-Ka li ku hene? Bo me bêje em dê biçin bo xwe bînin.

Dinya gelek sar e û bûye şev hêj sartir e. Mam Rovî hevalên xwe dibe li ber devê çemê Miksê. Mam Rovî, tê li ser çemê cemed girtî û dûvê xwe dikete bin xwe da û dibêje hevalên xwe:

-Dûvê xwe bikin di nav vê avê da heta hûn bêjin bes e têra we dê zengilên bi dûvê ve bin.

Qederek diçe, hevalên Mam Rovî dibêjin:

-Ma ne bes e, em dûvê xwe ne kêşin?

Mam Rovî dibêje:

-Ne ne, bila dûvê we hindek din di avê da bîminin da spahî zengil pêve çêbibin.

Qedereka din diçe, Mam Rovî berê xwe didete ku dûvê roviyên din tam qerimîne. Mam Rovî hema ji nîşkê ve baz dide û direvê. Roviyên ku dûvê wan di avê da jî kar dikin ku li pey Mam Rovî herin lê dûvê wan hingî qerimîne yê xwe dilivîne dûvê wî jêdibe. Bi vî şeklî Mam Rovî tola xwe ji roviyan distîne.

Çîroka me çû deştê, da û babên me çûn beheştê.

(Gelêrî)

## HITO Û PÎRA MIROVXWER

Hebû nebû li gundekî pîrejinek û neviyekê wê hebû. Navê neviya wê pîrejinê Xito bû. Vêca çêlekeke zer ya wê pîrejinê hebû û Hito diçûye ber. Rojekê pîrejinê gotiye Hito;

"Tu çû caran bi şivikan li vê çêla zer nedî! Dera ku tu çêlê bibî çêrê jî kaniyek li wê derê heye, dema te ji wê kaniyê av vexwar, tu çû caran serê xwe hilnedî û li jor nenêrî!"

Hito gotiye;

"Bila dapîrê."

Hito çûye li ber çêla zer û bi çiya û newala ketiye, hatiye li ber kaniyê û çêla xwe berdaya di nav çêrê da. Hindek wext çûye, ew gotinên pîrejinê bo Xito bûne meraq. Xito di dilê xwe da gotiye;

"Dapîra min bo çi gote min bi şivikê li çêla zer nede? Xwedê ez dê şivikekê li çêlê bidim!"

Diçe li ber çêlê diraweste û şivikeke xweş li quna çêla zer dikêşîne. Çêl jî rixa xwe diavêje li ser û çavên Hito û hemû cilên wê pîs dibin. Hito, di dilê xwe da gotiye;

"Bo hindê dapîra min gotiye, şivikê li çêlê nede! Da ez pîs nebim."

Xito radibe diçe li ser kaniyê cilên xwe paqij dike. Hindek têhn bûye, devê xwe dike di nav ava kaniyê da û avê vedixwe. Di wê demê da gotina pîrêjinê ya bo kaniyê gotibû tê bîra wê û meraq dikeve di dilê wê da. Ew jî av vexwarina xwe xilas dike û serê xwe hildidê jor. Gelek di ser de naçe li pêşiya xwe newalekî dibine. Berê xwe dide ku baxçeyek li wir heye û di wî baxçeyî da hemû fêqiyên li ser rûyê dinyayê hene. Dilê hito diçê fêqiyan û baz dide diçe di nav baxçeyî da bi dest xwarina hêjir, sêv, tirî û girsikan dike. Hito diçe li ser dareke hêjîrê, hêjiran dixwe. Hindek wext diçe Hito, berê xwe daye li bin darê Ev e hûtek li wir e. Hito ji nû ve zaniye ku hatiye bexçeyê pîra mirovxwer. Pîra mirovxwer gotiye;

"De were were Hito! Ez jî bo xwarinê êka şibiya te digeriyam."

Hito ji tirsa xwe ji darê avêtiye erdê da bireve. Lê keçên pîra mirovxwerê Hito giritine û birine mala xwe. Çûne di mal de pîra mirovxwerê gotiye;

"Bila niha ev li vir be! Em biçin ka em hin mirovên din nabînin bo şîvê?"

Pîra mirovxwer destê Hito girêdaye û keçên xwe dane dûv xwe û çûye. Hito jî ne keçeke bêaqil e. Bi şeklekî destên xwe vekiriye û çûye ku deriyî vekî lê derî venebûye. Hito jî rahiştiye şivikekê û xwe li pişt deriyî veşartiye. Wext bûye mexreb, pîra mirovxwer û keçên wê deriyê malê vekirine ku biçin di mal de. Dema pîra mirovxwer û keçên wê hatine di mal de Hito her êkê şivikek li patika wan daye û reviye. Hito ka bi çi şiklî hatiye û li dev pîrejinê rûniştiye. Destê dapîra xwe maç kiriye û gotiye;

"Rast e, pêşiya bo paşiyan gotiye,Yê nekêt xeberê mezina lê têt şaxê bizinan." Vêca ez jî êdî xebera te bikim. Hûn mezin gelek tiştan dizanin û hûn bo me dibêjin. Vê carê min şiya ez xwe xilas bikim lê dibe ku ez careke din neşêm xwe xilas bikim. Vêca qusûra min efo bike, min bêxeberiya te kir. Êdî ez dê bêxeberiya te nakim."

(Gelêrî)

## ÇÎROKA MELÊ

Carek ji caran rehm li dê û bavê guhdaran, rojekî zelamekî gelek feqîr hebû û jineke wî jî hebû, zelam çû şol nedikir û her û her xizan bûn. Jina vî zelamî jî berê xwe dide mala melê, mela dewlemend e, rewşa melê gelekî xweş e û her ji cihekî ji bo melê hemû tişt tên. Kêfa jinikê gelekî ji melê ra tê û ji bo xwe dibêje, ev mele gelekî kêf dikin. Ez ji biçim ji bo mêrikê xwe bêjim bila bibite mela. Û dema mêrê jinikê tê jinikê gotiye mêrê xwe:

-Divê tu bibî mele!

Zelamî gotiye:

-Hey Xwedê ji te razî! Ez dê çawa bibime mele. Min ne ilm dîtiye û ne min xwendiye.

Jinikê gotiye:

-Ez nizanim, divê tu bibî mele. Min berê xwe daye halê melê halê wî gelek baş e, kêf kêfa wî ye. Heger tu nebî mele newe vê malê.

Zelamî gotiye:

-Wele ez hêj nizanim nimêj bikim vêca ez dê ku ra bibim mele?

Jinikê gotiye:

-Hema wesa! Bi Xwedê divê tu bibe mele te nevêt jî ev e ez çûm xatirê te.

Mêrik mecbûr maye. Ma çi bike gelekî ji jina xwe hez dike û pîçekî bindeste jî.

Mêrik gotiye:

-De baş e. Here ji bo min kitêbekî bîne de ez bibim mele.

Jina mêrik çûye sûkê kitêbek kiriye û înaye daye mêrê xwe û gotiye:

-Ev e temam e tu bûyî mele çû.

Mêrikê feqîr bêçare gotiye:

-Belê ez bûm mele.

Jina mêrik rabûye û di nava bajar û gundan de îlan kiriye, ev e mêrê min bûye mele. Mehtê mêrê xwe li hemû deran belav kiriye, gotiye li ser mêrê min re çû mele nîn in wesa meleyekî qenc e. Li deran hingî ev derew gelekî tê gotin xelkê bawer kiriye ku mêrik bûye meleyekî hêja.

Rojekî navdariya melatiya mêrik çûye guhê padîşaxî. Ji bo padîşaxî gotine:

-Padîşaxê min ev e meleyek heye. Tê gotin hemû tiştî dizane.

Padîşaxî gotiye:

-Ev tişteke gelek baş e. Ji xezîneya dewletê nîv bi nîv zêr hatine dizîn û çû kes jî nizanê kî birine. Ka herin dev wî meleyî, bêjine ku xezîna hatî dizî derêxist wî çi bivê ez dê bidime, lê ku nederêxist ez dê serê wî jê bikim.

Welhasil, qazid çûne mala melê û jê ra gotine padîşaxî wesa gotiye. Mêrik hêrs bûye, rabûye jina xwe û gotiye:

-Ev çi ye te înaye serê min, hemû sûncê te ye, ez ne mele û ne çû me. Ka ez dê çawa cihê xezîna padîşaxî zanibim!

Jinik jî bi tirs nizanê çi bêje. Ji bo mêrê xwe gotiye:

-Hema here ka dê çawa be.

Mêrikê mele, rabûye çûye qesra padîşaxî. Nobedaran mêrikê mele birine rex padîşaxî. Padîşaxî gotiye:

-Kerem bike rûne.

Mêrikê mele gotiye:

-Keremdar bin padîşaxê min.

Padîşaxî gotiye:

-Tu yî ew meleyê qenc?

Mêrikê mele gotiye:

-Belê ez benî.

Padîşaxî gotiye:

-Wekî ji bo te jî gotine, barê çil dewaran zêr ji xezîna dewletê hatine dizîn. Heke te ew zêr derêxist ez dê nîviyan bidime te, heke te nederêxist ez dê serê te jêbikim.

Mêrikê mele gotiye:

-Nexwe, tu destûrê bide min ez dê biçim malê ez dê vê meselê hal bikim.

Padîşaxî gotiye:

-De here û tu hal nekî tu zanî.

Mêrikê mele bi rewşeke hêrs, acizbûyî çûye malê, gotiye jina xwe hal û mesele ev e. Ez tiştekî nizanim, padîşaxê dê serê min jêbikî. Jinikê ji bo mêrê xwe gotiye:

-Here bêje padîşaxî, bila çil rojan mohletê bide te. Bêje, malê we gelek e, heta ez hesabê van derêxim divêt çil roj ji bo min hebin.

Mêrikê mele çûye dev padîşaxî û tişta jina wî gotî eynî wek wê gotiye padîşaxî. Padîşah jî ji bo mêrikê mela odeyek daye rastkirin û çil roj mohlet dane wî. Mêrikê

melebi tirs û neçar nezaniye çi bikî. Tiştekî nizanê û li rex wî çil roj hema ev roj e. Welhasilê mêrikê mele xwe ker kiriye, odeya xwe da rawestaya û rojên xwe hejmartine.

Dema ku ev bûyer çêdibin, ev mesele di nav herêmê da belav dibe. Dizên ku zêr dizîne jî pê dihesin. Û ew jî dikevin mitala xwe da. Dibêjin, ku ev mele wekî gotinan hemû tiştan derêxe, çû ji me. Bi Xwedê hem mal û milkê me dê biçe hem jî serê meyê dê jêkirin. Di nav xwe da dihizirin ka çawa xwe bigihênin melê. Welhasil ji dizan yek diçê qesrê li ser kuleke odeya melê guhê xwe didete melê. Mêrikê mele jî feqîro êxsir e. Her di odê da diçe û tê, rojên xwe dihejmêrê. Her pengavekî gotiye:

-Ji çilan çû êk.

Diz jî dengê melayê êxsîr dike. gotiye:

-Wey babo, mala min mirate bûyî! Xwedê ev dizanê.

Diz bawer e mele dizane çil dizin û êk jî hatiye li wî guhdariyê dike. Diz rev reva xwedê çûye dev wan dizên din û gotiye wan:

-Xwedê wekîlê min û we be, ev mela dizane em çend in, ez bawer im cihê me jî dizane. Bi Xwedê padîşaxê dê serê me jê bike.

Ji nav dizan êkî gotiye yên din:

-Xwe ne tirsînin. Sibe, ji me bila du herin ka ev mela esehî dizanê me xizîne diziye.

Bûye roja din, du diz çûne ser kuleka odeya melê û hesandine. Ji bo melê roja duyê ye. Wî jî gotiye:

-Ji çilan çû du.

Her du dizên ku li melê dihesînin dengê melê kirine gotine:

-Hoohoo! Bi Xwedê ev dizanê! Ev e got; “Ji çilan çû du.”

Diz dîsa rev reva xwedê çûne dev hevalên xwe yên din û hal û mesele gotine. Diza gotiye:

-Em roja din sê herin. Ka dê çawa çêbe.

Bûye roja sêyê, sê diz dîsa çûne li ser kuleka odeya melê. Ji çil rojên melayê êxsîr sê roj çûne, mela bi dengekê hêrs û bilind gotiye:

-Ji çilan çû sê!

Her sê diz tirsîne û bi rev çûne. Roja çarê jî dîsa eynî tişt dewam kiriye. Dizan di nav xwe da gotiye:

-Bi Xwedê ev mela dizanê me xizîne dizîye, tişta rast em biçin xwe bavêjin ber piyê melê bila an me efo bike an jî çareyekî ji bo me bibîne, nexwe serê me dê bête jêkirin!

Roja din sê çar diz çûne dev melê û xwe avêtine li ber piyê melê û gotine:

-Zêr me birine em pêşaman in, bi xatirê Xwedê Tea'la tu me efo bikî!

Mele jî xwe ket xirab nekiriye, rengê rûyê xwe diyar nekiriye û gotiye:

-Min zanibû we zêr dizîne, lê min nedivît serê we werê jêkirin, vêca niha herin kewlê me çil roj bûn, heta hingî zêran hemûyan bînin heger êk zêr jî kêm bin ez dê serê we bidime jêkirin.

Dilê melê rehet bûye, cihê zêra diyar bûye. Mela hema ji mitbexa qesrê xwarin xwestiye û her xwariye, heta çil rojan da mela gelek zexm bûye. Çil roj temam bûne, bêhna padîşaxî teng bûye dema ku seata melê temam bûye padîşaxî gotiye:

-Gazî melê bikin bila bê!

Xulam, çûne gazî melê kirine, mele hatiye destûra padîşaxî.

Padîşaxî gotiye:

-Te ku lê kir mele, te xizîna hati dizîn dît?

Mêrikê mele gotiye:

-Belê min wisa hêsanî dît, mal zehf bû ji bo wê êkê ez girûbûm. Çil zelam û çil dewarên xwe rêbike bila herin filan di şkeftê da bînin bêtin.

Padîşaxî çil zelamên xwe rêkirine û zêrên hatine dizîn înandine qesrê. Padîşaxî nîvê zêran, barê bîst dewaran rêkiriye mala melê. Mêrikê mele çûye malê, jina wî gotiye mêrê xwe:

-Ma min ne gote te bibe mele. Mele wisa ne, tiştan bi dest dixin!

Çîroka me çû deştê dê û bavên me çûne beheştê.

(Gelêrî)

## ZENGÊ, BENGÊ Û ÇIRÛÇENGÊ

Carekî bizinek hebû û sê karikên wê hebûn. Navên karikên wê Zengê, Bengê û Çirûçengê bûn. Bizinê karikên xwe têxistine xaniyî da û çûye çêriyê. Dema bizin çûye çêriyê, hirçek jî hatiye li ser banê xaniyî kiriye teq teq û req req da karik bi tirsin û derkevine derve da hirç wan bixwe.

Karikan gotiye;

*"Ew kî ye teq teq diket û req req diket,*

*Xewliyê li serê xwe û bavê xwe werdiket,*

*Tijî di nav kaçik û kuliçkêt me ax û ber diket?"*

Hirçê gotiye;

*"Ez teq teq û req req dikem*

*Xweliyê bi serê we û bavê we werdikem,*

*Tijî di nav kaçik û kuliçkêt we ax û ber dikem?"*

Û çûye. Qedereke din hatiye û kiriye teq teq li deriyî daye. Karikan gotiye;

"Ew kî ye?"

Hirçê gotiye;

"Ez dayika we me, deriyî bo min vekin!"

Karikan di qula dêrî ra berê xwe dane ev dayika wan nîn e û gotine;

"Tu dayika me nîn î, dayîka me reş e."

Hirç çûye xwe bi teniya tenûrê reş kiriye û hatiye. Hirçê, kiriye teq teq li deriyî daye. Karikan gotiye;

"Ew kî ye?"

Hirçê gotiye;

"Ez dayîka we me, deriyî bo min vekin!"

Karikan dîsa di qula deriyî ra berê xwe dane ev dayîka wan nîn e. Û gotine;

"Tu dayika me nîn î, dayîka me sor e."

Hirç dîsa çûye xwe bi xweliya sor, dûtîye û hatiye li ber deriyî karikan û kiriye teq teq li deriyî daye. Karikan gotiye;

"Ew kî ye?"

Hirçê gotiye;

"Ez dayîka we me, deriyî bo min vekin!"

Karikan dîsa di qula deriyî ra berê xwe dane ev e ne dayîka wan e. Û gotine;

“Tu dayika me nîn î, dayîka me şîn e.”

Hirçê dîsa çûye xwe bi belgên daran şîn kiriye û hatiye li ber deriyî karikan û kiriye teq teq li deriyî daye. Karikan gotiye;

“Ew kî ye?”

Hirçê gotiye;

“Ez dayîka we me, deriyî bo min vekin.”

Karikan dîsa di qula deriyî ra berê xwe dane ev e şîn e û li hirçê derî vekirine. Hirçê her sê karik xwarine û çûye.

Bizin ji çêriyê hatiye. Berê xwe daye ku her sê karikên wê ne li malê ne. Bi vir va çûye û bi wir va çûye karik nedîtine. Û gotiye;

“Hebe nebe ev karikên min hirçê xwarina!”

Bizinê hindek şîr dotiye, kiriye mast û çûye lalê qazî. Hal û madên xwe ji bo qazî gotiye. Qazî, gazî hirçê kiriye û gotiye;

“Karikên vê bizinê te xwariye?”

Hirçê gotiye;

“Ne bavo! Min karikên bizinê bi rêbiwarî jî nedîtine.”

Qazî zaniye ku hirçê karik xwarine. Û gotiye;

“Divê hûn biçin şerîe’tê.”

Qazî rabûye didanên bizinê tûj kirine. Hirç û bizin xwe ji êk dane paş û bi êk du çûne qloçan. Bizinê bi stirhên tûj yek poç li zikê hirçê daye. Hirç miriye û her sê karik Zengê, Bengê û Çirûçengê ji zikê hirçê derketine. Bizinê gotiye;

“Dayê qurban hûn bi ku ve çûbûn?”

Karikan gotine;

“Dayê em çûbûn mala xalê xwe me kaçikê qut de zad xwariye.”

Bizinê, Zengê, Bengê û Çirûçengê dane dûv xwe û çûye mala xwe.

(Gelêrî)

# JÎNENÎGARÎ

Reşit Rojdar YILDIZ, di sala 1986an de navçeya Şirnexê li Cizîrê mezraya gundê Girêşêrefê hatiye dinê. Di sala 1989an de ji ber sedemên şerî malbata wî koçî bajarê Mersînê kir. Dibistana seretayî li wir qedand. Di sala 1996an de malbata wî dîsa vegera Cizîrê. Dibistana navîn YİBO (Dibistana Navîn Ya Bi Razan) li Hezexê bi yekemînî qedand. Piştre di sala 2003an de ji Lîseya Cizîrê mezûn bû. Di 2004an de Zanîngeha Dîcleyê Fakulteya Perwerdehiyê Mamostetiya Tirkî bi dest xist û beşa xwe 2008an de qedand.

Di navbera salên 2008-2011an de li gundê xwe wekî destheq mamostetî kir. Di sala 2012an de wekî karmend di Zanîngeha Hekariyê de bi dest xebatê kir. Pişt cih girtina di zanîngehê de li gel karmendiyê wekî mamoste kete dersên Kurdî yên bijarte de. Niha jî di zanîngehê de dersên bijarte yên Rêziman Kurdî, Edebiyata Gelêrî Ya Kurdî û Lêkolînên Diyalektîka Hekariyê dide.

Heta niha di Kovara Enstîtûya Zimanên Zindî Ya Zanîngeha Bîngolê de gotûbejeke wî ya bi navê “Di Helbestên Melayê Bateyî De Evîn û Hezkirin” hatiye weşandin. Li ser çîrokên Kurdî gelek xebatên wî hene. YILDIZ, zewiciye û niha jî jiyana xwe li Hekariyê didomîne.

# ÖZGEÇMİŞ

Reşit Rojdar YILDIZ 1986 yılında Şırnak'ın Cizre İlçesinin Tepeönü Köyünün Şereftepe Mezrasında dünyaya geldi. 1989 yılında bölgede meydana gelen olağanüstü hal nedeniyle ailesi Mersin İline göç etti. İlkokulu burada okudu. 1996 yılında ailesi tekrar memleketine döndü. Şırnak'ın İdil Yatılı İlköğretim Bölge Okulunu birincilikle bitirdi. Daha sonra 2003 yılında Cizre Lisesinden mezun oldu. 2004 yılında Diyarbakır Dicle Üniversitesi Eğitim Fakültesi Türkçe Öğretmenliği Bölümünü kazandı ve 2008 yılında bitirdi.

2008-2011 yılları arasında kendi köyünde vekil ve ücretli öğretmenlik yaptı. 2012 yılında Hakkari Üniversitesi'ne memur olarak atandı. 2012 yılından itibaren memurluğun yanında üniversite de Kürtçe Seçmeli dersleri verdi. Şimdi de Üniversite de seçmeli olarak verilen Kürt Dil Grameri, Kürt Halk Edebiyatı ve Hakkari Diyalekti İncelemeleri derslerini vermektedir.

"Di Helbestên Melayê Bateyî De Evîn û Hezkirin " adlı makalesi Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisinde yayımlanmıştır. Kürt masalları üzerine çokça araştırması vardır. YILDIZ, evli olup şu an Hakkari'de yaşamını sürdürmektedir.